



Naverok

Sal 3 • Hejmar 10 • Havîn 1997

Di hengama Sûltan Reşad û Îttîhadçîyan da
Kurdistana Roava 3
Ekrem Cemîl Paşa

Dost û xêrxezê cim'eta Kurda yî mezin 11
Wezîrê Eşo

Bêbextî 27
Mihemed Dehsiwar

Kurd di kitêba Îbn el-Esîr de 39

Nivîsek ji mecbûrî 46

Azad 53
Guy de Maupassant

Çend nivîs ji perîyodîkên Kurdî 59
Amadekar: Malmîsanij

Kovareke nû ya bi Kirmanckî 96
Mahmûd Lewendî

Sal 3
Hejmar 10
Havîn 1997

Xwedî Komeleya Nivîskarên Kurd
li Swêdê

Redaksiyon Osman Aytar
Mahmûd Lewendî
Laleş Qaso
Zinar Soran

Şertên abonetiye Salek: 200 SEK
Niv sal: 100 SEK
Hejmarek: 50 SEK
*Ji bo welatên din mesrefa
posteyê lê zêde dibe.*

Îlan Rûpelek: 1 000 SEK
Niv rûpel: 500 SEK
Çarîk rûpel: 200 SEK

Pergala rûpelan Osman Aytar

Rismê bergê pêşî Kurdekî Êzîdî
*(Herêma Şengal, 1950-51,
foto: Wilfred Thesiger)*

Postgiro 46 32 31-1

ISSN 1400-528X

Çap Apec-Tryck

Berpirsiyariya her nivîsê, ya nivîskarê/nivîskara wê ye.

Navnîşan • Adres • Adress:
Box 2015, 176 02 Järfälla/SWEDEN

Di hengama Sûltan Reşad û Îttîhadçîyan da Kurdistana Roava*

Ekrem Cemîl Paşa

Di 1909'an de Îttîhadçîyan¹ Sûltan Hemîd ji text daxistin û di şûna wî da² birayê wî Reşad Efendî bi ûda Sûltan Mehemedê Pêncim li ser textê Osmanîyan rûniştandin. Sûltan Reşad, ne tu padîşah bû, lîzokekî kal, reben û pepûk bû. Loma, di hengama Sûltan Reşad de Îttîhadçî[yan] wek dilxwaza xwe kişwerê Osmanî digerlandin.

Di dîroka Osmanîyan de, bi navê "Gerteva Sî û yek[ê] Adar[ê]", di 1909'a[n] da li Îstanbûle gerdişek çêbû ku bi navê Wehtetî suxteyek rakiribû

*Eslê vê nivîsa Ekrem Cemîl Paşayê rehmetî, di deftereke wî de heye. Ev defter bi destê wî hatiye nivîsîn. Alîyekî defterê bi Kurdî -bi herfên latînî-, alîyekî jî bi Tirkî -bi herfên Erebi-hatiye nivîsîn. Beşê Kurdî -ku em li vir diweşînin- şanzde rûpel e, lê li ser rûpelê 17'an jî hejmara 17 hariye nivîsîn. Piştî rûpelê 17'an rûpelên nenivîsandî hene. Xûya ye ku ev nivîsa Kurdî nivçî maye.

Li ser rûpelê pêşîn ê beşê Tirkî hejmara 51 hatiye nivîsîn û nivîsa Tirkî heft rûpel e. Yanî rûpelê dawîn ê beşê Tirkî, rûpelê 57'an e. Ji viya tê fêmkirin ku pêncî rûpelên din -bi Tirkî- li derekî din hatine nivîsîn.

Ev defter qîza Ekrem Cemîl Paşa Pervîn Cemîl dabû min, ez gelekî sipasî wê dikim. Li gor gotina Pervîn Xanim, hin nivîsên (defterên) bavê wê, li cem hin kesên mane û hin neketine destê zaroyên wî. Em hêvî dikin ku ew nivîsên Ekrem Beg wînda nebin û rojekê çap bibin, bigihîjin destê xwendevanan.

Her wekî xwendevan jî dibînin, Kurmanciyêke taybetî ya Ekrem Cemîl Paşa heye. Hin kelîme wî bi xwe çêkirine. Gelek ji wan jî ji Farişî girtine. Min wek nimûne maneya hin

û ev gerdiş bû engîza jitextxistina Sûltan Hemîd. Pey vemirandina serrakirina han, gewremerdê şerevanîya Îttihadçîyan Mehmed Şewket Paşayê Bexdadî bû zorbayê Împaratorîya Osmanîyan. Di sala 1913'an de Mehmed Şewket Paşa li Îstanbûlê, bi sûtqestekî hat kuştin û pey wê gertevê, li xava xwehermenda Osmanî ket destê Tel'et Efendîyê têlxirafvan.

Tel'et Efendîyê têlxirafvan, di demeke hindik da bû Tel'et Beg, Tel'et Paşa û bilind bû. Îcar ev paşa bû zorbayê Osmanîyan.

Zorbatiya Tel'et Paşa pênc sal domand û ev pênc salên han bûn demên gûrîpaşî û zorkerîyên Îttihadçîyan.

Sûltan Reşad, di van hengamên zorbatiyan de, di nav destên Îttihadçîyan de ji lîzokek pêve tiştêk din nebû.

Ferweranîya heftsale ya Sûltan Reşad, ji gerdişa bergirantir a dîroka

peyvên wî di beşê notan de nivîsî.

Di awayê nivîsandina Ekrem Beg de jî hin xusûsiyet hene. Nimûne:

1. ordî a Osmanîan
2. ordî ên Ûrisan
3. Îttihadçîan
4. pisporîteke
5. bira ê wî
6. suxteek
7. text ê Osmanîyan
8. xue, xuehermend, pîrxuazî

Min di ciyê formên jorîn de wisa nivîsî:

1. ordîya Osmanîyan
2. ordîyên Ûrisan
3. Îttihadçîyan
4. pisporîteke
5. birayê wî
6. suxteyek
7. textê Osmanîyan
8. xwe, xwehermend, pîrxwazî

Ekrem Cemîl Paşa carna li ser herfa X du nuqte danîne û di ciyê herfa xeyn a Erebbî de ev herf nivîsiye ('X'). Ji ber ku di elfabeya Kurdî ya îro de di ciyê vê herfê de X tê nivîsîn, min jî di ciyê wê de X nivîsî. Nimûne: Bexdad.

Di destnivîsê de çend kelîme nehatine xwendin. Min piştî kelîmeyên wisa, di nava parantezan de îşareta pîrsê danî.

Herf an kelîmeyên ku di nava parantêzên koşedar (bi koşe) de ne, di esle nivîsê de tunebûn, min lê zêde kirin, lê yên di nava parantêzên normal de nivîskarî bi xwe nivîsandine.

Malmîsanîj

Osmanîyan ra, hem jî ji gerdişa bergirantir a dîroka cîhanê ra nehrevan û rexne (rehne)³ bû. 1911'an da xwehermenda Îtalîyan dirêjî Tirabûlûs, satrapa Osmanîyan a yegane mayî di Afrîqayê da -Lîbya- kir û wê kişwera fireh ji destê Osmanîyan girt. Di 1913'an da, xwehermendên Balqanê; Bulxar, Sirb, Qaradax, Yewnan bi yekdestî ji Osmanîyan ra banga ceng kirin. Di gişî şeran da, ku pir neajotin, ordîyên Osmanîyan li çar alî şikiyan, perîşan û berbad bûn. Ordîyên xwehermendên yekdestan, gişî Rûmelî leyandin û di navberên xwe da par kirin.

Nêrûya xurtir û giranbertir a Osmanîyan ji bo qedxenkirina⁴ Îstanbûl, li pêşanîcenga Bulxaran civandibûn. Ordîyên Osmanîyan, li ber êrîşên hunerane û qaremane yên Bulxaran, pêdarî nekirin. Ordîyên kamwer (muzeffer) ên Bulxaran, di nav çend heftan da gihîştin ber dergeha Îstanbûle. Eger Ordîya Çarim, ano Ordîya Kurdistanê, negihîšta Çatalca -qedxexêza dawî ya Îstanbûlê- Bulxar di nav çend rojan da dê Îstanbûl vekirandana.

Di destpêka sala 1914'an da bi navberî (tewessut)a xwehermendên mezin ên Awrûpayîyan, di navberên Osmanî û Balqanîyan [de] aştî hat danîn.

Xwehermenda Osmanî, Rûmelîyê -ji satrapa Edirne pê va- seraser hunda kir.

Pey navişandin (îmza)a aştînaveya Balqanî û Osmanî, sê çar meh bi şûn da, Şerê Mezinê Cîhanî ê Yekim -Seferberlik- di 1914'an da dest pê kir.

Îttîhadçiyên hoştuj; Tel'et, Enwer û hempayên wan ên xwedîtî û gerdenbilind, hîç dudilî nekirin, tavil xwe gihandin Alamanan û ji Rûsiya, Firansa, Îngîltere û yekdestên wan ra banga ceng kirin.

Ordîya Osmanîyan, di Şerê Mezin ê Yekim da, ku [çar] sal ajot, bitenê li Çanaqe (Dardanel) cengne diwar û qaremane kirin û Îngîlîz û Fîrîngan şikandin û revandin. Di pêşanîcengên mayîn da pelîşîn û perîşan bûn. Împaratoriya Osmanîyan, ji rûyê Îttîhadçiyên, ji pîrxwazî, nezani û bêhişiyên Îttîhadçiyên hilweşiya, gupîya û nabadîd bû.

Îttîhadçiyên, bitenê bi pîrxwazî, nezani û bêhişî qîma xwe neanîn. Li van xweş tînetên xwe, rewşa bêdadî û mirarkerî jî fuzunandin (îlawe kirin)⁵: Kal û ciwan, jin û mêr, keç û kur negotin, bi mîlyonan Ermenî, bi awayên dîlkuj û bi sitemkeriyên diwar kuştin, bilêc kirin.

Di Şerê Mezinê Cîhanî ê Yekim da ku di sala 1914'an da dest pê kiribû û çar sal domandibû, ordîyên Ūrisan çend satrapên Kurdistanê werandin: Hekarî, Wan, Bedlîs, Erzerom, Erzîncan.

Xwehermenda Osmanî, tûdeyên van satrapan, di zivistana 1918'an da bi zorê ji gund û bajaran derxist û berên wan dan bi Kurdistanana roava û Kurdistanana roava û nîvro. Sed hezaran Kurd, bê qîma xwe, bê dilê xwe, di nivê zivistanê da, bajar û gund û mala xwe hiştin; di bin berfê da, di pûk û boran

û sermayê da koçûbar bûn, ketin yaban û deşt û çîyan. Rêya wan dirêj bû, venîştgeh (qonaq)a wan dûr bû. Birçîtî zû dest pê kir, çarox û sol û pêlawên wan tavil dirîyan! Di berf û serma û herîyê da, di ser rêyan da perîşan, perkende û aware man!

Xwehermenda Osmanîyan, walî û fermandarên Tirkan, ji van belengaz û naçizan ra, ji van koçûbarên xwas û tazî û birçîyan ra alîkarîyeke piçûk jî nekirin.

Ji bûniş û gerdişên van bedbextan ra -resmî û xeyrîresmî- tu civatek, tu sazimanek neêşîya. Hîv-Soran⁶, nexweşgehan, civatên qencîxwazan, ji van birayên xwe yên birçî û tazîyan ra, goya biraolên xwe ra, derîyên xwe hişk û biring girê dan. Ji van Kurdên bedbext ra hîç kes humêza xwe venekir, hîç kes ji wan ra destê xwe dirêj nekir. Van belengazana ji tu kesî rûyek biken nedît; hîç kes ji wan ra devken nebû. Ew di rêyan da dinalîyan, nav berf û herîyê diçikîyan, dimirîn; bêjimar û bêjimar bûn!

Ev koçûbarên Kurdan, ev hezaran, sed hezaran enzanên birçî, xwas û tazî ku nîvê wan li herî û berfê çikîyan, mirin û man; dawîya dawîn xwe gihandin Kurdistana roava û Kurdistana nîvro û roava ku ji pêşanîcengê dûr bûn: Qoçhîsar, Qanxal, Dêrsim, Sêrt, Diyarbekir, Mardîn, Ruha, Maden, Xarpêt, Malatya, Entab, Mereş.

Ev Kurdên bedbext ku di nîvê zivistanê da, di rojên ba û bapûk, di rojên boran û berf û sermayê da, ji cîyên xwe, ji mal û xanî û qulikên xwe yên pir giramî (ezîz), germ û evîndar; bi zor, bi zorên sungîyan hatibûn deranîn, hatibûn derkirin û qewurandin; di pêçedor (muhît)a Kurd, di gund û bajarê Kurd [de] -qenc û neqenc- cîgehek, xanîyek, qulikek peyda kirin û bi cî bûn. Li van deran, gezek nan, carna kevçîyek şorbeya germ peyda kirin. Hem jî gellek ji wan kar û xebat bi dest xistin, keda xwe bi destê xwe dan hev.

Lê, Tirkê rûvî, Îttîhadçîyê bêbext û sitemker, kemîn girtibû, li benda rojek ewha bû!

Çawa bi mîlyonan Ermenî -kal, ciwan, jin, mêr û zaro- serjê kirin û hunda kirin, wusa jî bi dek û pîlanan dixwestin gelê Kurd hunda bikin: Îttîhatçî[yan] qerar dabûn ku Kurd[an] bi birçîtî, serma, nexweşî û bi îşkenceyên rengareng bikujin, rehên wan rakin û bi carek hunda bikin. Îttîhadçî[yan], di sala 1917'an⁷ da, bi navê "bicîkirina koçbaran" (iskan-ı muhacirin) rêdarek deranîbûn. Ev rêdar, fermana bilêckirina Kurdan bû.

Bi sipartekî (îstînad)a vê rêdarê, Tirk[an] ji nû va Kurdan koçûbar dikirin! Belê, par, ano di sala 1916'an da Tirk[an], Kurdên ku zora sungoyan⁸ ji cîyên xwe -Erzerom, Bedlîs, Wan û ji heldorên wan- rakiribûn û di berf û bager û pûk û boranan da bi rê xistibûn û ev Kurdên pepûk û belengaz, ji nîvê xwe bêtir ji birçîyan, ji serman û ji nexweşîyan, di rêyan da, di nav herî û berfê da

hiştibûn; bi hezar renc û êş û nalîn xwe gihandibûn Kurdistana jêrîn, penahek û parîyek nan peyda kiribûn; ji nû va van Kurdên pejmurde, jar û belengaz di rojên sermayê zivistana sala 1917'an da, di rojên bakur û boranê da, ji qulik û holikên wan, bi zora sungoyan deranîn û radest (teslîm)ê jendermeyên Tirk kirin û şandin sermayê, kuştinê û mirinê.

Tirk[an], van giloreyên Kurdan, van çêjikên enzanan ên bê çîz û bê tab û tuwan, birçî û tazî -goiya- dîşandin Anadolê, dişandin gundên Tirkan, nav Tirkan!

Lê bi rastî ev giloreyên belengaz ên ji enzên derketî, ew qehreman û pehlewana û peyhatiyên wan bûn ku -hêj berî salek- 400 sal bû ku di serhedên Misqofan da, ji Hekar heya Tirabizon sînorên padîşahên Osmanî û xelîfeyên îslaman ji neyaran diparastin. Îro jî Tirk[an], van qehremanan bi sitem û bêdadî, bi îşkence û dijarî, bi singo û qondaxan ji qulik û holikên wan derdixistin û ji niştimanê wan diqewurandin û radesta sermê, berfê û mirinê dikirin!

Sipas li xweşbextîya Kurdan ku van Îttîhadçîyana, van Tûrancîyana, di Şerê Mezin ê Yekim da şikîyan û hunda bûn! Eger van gangestirana di Şerê Mezin da neşikestana û şep û fesal biketa destê wan, di Kurdistanê da tu Kurd nedihîştin! Wan dê Kurdistana buhuştasa bikirana lana gangestiran, wara rêbir û xwînxwaran!

Sipas ji Amerîqa, Îngîltêre, Firansa û ji hevalbendên wan ra ku Îttîhadçîyan şikandin, ji hev jendin, hunda kirin û di sala 1918'an da Îstanbûl ji destê Îttîhadçîyan s[te]ndin û bi vê kopa kujare û dijar a Amerîqa, Îngîltêre, Firansa û hevalbendên wan Împaratoriya Osmanîyan nebedîd bû û ji rûyê cîhanê rabû!

Îngîlîz, ji salsedan ve katibûn pey vê xulyayê: Îstanbûl û gelîyên wê bistînin û bibin fermanfermayê cîhanê! Îngîlîz gava ku di 1918'an da bûn ferweranê Îstanbûl û gelîyên wê, ji dil û can bawer kiribûn ku êdî gihane dilxwaza xwe a kevnare! Û ji bo ku fî'len vê dilxwaza xwe bînin cî, ji wan ra li Îstanbûlê pasbanek û li Anadolê jî wekîl divabû. Di bijartina pasban û wekîl da tu cîyê tereddud tunebû. Bi verastê (esasen), Îstanbûl û Anadol ne gênd û dasta Êlenan (Urim) bû? Ma Turkên Qayxanî van kişweran bi zora şûrê xwe ji Êlenan (Hellene) nestandibûn? Sûltan Mehemed Îstanbûl (Qostantînîye) ji destê Kayserê Rum nestendibû?

Ji vê yekê (bînaen'eleyh), Îngîlîz ji Êlenan (Hellen), Uriman ku xudanên pazend (meşrû')ên yegane ên Îstanbûl û Anadol in, kirin pasbanên Îstanbûlê û wekîlen Anadolê û ordîyên Yewnanîyan jî dirêjî Anadolê kirin!

Eva; bi sîcên gewremêrdê Îngîlîzan Loîd George [Lloyd George], fermandarên wanên fêris, gişî bingehceng û generalên wan Mistefa Kemal

çêbû û hat meydanê û Kurdistana bedbext kizirand û şewûtand!

MISTEFA KEMAL (ATATURK) Û KURDISTANA ROAVA*

Nejada Mistefa Kemal, ji "Dönme"yê Selarîkê ye. Kurê Zubeyde ...?ye. Ji debistancenga Îstanbûle guwahnave¹⁰ birîye.

Di dawîya şehriyarîa Sûltan Hemîd da, ji hogirîya Mistefa Kemal bi Îttihadçîyan ra hatibûn gûmanê û loma Mistefa Kemal dûrandibûn Şamê.

Gava di 1908'an de li Îstanbûlê "Meşrûtiyet" bang kirin, Mistefa Kemal ji dûrandegeha xwe vegeirîya hate Şamê û xwe gihande Îttihadçîyan.

Mistefa Kemal di navbera sertîpên ordîyê da, bi quretî, bi parsûustûrî û bi pirxwazîya xwe hatibû naskirin. Nemaza Enwer Paşa, her gav ji Mistefa Kemal ra "Napolîyonê piçûk" digot û pê qesmerîya xwe dikir û ew kêma nêrx dikir.

Li Îstanbûle, di 1909'an da gertevê çêbû, navê vê gertevê "31[ê] Adar[ê]" ye. Pey vê tevhevîyê Sûltan Hemîd ji text daxistin û Mehmed Ş. Paşayê îttihadçî bû dîktatorê kişwerê Osmanîyan. Di vê hengama ferweranîya Îttihadçîyan da, Mistefa Kemal kir û nekir, nekaribû nehêrdarîya Mehmed Şewket Paşa bi alîyê xwe bikşîne û wek hevalên xwe ên sipehdarên din bikeve navbera Îttihadçîyên xudannufûz û temayuz bike. Pey kuştina Mehmed Şewket jî, Mistefa Kemal bi tu awayî Tel'et û Enwer jî dilxweş nekir. Dawîya dawî, Mistefa Kemal ji vê bedkamîya xwe a li ba Îttihadçîyan gihîşte kamiranîyê. Bi vî awayî, Mistefa Kemal ji hayûhûya konevanîya Îttihadçîyan dûr ma û ji encama şermisarî û malwêranîya Îttihadçîyan ra hevaltî nekir, weyaxud nekaribû bikira û ji konevanîyê dûr ma, û di ordîya Osmanîyan da kariwer bû.

Gava di 1911'an de Îtalîya dirêjî Tirabûlûs-xerb kir, Mistefa Kemal li Afrîka bû û di şerên Lîbyayê da, bi mêranî û hunerwerîya xwe temayuz kir û ji çavê xwe birîndar bû.

Nemaza Mistefa Kemal, di salên 1915-1916'yan da, bi Îngilîzan ra di şerên Çanaqeleyê da jêhatîşa xwe a şerevanî bi awakî eşkere nîşan da. Mistefa Kemal, bi behadîrî û hunerwerîya xwe a şerevanî, kamwerîyên Anafarta û Ariburnîya Çanaqe, di dîroka leşkerîya Osmanîyan [de] nivîsî.

Mistefa Kemal ji bo van her du kamwerîyên xwe ên mezin hate dilxweşandin (teltîf) û bilindpayekirin û bû Mistefa Kemal Paşa.

*Dilxwaza me ne ev e ku em di nivîswara xwe da pesna Mistefa Kemal Paşa bidin û dastana şerên Mistefa Kemal Paşa û Yewnanî, Fransîz û Îngilîzan binivîsin. Em dê bi tenê di jîna şehriyarîya Mistefa Kemal Paşa a nozdesalî da gertevên ku bi Kurd û Kurdistan girêdayî ne binivîsin. - Ekrem Cemil Paşa

Dilêrî, mêranî û sergedorîyên ku ordîyên Osmanîyan li Çanaqeke nîşan dan, umîda kamwerîya Îngîlîz û Firansîzan bi carek kire tune. Loma, Îngîlîz û Firansîzan, dizîka û bi huner û pisporîyeke mezin pêşanîya Çanaqeke vala kirin û revîyan.

Di wan hengaman da ferwerdarîya ordîa Osmanîyan di bin destê bingehcengîya Alamanan da bû. Bingehcengîya Alamanî, ev leşkerên berşermayî ên Çanaqeke par kirin û şandin pêşanîcengên din. Bi vê şepê, di 1916'an da Mistefa Kemal Paşayê ciwan jî şandin pêşanîcenga Kurdistanê û ew kirin "Qolordu Qumandan"ê 16.

Ji sala sêyim a Şerê Mezin va, ano di sala 1916'an da ...¹¹ mark[s]îzim li ordîya Ûris şîjkîbû (?) (nufûz) û leşkerê Ûris bi qîma xwe perkende kiribû û ev ordîya fêris pir qels bûbû. Loma, Mistefa Kemal dem û keys û fesalê zûka bîr bir û dirêjî Ûrisan kir, ew şikandin û bajarên Bedlîs û Mûş ji Ûrisan bi şûn da s[t]endin.

Bi şadimanîya vê kamwerîyê, Mistefa Kemal perûdar (teltîf) kirin, ew kirin fermandarê sipah, "Ordî Qomand[anî]" û şandin Diyarbekir.

Mistefa Kemal, di buhara 1916'an da, li Diyarbekir bicî bû, bû Fermandarê Sipahê Duyim (Îkîncî Ordî Qomandanî).

Ji van nivîsekên jorîn pir baş tên fêmkirin ku Mistefa Kemal Paşa, di van salan da -1916 û 1917-, di salên şîn û reş û kambaxîyê da, li Kurdistanê qolordî û ordî qomand[anî] bû. Ano şehriyar û ferweranê perçekî fireh ê Kurdistanê bû.

Me nivîsand, Mistefa Kemal qomandanekî hunerwer û cengawerekî dilêr e. Vê verasta ha, em bitenê nanivîsîn, [bi] hezaran kesên din jî gotine, nivîsandine û şeqilandine ¹².

(1)Di destnivîsa Ekrem Cemîl Paşa de, ev kelîme carna wek "Îttîhadçî", carna jî wek "Îttîhadçî" hatiye nivîsîn, min hemî wek "Îttîhadçî" nivîsîn.

(2)Di destnivîsa Ekrem Cemîl Paşa de, ev kelîme carna wek "de", carna jî wek "da" hatiye nivîsîn, min jî wek wî nivîsî.

(3)rexne: (di Farisî de) 1)derizî, qelaştî 2)zirar, zîyan

(4)qedxen: (di Farisî de "qêdêxen") memnû', yasax (di Tirkî de)

(5)fozûn: (di Farisî de) pîr, zêde

(6)Mebest ji "Hîv-Sor"ê, Kızılay e.

(7)Di destnivîsa nivîskar de, 7'ê 1917 bi reqema Erebi hatiye nivîsîn.

(8)Li jorê, ev kelîme wisa hatibû nivîsin: sungî.

(9)Li vir kelîmeyek nehat xwendin.

(10)govahîname: (di Farisî de) dîploma

(11)Li vir kelîmeyek nehat xwendin.

(12) Hin kelîmeyên ku di vê nivîsê de derbaz dibin:

ano: yanî, ango

bergiran: muhîm, girîng

çarim: yê/ya çaran

dast: mal

debistan: xwendegeh, dibistan

debistanceng: xwendegeha herbîyeyê

dilêrî: cesaret

engîz: sedem, sebeb

enzan: mirov, însan

ferweran: hukumdar

ferweranî kirin: hukum kirin

gerdiş: hal

gertev: bûyer, hedîse

guvahname: dîploma

gûrîpaşî: geşbûn

hêngam: dem, zeman

hunerwer: mahîr

kamwerî: serfirazî, muweffeqiyet

kariwer: meşxûl

kişwer: welat, navçe, mintîqa

konevanî: polîtîka, dîplomasî

leyandin: vegirtin, îşxal

mirarker: canî

nabedîd: wînda

navîşandin: îmza kirin

nejad: nijad

nivîswar: kitêb

pêşanî: cebhe, cephe

rêdar: qanûn

sêyim: yê/ya sisêyan

şep: fersend, firset

vekirandin: feth kirin

xwehermend: dewlet

yekim: yê/ya yekê

Dost û xêrxezê cim'eta Kurda yî mezin*

Wezîrê Eşo

Xaçatûr Abovyan, çawa nûrdarê cim'eta ermenîa yî mezin, rikindarê edebyeta ermenîa yê nuh, fikirdarê demokrat û înternasionalîst xeteke kûr hişt nava tarîqa milletê xwe, hukumekî herî mezin ser temamyâ medenyeta ermenîaye peyî xwe ra. Lê çawa fikirdarê kûr û zane, xemkêşê hemû cim'etê bindest, zêriayî û paşdaketi, çawa merivê xweyê dilê rem û nifûsa qenc ew ji goveka milletê derketiye û em bi heqî û bêminet dikarin navê wî dayînin rex navê wan fikirdarê hûmanîste mezin, ê ku merivayê nava tarîqa xwe da dane. Saya kemala karkirina xweye pircûre, bi afrandinê xweye ulmîê û bedewetîê Abovyan karkir û fikirdarê 'eynî milletê ye û pê ra jî ê temamîya merivatîê. Ew zû va ji goveka milletê derketiye û navê wî ketiye rêza fikirdarê Avropaê

*Wezîrê Eşo pirtûka Xaçatûr Abovyan "Kurd Ezdî" ji zimanê êrmenî wergerandibû kurdî û ew pirtûk di 1986-an de li Êrevanê çap bûbû. Nivîsa Wezîrê Eşo ya ku hûn li vir dixwînin, berê di destpêka wê pirtûka Xaçatûr Abovyan de derketibû. Min nivîs ji tîpên krîlî wergerand ser tîpên latînî. Di alfebeya kurdî ya bi tîpên krîlî de, du bawet Ç, H, K, P û R hene. Yanî di cihê van şeş tîpan de, diwazdeh tîp hene. Wek K û K', T û T'. Lê min li gor alfebeya Celadet Bedîrxan, di cihê du tîpan de, tenê tîpek nivîsî. Wek nimûne, min him di cihê K û T de, him jî di cihê K' û T' de, K û T nivîsî.

Bêguman min zimanê nivîsa Wezîrê Eşo neguherand, ji xwe mafê min jî tune ku ez biguherînim. Lê ji aliyê rastnivîsînê de, min hin guhertin tê de kirin. Wek nimûne, min postpozîsyonên "de", "da", "ra" ji peyvên din cihê nivîsandin. Wek nimûne, di cihê "dewletada", "miletra" de min wiha nivîsî: "dewleta da", "milet ra".

Ahmet Cantekin

û Asîaêyê ‘eyan, ê ku temamya zên û sirafet, zanebûn û hereketê xweye mezin û zor dane rihîna pêşketina merivayê, boy xatirê altindarya ronkayê, xwendin-zanyarîê hindava tarîstan û nezanya dewrê buhurî da. Abovyan usa jî bi wê yekê mezin e, wekî fikir, îdêaê wî roja îroyîn jî kemala xwe unda nekirine û vê gavê, çaxê cim’et hela bindest in, bin nîrê zordarîê û neheqîê da dizêrin, xazma ji alîê nêokolonîalistê roavê da têne talankirinê û pêpeskirinê, fikirê nûrdarê ermenîa yî mezin derheqa cim’etê welatê kolonîaliye bêextîar da bi zorayîke-nuh hukumî ser hiş û sewdê meriva dîkin. Bi vê fikirê em Abovyan dikarin hesav bikin beyraqbirekî şerkarya cim’eta kurdaye miletîê, ya îro cim’eta dinaêye here mezin, ku heta niha jî extîyarîed wêye miletîê nehatine naskirinê. Eva ew cim’ete, ya ku cînara cim’eta Abovyane here nêzîk û here kevn bûye û wê ra tevayî bi sal-zemana bin nîrê împêria Osmanîê û şahê Îranê da hetîye zêrandinê û xezakirnê. Û em bi dilbaristanî, bi şabûn divîn kivşê, wekî karkirina Abovyane ‘efrandarîê raste-rast û kîp tarîqa cim’eta kurda, pirsra wêye miletîê ra girê daye. Em bi kubarî dikarin bêjin, wekî nava dost û xêrxazê cim’eta me da ew navekî herî geş û hizkirî ye. Gelek ewledê cim’eta ermenya bûne pêşewitê cim’eta kurda, bi helalî qulix kirine bona medenyeta wê. Em bi serbilindî dikarin bêjin, wekî ji wana gelek nava tarîqa hemmerivaê da jî kivş in: Xaçatûr Abovyan, Komîtas, Avetîk Îsahakyan, Hovsêp Orbêlî û êd mayîn. Ewledê cim’eta kurdaye şîrhelal van nava ra şa dibin û kirina wana dişêkirînin. Em ji wê yazîê razî ne, wekî cim’eta ermenya vê derecê da gele peyîhatîê Abovyan dan û pareke cim’eta me jî, rast e, pareke biçûk bext û yazîya xwe heta-hetaê bi bext û yazîa cim’eta ermena ra girê da û welatê sovêtiê da gihîştîye nêt û meremê miletîêye qenc.

Tercimekirina oçêrkê Abovyane kurdzanîê îro gelekî ferz e. Me rê tê ra dît usa jî pêşxebereke fire derheqa nûrdarê ermenîayî mezin, ‘emir û karkirina wîye ‘efrandarîê da û cudagotî, karkirina kurdzanîê da binivîsin, wekî ew fikirdarê mezin bi govdê xwe yî tam bê ber çe’vê xwendevanê kurd. Wexta lênihêrandina wan pirsra em hatin ser wê fikirê, wekî nivîsara xebatê kurdzanîê nava temamya karkirina Abovyane efrandarîê da tişteki nişkê va, çawa divên, bê hemdî wî nîbûye, lê ji kûraya dilê wî û ji tambya wîye tarîqzanîê, dinêfe’mkirinê pêşda hatiye. Ne axir pirsra miletîê nêzîkî ruh û sewdê wetenhizê mezin bû, ê bona bindestî, zêrandin û paşdaketina miletê xwe dişewitî, dizêrya. Û çimkî Abovyan xweyê ruh û nifûsa qenc, merivhizîê û înternasionalîstîê bû, halê cim’etê mîna ya wîye bindest jî ruhê wî dizêrand, ew dikewgirand. Lê çaxê ewî nasya xwe da kurda, deb, jîyîn û xazma xeysetê wanî miletîê-ewana hizkirin û derheqa wan da bi şewata dil, bi qencî û xêrxazî nivîsî. Hûmanîzm, demokratîzm û înternasionalîzma Abovyan, bi texmîna me, diha kivş û heralî dîhar bû nava oçêrkê wîye kurdzanîê da û ewana hesav dibin çawa rûperê ‘efrandinê nûrdarê geş, kîjana da nîgara wîye merivaêye bedew diha rind tê ber çe’va. Bona texmînkirina vê derecê lazim bû temamya

‘emir û şuxulkirina Abovyan bi cûrê kurt bidin, wekî ew karkirina wîye kurdzanîê xwendevana ra diha f’emdarî be.

Çaxê gilî tê ser ‘efrandina Abovyane ”Qîza Tirk”, kilasîkê edebyeta ermenya Stepan Zoryan dide kifşê: ”... wekî Abovyan heqî jî hûmanîst-hûrdarê mezin bû, û ne ku tenê şuxulkirina xweye kardar va, lê bi temamya ruh û sevdê xwe, bi dilê xweyî rem, bi dilê xwe yî hizkirinê”. Bi cî û war hatiye gotinê. Abovyan, em dikarin wa bêjin, ne ku tenê bi fikir, duşurmîşbûna xwe înternasyonalîst bû, lê usa jî bi ruhê xwe, bi dilê xwe yî fire. Ew merivhiz - înternasyonalîstê mezin bû. Me cedandiyê xwendevana bi wî dilê mezinî rem ra bikin nas. Hema ev yeke, ku Abovyan ji gele fikirdarê mayîn dide cudakirinê, xazma ji wan fikirdara, ê ku derheqa cim’eta kurda da û ê mayîn da nivîsîne. Hema bi saya vî dilî, vî hereketîye, wekî nê ku tenê cim’eta ermenya, lê usa jî cim’eta mayîn qedirê Abovyan digrin, ji wî hiz dikin. Abovyan peyî cim’eta xwe ra gişka ze’ftir boy xatirê cim’eta me qelema xweye qenc, hûmanîstîê û înternasyonalîstîê ser kaxez gerandîye. Bi vê fikirê navê Abovyanî zîaretî teva ze’ftir cim’eta kurda ra navekî ‘ezîz û hizkirî ye.

* * *

Xaçatûr Avetîkî Abovyan 15-ê çirîa pêşine sala 1809-a li gundê Kanakêrê ji dya xwe bûye. Wê hênê Kanakêr gundekî biçûk bû, pênc kîlometra ji Êrêvanê berbi şimalê. Niha ew ketîye nava goveka paytextê Ermenistanê.

Kal û bavê Abovyan merivne bi nav û nandar bûne, çawa cim’et divê, xudanê ocaxa ‘enzel. mala wan ji mêvana xalî nebûye. Xazma bi nandarî û me’rifeta xwe kalkê wî Abov ‘eyan bûye. Lê îdî hêna Abovyan da mal û dewleta wan kêmbê, kesîvtî li wan dipirse. Çaxê Xaçatûr çe’vê xwe vedike - ne mal da tiştê şabûnê divîne, ne jî welat da. Oda wane kevn dilop dikir. Lê çaxê ba radibû - sur û sermê dadikuta hundur. Welatê Abovyan - bindest bû: Ermenistana Rohilatê bin nîrê şah û xanê Îranê da dizerya, lê ya Roavaê bin penya sultan û paşê Tûrkîaê da destpya diçû. Hebûna ermenî xurê milkedarê tirk û fariz bû. Ermenî van dewleta da ne xweyê serê xwe bûn. Ew ser her gavekê bêrûmet dikirin, zulma giran danîn serê vê cim’etê. Ser zerandina sosyalîye giran da ya miletîê, xazma-ayna dîn zêde dibû. Çawa miletê xaçparêz li her dera ew bêrûmet dikirin, qerf û qûçik li deva wan, rizma wane miletîê dikirin. Dat û datistana timê mêla malê xweydewlet, serwer dikir û li şikyatê ermenî heq nedipirsî. Hela ser da jî wekîlê dîwanê helan didan surmana, wêkî ermenyê xaçparêz bizêrînin, çawa miletêkî ne ser ayna dîne îslamê.

Cim’eta ermenya tarî-tarîstanê de bû. Mekteb, xwendin lap kêmbûn. Ocaxê medenyeta ermenya li welatê mayîn hebûn, lê cim’et dîwanê wan bû û

bawar kî kar ji wan nedistend.

Cim'et tarîstanê da xalifî bû. Tu çirûsya gumanê bona azabûna vî halî nedidît û loma jî gumanbir bibû.

A nava vî 'emirî, vî zamanî da Abovyan hate dinê.

Çaxê Abovyan dibe neh salî, bab destê wî digre û dibe dêra Ecmîasînê, mekteba ayna dîn da dide ber xwendinê. Tifalê gund, ku sibê heta êvarê nava bax û baxçê Kanakêrê, hafa gelîê Zengûyê bêxem û bêminet hevala ra dilîst, li vira tê bendkirinê. Her çax dîwarê dêrê jê ra dibin dîwarê hebsê. Deb û rizma dêrêye berk, seke-sifetê keşîşê bi rûdane mirûzikirî, dersê vire bêhewas, du'adirozgê her roje awakî, rojya taqetexist jê ra dibin cizaretê c'animê. Çaxê mecal dikevê, ew ji dêrê direve, dide ser rya gundê xwe yî hizretî, lê hertim jî wî digrin, paş da vedigerînin. Vira ew heta sala 1822-a hîn dibe. Wexteke kin, sala 1823* Abovyan li dêra Haxpatê dimîne, lê paşê li Tîblîsê mekteba keşîş Pogos da hîn dibe. (*Di eslê nivîsê de bi şaşî 1923 hatibû nivîsîn. -A. C.)

Sala 1824-a li Tîblîsê mekteba Hêrsîsyan vedibe. Abovyan dibe şagirtêkî wê yî pêşîn. Eva ew mekteb bû, ya ku bû ocaxeke xwendin-zanîarîye here kivş nava 'emirê ermenya da. Li vira zanyarê ermenîye baş ders didan. Hînkirin û terbetkirina şagirta angorî mektebê ayna dîn ser dereca epêce bilind bûn. Gelek xilazkrîê wê bûn şayîr, nivîskar û ulmdarê 'eyan û kareke berbiçe'v dan pêşdabirna edebyet û medenyeta ermenîaye miletîê.

Abovyan vê mektebê da guhdarya dersê ermenîzanyê, kêlmdarîê, zimanê ûrisî û firansîzî dike. Li vir ew cara 'ewlin nasya xwe dide edebyet û medenyeta ûrisaye dewlemend û pêş. Hema vê mektebê da jî hunurê 'efrandarîê cara pêşin xwe ji nava ruhê Abovyan dide dîharkirinê. Ew şîerê xweye pêşîn li vira dinivîse.

Sala 1826-a meha sibatê Abovyan bi qîmetê here bilind vê mektebê xilaz dike. Lê mekteba Hêrsîsyan tîbûna wî hindava zanebûna da naşkêne. Abovyan diqacqîcî zanebûnê diha kûr, xwendina hê bilind dest bîne. Neta wî ser Êrisêtê û Avropaê bû. Lê destpêbûna şerê Êris-Îranê mecalê nadê ew mîaserkirina meremê xwe va mijûl be. Çaxê saya altindarya ordya Êris Ermenistana Rohilatê ji bindestya şah û xanê Îranêye giran xilaz dive û dighîje Êrisetê, dikeve nava goveka wê, Abovyanê milethiz û dûrdîtî vê qewimandina tarîqî bi şabûn silav dike. Dewraneke nuh bona cim'eta ermenya dest pê dibe. Himberî Îranê qeydeqanûnê Êrisêtê diha qenc bûn. Xen ji wê, zêrandina cim'eta alîê ayna dîn da dihate hilanînê. Cim'eta ermenya bext û yazya xwe bi cim'eta Êrês ra girê da, ya ku xweya medenyeta pêş bû.

Heta xilazbûna şerê Êris-Îranê Abovyan li Haxpatê dimîne, li Qerekilîsê, çyaê Lorîê û Pembekê, deşta Şîrakê, Têlavîê û Sanahîne digere, cim'etê û halê wê yî giran ra dibe nas.

Sala 1828-a Abovyan tê Ecmîasînê. Li vira ew dibe tercimeçî û katibê katoxîkos û sînodê. Lê ne xebat dilê wî bû, ne jî dor û ber. Ecmîasîn dîsa ew Ecmîasîna berêye padamayî bû, ji pêşdaçûyîna dinyaê bêxeber, ji cim'etê qetîayî. Abovyanê milethiz, çîk û sirafet, ku îdî epêce zanebûn dest anîbûn, ji 'emirê dinyaê û cim'eta, ji halê milletê xwe fe'm dikir û xem û xiyalê pêşketinê dil da bûn bona bibe kêrhatîê cim'eta xwe, vira dîsa raserî wan qewla hat, kîjan çend sala berê, zartya xwe da dîtîbûn. Qulixçîê ayna dîn, çawa divên, haj baê dinê, haj kal û wextê cim'etê yî zelîlê nîbûn. Bawer kî, gişka fesadya hev dikirin, bin lingê hev dikolan, nemamî û xayntî hev ra dikirin. Û çaxê Abovyan fikirdarya xweye pêş, milethizîê 'eyan dikir, wana bi şikberî li wî dinhêrîn, dibûn xêrnexazê wî. Abovyan dixwest ji nava vê golgenîê derê, bide ser rya pêşketin û xwendinê, wekî bikaribe kêrî milletê xwe bê. Ew ber ra û tivdîra xweye ronayîdarîê, milletperestîê sekinîbû. Ne axir hela çûktîfê da ewî ad û biryar kiribû: "Boy xatirê weten bijîm û bimirim: awa borc, çawa nêt û merem, min daye pêşîya xwe hela hê rojê zartîa xwe da."

Bi fikir û mitalê xweye pêş Abovyan li Ecmîasînê xwe ra neyar-xêrnexaza qazanc dike. Li wî dikin "eynat, peyî wî dikevin û bi her teherî dizerînin.

Sala 1829-a profesore ûnîversîteta Dorpatê Frîdrîx Parrot koma xwe va, ya ku gotî hilkşya serê çyaê Araratê, tê Ecmîasînê. Abovyan koma wî ra 27-e îlona wê salê hildikişe heçê Araratê, kîderê, çawa legend divêje, giva gemya Nû pêxember sekinîye. Evê yekê hesab dikin çawa şe'detîya bêxwedêtiya Abovyan, pêpeskirina zyaretê û qulixçîê ayna dîn dest bi zêrandina wî merivî dikin, kîjan berêberda hiznedikirin.

Abovyan Parrot ra li nehyê Ermenistanêye cuda cuda digere û 31-ê çirya pêşîn ew hev ra tèn mala bavê wî-Kanakêrê. 2-ê çirya paşîn Abovyan Parrot verê dike. Lê we dê profesor li Ermenîstanê bû Abovyan dilê xwe ber wî vedike, derheqa nêt û meremê xwe da jê ra şirove dike. Abovyan hîvî dike, wekî bona hînbûnê li Dorpatê alîkarîê bidê. Parrot soz didê.

Pêyî çûyîna profesor ra Abovyan îdî te'mûl nake û rê dikeve ber bi Tîblîsê. Li vira jî ew 4-ê nîsanê nema Parrot û teglîfne'ma resmî derheqa wê yekê da distîne. Ji şabûna, çawa divên, lingê Abovyan 'erd nagre. Ew destxweda vedigere Kanakêrê, xatirê xwe ji dê û bavê xwe dixweze û rê dikeve berbi Dorpatê. 3-ê îlona sala 1830-î ew li cî-warê xewnerojk, hizreta dilê xwe - Dorpatê ye.

Abovyan vira jî, mîna Ecmîasînê xerîbî dikir, bîra welêt, Kanakêrê, gundî, dê û bavê xwe dikir û hizreta wan dilê wî nazik dixîşivand. Lê ew ne zara nehsalî bû, wekî bide ser rya malê, gundê xwe. Ew îdî xortê gihîştî bû û hatibû, wekî hîn be, zanebûna dest bîne, ku kêrî wetenê xwe, cim'eta xweye ji rya xwe paşdaketi, tariê û nexwendîtîda be. Û bona vê nêt û merema qenc û bilind ewî hesîna mukuryê, hizreta nava dil û ruhê xweda difetisand. Û Abovyan

'ace -'ac dest bi xwendin-hînbûnê kir. Ewî gotî nava du - sê sala da pê ra bigîhanda haqa zanebûn dest banîya, wekî bikaribûye bi serbestî kêrî cim'eta xwe bê. Ya here sereke ziman bû, zimanê almanî, kîjan vê ûnîversîtê da ê sereke bû. Tiştêkî 'ecêb: Abovyan nava pênc-şeş meha da hemû çetinaêd zimanê almanî alt kirin û îdî haqa serbest zanibû, wekî dersbêj şaş û metel mabûn bona xebathizî, zên û sirafetê wî.

Zimanê almanî jê ra bû anaxdar, pê kîjanê ewî kilîta dergê ulmê tebyetî û mexlûqetî vekir. Serî zimanê almanî ewî nasya xwe da edebyeta almanaye dewlemend û cudagotî, poezya Gyotê û Şillêr, ya şayîrê mayîn. Û divek ewî havjîya xwe cim'eta alman danî, ya ku şayîr-fikirdarê usa mezin dabûn. Ew nava zimanê ûrisî, fransizî, inglîsî, latînî da kûr dibe. Abovyan 'efrandinê, fikirdarê ûrisa û Avropaêye 'eyan û pêş dixûne, cudagotî, ê Kant, Rûso û êd mayîn. Ew nava ulmê dinêzanî û tarîqê, matematîkaê û bîologîaê, fîzîkaê û anatomîaê, kilam û sezbendî da kûr dibe. Zanebûna çend zimanê Avropaê jê ra rê vekir berbi edebet û filozofya dinya qedîmî (antîk), berbi ulmê zanyarê dewra Daxuliqandinê (rênêsansê), ronayîdarê fransizê mezin, edebyeta ûrisa. Û her demekê, wexta hînbûna her ulmekî millet ber çavê wî bû, halê millet û xwestina wîye bê hed û hesav, ku wan zanebûna bide oxira pêşketina cim'eta xwe. Û, lema jî , Abovyan wan hemû sin'eta hîn dibû, bi kîjana dikaribû halê cim'eta xwe yî giran, çetin sivik bike. Ew li welatê Rex Baltîkaê gerya-dît, ku orta dereca 'emirjîyîna cim'eta vira û cim'eta ermenya da firqîke epêce heye. Abovyan meqem danîbû hemû derecê 'emirjîyîne, debêda kêrî milletê xwe bê û lema jî ewî varvêşî nedikir orta zanebûn-sin'eta: hînî wê yekê bû, ka firnê çawa çê dikin, penêr çawa davêjinê, xarinê çawa çêdikin. Ewî derheqa her tiştî da dinivîsî-jî giritin, xebitandina kêr û çetela girtî heta xweykirin û terbetkirina zara. Abovyan zanibû, wakî vê gevê ê mîna wî nav millet da tunene û lema jî ew gotî hemû dereca da kêr bihata, çawa divêjin, dewsa de û şeşa şuxul bikira. Bona milletê wî ji wê zinêqetî derketa, xwe li rya pêşketinê bigirta, Abovyan li vira, Dorpatê, programma şuxulkirina xweye li wetenê çê dikir. Meremê sereke ew bû, ku bi serî xwendin-zanebûnê cim'eta xwe hişyar ke û ew cim'et bikaribe halê xwe yî giran, ber undabûnê bivîne û qîmat ke. Abovyan dixwest ruhê milletî nava cim'eta xwe da-hişyar ke, wekî ew lazimaya şerkarîa seyasetî, ya bona destanîna azayî û serbestîa milletî fe'm bike. Ewî gele dûr û kûr didît, goveka f'emdarya wî gele fire bû.

Abovyan meha kanûnê xatirê xwe ji Dorpota hizkirî dixweze û berê xwe dide wetenê hizretî, ax û kovana dilê xwe. Lê çawa wexta çuyîne, usa jî-vegerandinê ew li Pêtêrbûrgê û Moskvaê diqeside. Çi bû meremê vê yekê? Merem yek bû: çar û mikana bivîne bona şuxulkirina xweye li welêt. Abovyan hal û wextê welêt, Ecmîasîne, merivê wêye nezane bêrem rind zanibû, lema jî dixwest bi tivdîr be wira, ku diha bi kardarî û bêminet şuxulê xwendina

cim'etê, ronayîdarîê nava millet da mîaser ke. Ew li Pêtêrbûrgê û Moskvaê rastî gire-girê dîwana padişê tê, ji alîê padişa Ûrisêtê Aleksandra Fyodorovnaê da tê qebûlîkirinê. Û li her dera meremê wî yek bû: derd û kulê xwe ber wan meriva, çawa divejin, dirêje û sozê ardimîê nava dereca karkirina xwe da ji wana bistîne. Abovyan nêt hebû werguhastina kifş bike nava xwendina cim'etîê. Boy vî meremî aw rastî gire-gir, dewletîê ermenî jî tê û ji wana ardimîê hîvî dike. Lê nêt û meremê Abovyane milletperestîê dûrî hiş û sewdê dewletya bûn, kîjana ra kîsê zêra ser weten û millet ra bû.

Abovyan ser Naxçivana Nuh ra nîveka meha hezîranê dighîje Tivlîsê. Bi dokûment û kefildarîê lazim va ew diçe bal katoxîkosê ermenya Hovhannês Karbêsî, ê ku bi xizmeta resmî li Tivlîsê qesidîbû. Çaxê Abovyan nêt û meremê xwe jê ra divêje, de'wa alîkarîê jê dike, evê te hulmeyî wî dike, divêje: "Bi çi fermanê usa ser min da dixurî, tu, merivê ji dîn û îmanê derketî. Tu rind karî dilê merivê xêfike bêşûc şetû kî, lê hînkirna wan ne pêşê te ye." A bi vî teherî, hema serê-ser da şeka Abovyan dişkê. Lê ew merûm nave, li Tivlîsê û Ecmîasînê şerkarîa xwe pêş da dibe.

Sala 1837-a 12-ê meha sivatê Abovyan kivş dikin çawa serwêrê mekteba Tivlîsêye we'delî û dersdar. Ew li vira bi cûrê neresmî mektebekê vedike, li kîderê dixwaze fikirdarê usa hazir ke, ê ku nava millet da kêrî şuxulê ronayîdarîê, xwendina cim'etîê bèn.

Bona diha aza û bêminet şuxul bike, Abovyan 'erzê dide û ji rutibê qulixçê ayna dîn dest dikişîne.

Sala 1843-a 19-e tîrmê ew ji qulixa li Tivlîsê tê azakirinê û tê kivşkirinê çawa serwêrê mekteba Êrêvanê. Lê qulixçê dîwana padişê, fikirdarê ermenîaye rêaksîon tabetî nedidan Abovyan. Lê wî halê çetin da jî aw şuxulkirina xweye 'efrandarîê û ronayîdarîê pêşda dive. Kutasya salê 30-î û destpêbûna salê 40-î ew afrandinê xweye hîmlî dinivîse û nava wan da romana xweye eyan "Birînê Ermenîstanê". Ew nîveka salê 40-î nava kurdê Ermenîstanê digere, qinyata berev dike û oçêrkê xweye terîqîê-miletzanîeya qîmetlî- "Kurd" û "Ezdî" dinivîse.

Lê çîqa diçe halê Abovyan diha giran dibe. Ew derheqa wê yekê da gazinê xwe katoxîkosê ermenya Nerses Aştarakêsî dike û şikyatê qulixçê dêra Ecmîasînê dike ber wî, ê ku bi şuxulkirina xwe zyan didan millet û karkirina wîye ronayîdarîê. Ew usa jî hîvî dike, wekî ewî ji xebatê aza kin.

Sala 1848-a 21-ê sivatê Hêrsêsê katoxîkos ewî teglîfî Tivlîsê dike, wekî mekteba ser navê Nêrsîsyanda bibe dersdar. 11-ê meha adarê cab dighîje Abovyan, wekî ew ji qulixê derxistine seba mekteba Nêrsîsyan da derbazî ser xebatê be.

2-ê meha nîsanê sala 1848-a Abovyan sibê zû ji mal dertê û îdî venagere,

bê ser berate unda dibe. hetanî roja îroyîn jî nehatîe azurukirinê, ka çi hate serê Abovyan.

* * *

X. Abovyan mîrateke edebyetêye dewlemend pêyî xwe hiştîe. Ewî, bawar bikî, bi hemû janrê edebyetê nivîsîye û bi xwe yî bûye rikindarê ji wana çend heva. Cara pêşîn Abovyan nivîsara serhatya; novêla, oçerka, qisê şîretkarîeye bi cûrê qelibotka nava edebyetê ermenya da kirîye ‘edet û hilbet romana pirbelg bi serî ”Birînê Ermenîstanê”. Ewî gele şîerê lîrîkê peyîhatîe xwe ra hiştine, lê usa jî xwe nava dramaturgîa da cemidandîye. ‘Efrandina oçêrkê terîqîe-miletzanîe, rêwîtîe jî navê wî ra girê daye. Abovyan xebatê ulmîeye kêrhatî nivîsîne, cudagotî, ê zimanzanîe. Ew pîrsê gramatîka zimanê ermenî va mijûl bûye, kitêbê dersa nivîsîna. Guhdarîke mezin danîe ser derecêd dersdaynê. Abovyan pîrsê tarîqa cim’eta ermenîa va mijûl bûye. Ewî guhdarî daye ser derecêd deb, rizm û ‘emirjîyîna cim’etê û derheqa wan da xebatê hewaskar nivîsîne. Berbiçe’ve karkirina wî dereca berevkirin û helkirina nimûne zargotina cim’eta ermenya da, lêniherandina wane ulmîe da. Û, kutasî, Abovyan bi pîrsê tarîq û milletzanîa cim’eta kurda va mijûl bûye û vê derecê da xebatê xweye pîrçîmete ”Kurd” û ”Ezdî” nivîsîne. Ewî usa jî nimûnê zargotina kurda jî zarbêja hildane, nivîsîne.

X. Abovyan şîerê xwe da fikir û mitalê xwe derheqa ‘emir, halê welêt û cim’etê da ‘elam kirine. Xem û xyalê wî, xwestina wî ew bûye ku cim’eta wî bighîje dasekinandina dewleta xweye wextekêye zor. Ewî şîerê evîntîe û hizreta dilê kûr nivîsîne, lê gişkî ze’ftir yazîa ermenî û wetan dilê wî eşandîye. Qelibotkê xwe da ewî xwestîye vana ruhê meriva da xeysetê here qenc û bilind terbet ke. C’edandina fikira hev’emkirin û hev ra şuxulkirina cim’eta bike nava ruhê merya.

‘Efrandina Abovyane bedewetîeye here berbiçe’v romana ”Birînê Ermenîstanê”ye. Wetenhizya nivîskar bi cûrê herî sext û geş nava we da hatîye diharkirinê. ”Birînê Ermenîstanê” romana ermenîaye pêşîn e. Berê ‘ewilî ewî ce’dandîye vê ‘efrandinê da ruhê şerkarîe, agirê wê yî îdî ser temirandinê nava hiş û sewda, bîr û bawarê ermenî da geş bike. Ewî dixwest nîşanî cim’etê ke, wekî hesîna here bilind û zyaratî wetenhizî ye, wekî bona serbestî û azaya weten ewledê wî gotî ‘emirê xwe nehêvişînin. Bi mêrxasya Axasî ewî merivê mayîn danîn xîretê. Abovyan şerê milletîe-azarîe anîye ber çe’va û pê ra jî ketina Ermenîstana Rohilatê nava goveka dewleta Ûrisêtê. Ew vê ‘efrandinê da pêş da tê çawa terefdarê Ûrisêtê û cim’eta ûris û mêremê wî ew e, ku bin bandûra vê dewleta zor da dewleta ermenîya bê çekirinê.

Fikireke here kivş û bona hemû wexta rast, ku nava ”Birînê Ermenîstanê”

da hatîye dîharkirinê- ew yektîa kar-meremê cim'etê bindest e hindava zordestîa zeftçîê dereke da. Îro jî wê fikirê zoraya xwe unda nekirîye, mezinaya Abovyan nava wê yekê dane, wekî ew xên ji cim'eta xwe bona zêrandina cim'eta mayîn jî ber xwe dikeve û tê ser wê fikirê, wekî nêt û meremê miletê bindeste zêrîayî yek in, tomerî ne. Wetenhizya here şewat ewî nava goveka miletê da bend nake. Abovyan welatê xwe, cim'eta xwe bê hed û hesab hiz dike, pê ra jî cim'etê mayîn bîr nake. Ew hizkirinê berbi wan dîhar dike, mela wan dike, ji hal û wext, sewra dilê wan fe'm dike. Lê 'efrandina xweye "Qîza Tirk" da Abovyan hîmlî vê fikirê dide 'eyankirinê: meriv gotî çawa meriv hev fe'm bikin, mola wan ser hev be, ardimê bidin hev û vê derecê da gotî varvêşya miletîê, ayna dîn hil nedin ser hesêv. Abovyan li vira pêş da tê çawa hûmanîst û demokratê 'eynî.

Abovyan ji wan fikirdarê dûrdîtî bû, ê ku hela hê sed pencî sal pêş da fe'm kir kemala zargotina cim'etê bona pêşdaçûyîna edebyetê. Ewî gele nimûnê folklorê ermenya berev kirin û romana xwe da dan xebatê.

Abovyan ziman rast qîmet kirîye, ew hesivandîye çawa derceke parastina milet. Zimanê ermenî yî edebîyetê yê berê-grabar ji zimanê cim'etê dûr ketibû, lema jî seva wê femdarî nîbû. Û ewî efrandinê xweye bedewetîê bi zimanê cim'etê nivîsî.

Abovyan pirsê zimanzanîê va mijûl bûye û ji tabîa zimanzanîya tarîqîê himberîkirîna derecê xuliqandin, pêşdaçûyîn û werguhastina zimên nihêrîye, 'enene kirîye. Ew pirsê gramatîka zimanê ermenî va mijûl bûye û kitêba 'ersa nivîsîye.

Abovyan gele pirsê pedagogîê bi ulmî şirovekirine. Ew pirs ewî xwestine milet ra girêdayî 'enene kirine, pirsê hîlanîna nexwendîtîê, mîaserkirina xwendina hemtomerî pêş da kişandiye, kîjan gotî bi serî mektebê cim'etê bihata mîaserkirinê. Zarê xebatkara gotî usa jî hînî sin'et, pêşê cuda-cuda bûna, wekî kêrî cim'etê bên. Ewî pirsê vekirina înstîtûta pedagogîê li Ermenîstanê pêş da kişandiye. Abovyan ser wê fikirê bû, wkî zarê cim'etê cînar jî mekteba da bidin hînkirinê, ku ewana ronayê bele kin nava cim'etê xwe. Bi temamî nêta ronayîdar ew bû, wekî bajarvanê kêrhatî bona weten hînkîn û terbetkin. Ew axirîê hatîye ser wê fikirê, wekî lazim e qulixçîê ayna dîn ji dereca terbetkirina zara dûr xin.

Gele heweskar in fikir, nêtê Abovyane tarîqzanîê, berê pêşin ê derheqa tarîqa cim'eta ermenîaye cuda-cuda da ("Çend Gilî Ji Derheqa Ermenîa da", "Rêwîtî Berbi Kelefê Anîê").

Abovyan tarîqzanya Avropaê krîtîk krîye, çawa ya dewletê xweykolanya, bin nîrê kîjana da gele cim'etê dinyaê dizêryan. Ew wê nêta gele rast 'elam dike, wekî tarîqzanya dewletê roavêye kapîtalîstîye zor qulixî kara wan

dewleta, cedandinê wane dinêzeftgkirinê dike û dide kivşê, wekî nava wê da tarîqa cim'eta, karkir-zemetkêşa tune. Ew dinivîse, wekî ew tarîqzanî xwestin, kara cim'etê biçûke bindeste zêriyê seyasetîê û malhebûnîê bendî tiştêkî hesan nake. Abovyan gele bi cî û war dide kivşê: "Tarîq qulixî miletê mezin dike".

Abovyan bi dileşî dewra serbestya cim'eta ermenîa bîr tîne. Çaxê ew derheqa Anîê da dinivîse û serbestya cim'eta ermenîyê seyasetîyê wê hênê dide kivşê, çawa divên ax dike, benê pişta wî diqete. Wetenzîê mezin dikewgire, wekî cim'eta wîye merîfet, xweya medenyeta pêşe giran ketîye wî halê bindestîê, ruhê wê çilmişîye. Fikireke dinêye rast û kêrhatî derheqa ulmê tarîqê da. Lênihêrandina pîrsê tarîqa cim'etêye berê gotî bi wê fikirê bê derbazkirinê, ku bibe teqildara safîkirina pîrsê şerkarîa zor. Ew bi her teherî dixweze wê fikirê bike hiş û sewdê miletê xwe, ku ew timê wa sexîr, hêsîr û bindest nîbûye û dikare niha jî bighîje serbestya miletîê, eger xwe li xwendin, pêşketinê bigre, eger derece mîrxasîê û şerkarîê dîsa nava ruhê xwe da geş ke.

X. Abovyan, çawa fikirdarê bi goveka fire, merivhîzê mezin cim'etê mayîn jî bîr nake, xazma ê mîna miletê wî bindest û zêriyê. Fikirê wîye derheqa kolonîalizmê da îro jî kemala xwe unda nekirine û tê qeyî bêjî bona we'dê niha jî hatine gotinê.

Dilê Abovyanî mezin merivhîzîê heylo bona binelîê Amêrikaêye berê - ber da, aborîgênê wê para dinyayê dêşe. Ew xebata xweye "Çawa Ronayî Dane Amêrikaê" dinivîse, kîjanê da bi gef û gur kolonîzatorê ji Avropaê hatî gunekar dike, ê ku dibêjin, wekî giva ronayî, medenyetê, şarîstanete bona wan divin, lê bin wê perdê da binelîêd cî xeza dikin. Ronayîdarê mezin ser wê fikirê ye, wekî diha baş e her cim'etek bi 'erf û 'edet, deb û rizma xwe bijî, vana kîjanê da derecêd qenc û merivatîê çîqa bêjî hene, lê ne ku bêne xezakirinê û ew derecê wane miletîyê baş jî ji alîê zeftçîê derekê da bêne pêpeskirinê. Meriv hew tirê fikirê Abovyane derheqa aborîgênê Amêrikaê da hema bona vê demê hatine nivîsarê, çaxê rasîstê Ştatêd Yekbûyî hind kirinena hesarê û orta wê hesarê da ew têne zêrandinê.

X. Abovyan bi hêrs û "eynat derheqa wan da dinivîse, ê ku bi me'na rikinkirna şahrîstanîetîê cim'etê tam xeza dikin. Ew gelekî ber xwe dikeve û divêje: "Ax, kî tiştê wa bihese û nifira li merivê waye bêre'me a'c neke?"

X. Abovyan jî tabîê rast tarîqa cim'eta qîmet dike, cudagotî, derecêd keysetê her cim'etekê bi wan qewlê tarîqî şrove dike, nava kîjan da ew dimînin. Ew dinivîse: "Tu cim'etek, belê, tu merivek bê kêmasî, sistayî, bê 'eyba husnê dinê û keyset tune, eger em ser da jî hildin ser hesêv, ka çîqa xirav bûye hal û wextê wanî seyasetîê, qemlê wane kilîmaê û gêografîê".

Hîmê fikirmîşbûna Abovyane tarîqzanîê merivhîzî ye. Ji ser vî rikinî, ji ser sekûya (platforma) rast ew pîrsê tarîqa hemû cim'eta dinhêre û pê ra jî ya

cim'eta xwe. Ew dide kivşê, wekî mîsionêrêd Avropaêye katolîkîê nêta qelp, derheqa ermenîa da 'êlam dikin, çimkî ermenî naçine ser taê wan, meseva katolîkîê qebûl nakin.

Abovyan 'efrandinê xweye bedewetîê û zanîarîê da îzbat dike, wekî hemû cim'et xweyê nifûs, xeyset û ruhê qenc in, wekî ew nifûsa qence bilind bal wan cim'eta gişka heyê, kîjana kolonîzator nîşan didin çawa ê ne tam, ne ser dereca angor.

A, ji vê konsepsya xweye tarîqzanîêye rast jî nûranîê mezin pirsê tarîqa cim'eta kurda, xeyset, terbe-tore, rizim û deba wê qîmet kir.

* * *

Sala 1848-a meha çirya paş û çille ser rûperê rojnema "Kavkaz" ê li Tivlîsê, ê hejmarê wêye 4, 47, 49, 50 û 51 da oçêrkeke tarîqîê-miletzanîêye hewaskar bi sernivîsara "Kurd" ronayî dît. Bin da qolê X. Abovyan bû. Lê hela pêşya vê yekê, meha sivatê sala 1848-a dîsa wê rornemê da oçêrka tarîqîê-miletzanîêye "Ezdî" tê çapkirinê, lê bê qolê Abovyan. Paşê, wexta lênihêrandina vê oşêrkê û derecêd mayîn tê îzbatkirinê, wekî ew oçêrk ya nûrdarê mezin e, lê çima qolê wî bin da tune, kes nizane. Bi texmîna me eva yeka bi rezadilya xudan hatîye kirinê. Abovyan çima nexwestîye navê wî bin wê oçêrkêda hebe? Bi texmîna me me'ne dikare tenê evbe: wêda ewî derheqa ayna dînê ezdyada da nivîsiye, navê apkê wan daye. Lê eva yeka tiştêkî asaxkirî bû angorî dogmê ayna dînê ezdyada. Usan e, Abovyan, ê ku nava heleqetîêd dostîê da bû tevî ezdyada, axa û berê wan, nexwestîye navê xwe 'eyan ke, wekî dilê wan xazma, dilê tirêqê ezdyada nekeve û bi wê yekê qedrê xwe bal wan neexe, kîjan, çawa ji hemû tiştî kivş dibe, gele bilind bûye.

Eger oşêrka "Ezdî" saxya Abovyan da çap dibe, lê ya "Kurd", sed heyf, îdî peyî xeyîbbûna wî ra.

Van oçêrkê Abovyan hewaskarîke mezin pêş da anîn ne ku tenê rûê wê yekê da, ku xebata ji xebatê here pêşin bûn, wekî derheqa kurda da li Ūrisêtê çap bibûn, lê usa jî bona wê yekê, ku wan da çend pirsê xuliqandina cim'eta kurda, xazma medenyeta wane ruhanîê, 'erf û 'edet, ra û rizma milletîê cara pêşin dihatine lênihêrandinê û azurukirinê.

Niha, berê pêşin, em dixwezî derheqa tarîqa nivîsara wan oçêrka û êd mayî ne, derheqa cim'eta kurda da bi qelema Abovyanê mezin bidine kivşê, kîjan bêfitye gele hewaskar e.

Çawa zanyara îzbat kirîye, hela hê berî sala 1844-a dîwanxana dewsgirtîê padişê Ūrisêtê li Kavkazê bi destî qulixçîê dewletê Koms Bênkêndorf dispêre X. Abovyan, wekî ew derheqa kurda da, hal û wextê wan, 'emirjiyîn, rizma wan da xebatekê binivîse. Çawa tê kivşê, îdî heta hingê Abovyan dîwanê û

dinya ulmîê ra ‘eyan bûbû, çawa zanê ‘emir, tarîq, zimanê çend cim’etê Kavkazê, Rohilata Nêzîk û Orte û lema jî vê pirsra çetin û cabdar dispêrine wî. Bona qedandina vê spartinê, kîjan, hilbet, tiştêkî bi dilê wî bûye, Abovyan sala 1845-a du heftya nava qebilê kurda digere. Êw derheqa wê yekê da wa dinivîse:

“Par na pêrar min angorî xwestina maqûl Koms Bênkêndorf, we’dê xwe yî jî qulixê aza, hema rojê ‘eyda bûyîna ‘ÿsa, zivistana here sur û seqem, kîsî xwe dest bi sefera xwe kir berbi kurda û ezdya wan fênomênê tarîqa, du heftya nava wan da debîrîm, min xelatê qîmetlî li kal û pîra para ve kirin, wekî ew îtbarê li min bînin û bi teherî, mola wan da ser xwe, wekî jî wan merivê hindava hemû tişta da şikber gilfê qîmetlî bihesim derheq ra deb, rizm, ‘edetê wan da, derheqa hebandina wan da, derheqa xeyset û hila poezya wan da: du meha zêdetir, temamyê şevê dixebitîm, çimkî ro we’dê minî xebatê tune bû, min miqaleke nekêm hewaskar û epêce mezin nivîsî, derheqa kîjanê da li Ecmîasînê-nêta xweye pesindayîne ‘elam kir xût u’lmdar, serhing û piştovanê maqûl dewsgirtîê padişê maqûl Mûravyov. Min miqale bi almanî nivîsiye, gele gilfê pesindarîê derheqa wê da bihistine: çixareke nekêm kişand, çîqa destê min hat, min tik-tenê hazir kir û ber girt, lê niha, Xwedê zanibe, li kîderê - Almanîaê yanê Tivlîsê, ew dirize“ (X. Abovyan, ‘Efrandin, cilda 7-a, rûe 194-195-a).

Vira lazime bidine kivşê, wekî tenê wê carê Abovyan nava kurda negeryaye û ew rasthatina wî û kurdaye pêşîn nîbûye. Berî hingê ewî kurd nas kiribûn, çimkî îdî wê hênê li deşta Araratê, berpala çyaê Elegezê, yalê gola Sêvanê kurd hebûn. Abovyan, wexta gerê xweye berî hingê jî gelek kurd dîtibûn. Ji sala 1829-a hetanî sala 1844-a ew tevî ulmdarê Ūrisêtê û Avropaê li Ermenîstana Rohilatê, paşalixya Bazîdê, qeza Mekûyê gerîaye. Yek ji wana profesore ûnîversîteta Dorpatê Frîdrîx Parrot bû, tev kîjanî Abovyan hilkişya heçê çyaê Masîsê, li Ermenîstana Rohilatê gerya. Ê mayîn akademîkos Hêrman Abîx bû, bi kîjanî ra ew dîsa li Ermenîstana Rohilatê digere. Wexta gera li Ermenîstanê ew nivîskar, folklorzan û rêwîê alman Frîdirîx Bodênştêdt ra jî hevaltîê dike. Abovyan miletzanê alman A. Fon Haksthayzênr a jî dibe hogirê nêzîk û wî ra jî digere. Hevaltîke helal û nêzîk orta wî û ulmdarê alman Morîs Wagner da çê dibe.

A bi vî teherî, hevaltî û gera bi van rêwî, ulmdarê ‘eyan ra bêhemdî wî jî Abovyan mecbûr dike, wekî ew diha nêzîk nasya xwe bide kurda û ‘emrê wan. Ev rêwî-ulmdar dihatin li Abovyan disekinîn, dibûne hewcê wî, çimkî nûrdarê ermenya jî rohilatzanê naskirî bû, merivekî hunkufî wan. Him Abovyan kêrî wan dihat û him jî ewana kêrî wî, lê çawa paşê wê bê kivşê, diha ze’f fikirdarê ermenî wan ra bû merivekî gelekî kêrhatî, alîkar nava dereca wane, ‘efrandarîê da, xazma wexta lênihêrandina pirsê kurdzanîê. Çawa

ewladê cim'eta ermenya, ya ku bi sal û zemana cînar û dostê cim'eta kurda bû, Abovyan xweyê zanebûnê kûr diha zû ji kurda fe'm dikir ne ku rêwî-ulmdarê Ûrisêtê û Avropaê, bona kîjana kurd miletekî nenas bûn. Abovyan, çawa zimanzanê kurdî 'eyan Qanatê Kurdo dide kîvîşê, zimanê kurdî rind zanibûye û bi pîrsê teşkîla wî zimanî, gramatîka û leksîka wî va mijûl bûye, klamê kurdî bi wî zimanî nivîsîne û xwe xa jî tercimeyî zimanê almanî kirine. Eve me'nî, wekî her ulmdarekî, kîjan bi kurda û kurdzanîê va mijûl dibû, xwe Abovyan digirt, dibû hewcê wî. Û nûrdar jî ne ku tenê bi hizkirin wan ra nava kurda digerya, lê usa jî alîkarîa berbiçe'v dida wan dereca lênihêrandina pîrsê kurdzanîêda. Ewî merd-merdana qinyatê derheqa kurda da li ulmdara bela kirine, wan ra şandine û xwestina wî tenê ew bûye, ku ewana çap bibin, unda nebin. Abovyan bû mîna pirakê orta Avropaê û Asyaê da, diha rast, Avropaê-Ermenîstanê û Kurdîstanê da. Alîkarya wî kareke mezin da şuxulê pêşdaçûyîna kurdzanîê li Avropaê. Û ya sereke, kêrhatiya here mezin ew e, wekî ewî hîmlî ji tabya rast û qenc kurd danîn ber çe've ulmdarê Roavaê û alîkarî dida wan, ku cim'eta kurda angorî sekûya wî, pilatforma, konsensya wîye tarîqîye rast qîmet kin. Nûrdarê ermenîayî mezin çawa xêrxaz û dostê kurda cim'eta me danî ber çe've avropya. Heyna wî, bi bawerbûna meye tam, gele 'ulmdarê Avropaê ji wan şaşya parastin, kîjan wan wetenwarê wan hindava kurda da berdidan, ê ku rastî Abovyan yanê jî yekî mîna wî nedihatî. Sala 1844-a, meha adarê şayîrê alman F. Bodênştêd rohîlatzan Georg Roznê ra tê Erêvanê. Evê te ji Abovyan hîvî dike, wekî kilamê hemû cim'etê qeza Erêvanê berev ke û jê ra bişîne. Çawa merivekî xêrxaz û borcnas ew wê spartina hevalê xwe diqedîne û heta evê te vedigerin Almanîaê, îdî deftera kilamê ermenî, kurdî û adîrbêcanî, ê bi destî Abovyan berev kirî, li wira tê standîne. Ew sala 1846-a bûye. Wê defterê da Abovyan bi zimanê ermenî, kurdî û adîrbêcanî kilama dinivîse û pê ra jî wana bi xeber-xeber tercimeyî zimanê almanî dike. Lênihêrandina wan, xazma ya kilamê kurdî, careke dinê jî îzbat dike, wekî Abovyan zimanê kurdî zanibûye, teqîl û awazê wî zimanî baş texmîn kirîye. F. Bodênştêd wan kilama vê kitêba xweyê sêcildê da çap dike: "Hezar û yek rojî li Rohîlatê". Ew sala 1865-a li Bêrlînê çap dibe. Wan da ew wan kilama bi şayîrî, bedewetî tercimeyî almanî dike. Paşwextîê tercîma wan kilamaye xeber-xeberîye almanî, ku Abovyan kiribû, cilda efrandine wîye 8-a da tê çapkirinê (sala 1958-a). Lê cilda efrandiê wîye 7 da ew kilamê ji wê defterê, kîjan F. Bodênştêd ra hatibû şandinê, hatine cîwarkirinê, kilamê kurdî bi wî zimanî û bi herfê ermenî usa, çawa Abovyan kirîye, pê ra jî tercîma wane ermenî, ku dîsa nûrdar kirîye.

Eva deftera hanê arxîva ermenîzan Karapêt Kostanyan da hatibûye weykirinê, lê niha Mûzêa Edebyetê û îskûtvaê da ne, ya ser navê Exîşê Çarêns.

Cara pêşîn ev kilam ji alîê E. Şahazîz da sala 1940-î cilda "Dîwana"

Abovyane 'ewlin da hatine çapkirinê, lê paşê ewana kitêba A. Xanalanyane "Abovyan û Zorgotina cim'etê" da hatine cîwarkirinê.

Çaxê Abovyan oçêrka xweye "Kurd" û "Ezdî" xilaz dike, yekê jî hevalê xwe profesorê ûnîvêrsîtêta Myûnxênê, Morîs Vagner ra dişîne, ê ku rohilatzan û kurdzanekî kivş bû. M. Vagnêr derheqa we yekê da dinivîse: "Çend sala pêyî wê yekê ra, çaxê ez ji Rohilata Pêş vegeryam (ew sala 1844-a bûye) bi saya qedirgirtina serwerê mekteba qeza Êrêvanê, dostê min Abovyan, ê ku hesav dive zanê rohilatê yî herî baş û tam, gele zimanê Asîaê zane-min xebateke miletzanîye gele heweskar stend derheqa çend miletê Asîa Roavaê da û xazma derheqa kurda da, bi kîjanê va ew we'dekî dirêj mijûl bûye, çawa li Ūrisêtê, usa jî li Îranê û paşalixya Bayazîdê. Destnivîsara maqûl Abovyan, kîjanê da lênihêrandinê bi hûrgilî hene derheqa kurda û deb û rizm, xeyset û qewlê e'mirjîyîna ezdya da, ku gele cya nava wan da dimînin, teslîmî min bû bi wî qewlî, ku ez bêminet qinyata jê hildim û ew bûye hîmê vê oçêrka min". (M. Vagnêr, Sefer Berbi Îranê û Welatê Kurda, Leypsîg, 1852-a cilda 2-a rûê 219-a). Cîkî mayîn, dîsa wê xebata xwe da M. Vagnêr dinivîse: "Çaxê ez ji Ūrisêtê hatim, min ji dostê xwe, serwerê mekteba qeza Êrêvanê Abovyan hîvî kir, kîjan bi saya zanebûnê xweye bêhesav derheqa zimanê Asîaê da û bi saya mayîna xweye nêzîkî Araksê, halekî diha kardar dane, ne ku rêwîê Brîtanîaê, ku li vira û wira -Kurdistanê û Sîncarê (Şengalê) se ra-be ra lênihêrandina 'emrê ezdya derbaz dîkin, ku mîna qinyatê xweye berevekirûye qîmetlî bişîne, ê derheqa ayna dînê ezdya, rizm û deba wan da. Hela hê pênc sal peyî veğerandina min ra derbaz nebûbûn (sala 1847-a bû), çaxê xwestina min qedyâ" (rûê 254-a). Rûpereki wê kitêbêyî mayîn da M. Vagnêr bîr tîne, wekî Abovyan jê ra kilamê kurda û ezdya şandine. Çawa hindava Bodensştêd da, usa jî ya Vagnêr da Abovyan borcnasîê dîhar dike û bêminet, merd-merdane qinyatê xweye hela çapnekirî dişîne. Oçêrka Abovyane derheqa kurda da Vagnêr kitêba xwe da dide xebatê, ya "Sefer Berbi Îranê û Welatê Kurda". Şirovekirina xebata Abovyan hatiye dayînê ser zêdaya wê kitêbê da, kîjan ji van herdu paran e: "Kurd-Xuliqandin, Ziman, Cî-warbûna Wane Geografyê, Deb, Rizm û Xeyseta Wan", "Ezdî Yanê Jî Şeytanperêstî, Xuliqandin, Ziman, Poezya, Ayna Dîn, Deb, Rizm û Xeyseta Wan".

Me çawa da kivşê, Abovyan qinyatê xebatê xweye kurdzanîê wexta gera li nehîê mayîna kurda berev kirine. Xebata vî teherî ra bi têrmînologya miletzan û folklorzanaye we'dê niha divêjin, xebata deştê.

Xên ji wê, Abovyan tu wexta mecal ji destê xwe bernedane, ku bi pirs û pirsîarê ji merivê zaneye dinêdîtî xazma ê kurdnas qinyatê lazim derheqa cim'eta kurda da berev ke. Merivê herî pêşin, ji kîjanî Abovyan timê qinyat derheqa kurda da hildane, çawa divêjin, ji malê bûye, apê wî Harûtyûn Abovyan.

Avgûst Fon Haksthaûzên Abovyan ra nava kurd û ezdya gerîaye, derheq kîjanê ew şe'detîke wa dide: “Şebeqê, seheta şeşa em he rçar rê ketin, Abovyan, apê wî, Pêtêr Nêy û ez, berbi şimal-roavaê, berbi ezdya“. Cîkî mayîn ew dide kivşê, ezdî dostê Abovyan û apê wî bûne. Çawa tê kivşê apê wî Harûtyûn nava heleqetîê dostîê da bûye bi ezdîa ra û bêfitya, kurmancî rind zanibûye. Usane ew înfomatorekî zane û amin bûye, pê ra jî alîkarê kurê birê xwe yî hizkirî Xaçatûr bûye. Tiştêkî nêzîkî aqilan e, wekî Harûtyûn usa jî dersdarekî zimanê kurdî bûye bona Abovyan. Naqewime ew dostê ezdya bûye û zimanê wan nizanibûye. Ezdî, ê ku ji alîê temamyâ dinîa Mehmedîê da hatine zêrandinê, hindava merivê ji miletê mayîn şikber bûne û îtbara xwe gişka ze'ftir bi ermenîa anîne, çimkî halê wan yek bûye; xazma wan ermenya, ê ku bi zimanê wan xeber dane. Vira lazim e wê yekê jî bêjin, wekî çawa ji xebatê Abovyane kurdzanîê tê kivşê, zanebûnê haqa kûr derheqa kurda da ewî nikaribû bi gerekê-dudê nava cim'etê da dest banîna, çiqasî jî xweyê sirafetê mezin bûya. Ew zanebûn şe'detîê didin, wekî Abovyan temamyâ 'emirê xweyî fe'mdar da kurda va mijûl bûye, ew cim'et hertim ber çe'vê wî bûye. Û tiştêkî ne dûrî hişan e, wekî bi temamî mala Abovyana kurda ra girêdayî bûye, dostya wê malê û kurdaye kevn, we'dedirêj hebûye.

Abovyan derheqa kurda da pirs û pirsyar ji merivê mayîn jî kirine, çawa ê 'esilê xwe da kurd, usa jî ermenîê kurdnas. Awa navnîşa wane tenê me va 'eyan: axê ezdya Temir axa, Cefer-xanê Xoyê, kurê Silman Axa-Îbrahîm û Şemîdîn, keşîşê ermenya-Gazar Têr-Xêvondyan, Barsêxê arkêpîskopos û êd mayîn.

Bona nivîsara xebatê xwe ya kurdzanîê, xên ji gera nava kurda, pirs-pirsyara, Abovyan dest bi lênhêrandin û xebitandina çe'vkanîê bi nivîsar dike, çawa ê çapbûyî, usa jî ê neşirnebûyî. Hêna Abovyan da tu xebatê kurdzanîêye pîrî hindikî tam tune bûne. Ne axir em hema Abovyan hesab dikin hîmdarê kurdzanîê li Ûrisêtê. Peyî wî ra û bi gele dereca bi saya karkirna wî, bi saya efrandinê wî kurdzanîn li Ermenîstanê û Ûrisêtê pêşda çû. Usan e, çe'vkanîê bi nivîsar, ji kîjana Abovyan dikaribû qinyat hildana, gele kesîv bûn, ewê ku hebûn jî, paê pirê yanê wî va ne 'eyan bûn, yanê jî ewî nikaribûn destxistana. Kitêbxanêd Avropaê û Peterburgê jî dûr bûn. Qewlê Ermenîstana Rohilatîê û Kavkaza wê hênê da hêsa nîbû qinyatê lezim derheqa kurda da rihet destxistana. Heta xebatê tarîqzanîêye usa eyan, çawa ê Xûkas Încîçyan Abovyan nikaribû li Ermenîstanê destxe,bi nemê hîvî kirîye, wekî wana li Tivlîsê destxin û jê ra bişînin. Nûrdarê mezin xên ji xebatê X. Încîçyan usa jî ya Mîkaêl Çamçyan dide xebatê. Morîs Vagnêr şedetîê dide, wekî Abovyan xebatê tarîqzanîê û geografîê û destxetê kitêbxana dêrê li Ermenîstanê û Erîvanê nihêrine.

Çawa îdî hat gotinê, Abovyan çend zimanê rohilatê zanibûye. Ew xwe xwa

şedetîê dide, wekî li çe'vkanîê erebî û farizî nihêriye, lê wan da tu qinyatê dewlemende kêrhatî û layîqî bawarkirinê nedîtine.

A bi vî teherî, xebatê xweye kurdzanîê Abovyan hîmlî ser hîmê lênihêrandinê xwe nivîsîne û ewana gele qîmetlî ne. Bi saya vê yekê ye wekî oçêrkê wîye derheqa kurda û ezdya da heta îro jî ji alîê kurdzana da têne xebatê çawa xebatê kêrhatî, dewlemend û layîqî bawarbûnê. Belê, qinyat û fikirê wî şikberîê pêş da naynin û berê pêşin bona wê yekê, ku Abovyan zanyarekî helal û rast bûye, xweyê îsafa ulmdarîêye qenc. Ewî ce'dandye bona pêyîhatîê xwe gilî-gotinê rast bihêle û lema jî lênihêrandinê xwe bi hûrgilî û heralî derbaz kirye. Bi vê fikirê heweska re tarîqa berevkirina qinyatê oçêrkê kurdzanîê û nivîsara wan ji alîê Abovyan da. Lê berî kivşkirina wê tarîqê em lazim hesav dikin dereceke usa bidine kifşê, kîjan gele ferz e seba nîşandayîna sifetê Abovyan, çawa meriv, fikirdar-ulmdarê tam.

Lênihêrandinê xebatê rêwîê Avropaê-xebatçîê dîplomatîê û eskerîê-casûsîê, ê dereca malhebûnîê-kirîn frotanê, mîsîonêra û lo hela gelek ulmdaraye pirsale em anîne ser wê fikirê, wekî ewana bi ruhê kolonîzatorîê hatine nivîsarê. Wekîlê Avropaê timê angorî kara xewletê xwe cim'etê Rohilatê nihêrine û ew qîmet kirine. Dewlêtêd Avropaê dixwestin welatêd Rohilata Nêzik û Orte bikine bin destê xwe, tabîê xweye kolonîzatorîê wira mehkem kin. Bona vî meremî ewana dixwestin cim'eta kurda, nerazîbûna wêye heqîê hindava dewletê Tûrkîaê û Îranê seva vê kara xwe bidine xebatê.

Xen ji wê, bona wan wekîlê dewletê Roavaê kurd miletekî xerîb î nenas bû û ewana nasya xwe hîmlî ser rya dida wana, kîderê diha zef cerd û cerdbaşî digeryan. Hema bi serî wan jî ewana carna temamyê cim'eta kurda qîmet dikirin.

Wekîlê Roavaê cim'etê Rohilatê û wan ra tevayî kurd bendî tiştêkî hesav nedikirin, jor da wana dinhêrîn, çawa miletê paşdamayî, nezan kêmaqil. Xazma paê rêwîê Angliâêye pirê kurd hesav kirine çawa qaçax, diz, cerde. Lêma jî ewana îtbara xwe bi kurda neanye. Rûê vê yekê dane, wekî kurda jî bi şikberî wana nihêrine û bi ruhê xwe tê derxistine, wekî ewana xêrê ra naên welatê wana.

(Dewama wê heye)

Transkrîpsiyona ji tîpên krîlî bo tîpên latînî:
Ahmet Cantekin

Bêbextî

Mihemed Dehsiwar

Q edera min e, çi bêjim bêfeyde ye. Tiştên ku bi serê min ve hatine û hê jî tên, bira neyên serê dijminan. Ruhê dost û haziran sax be, lê ne ku ez nexweş im û ketime rewşeke xerab. Derd û kulê min ne xizantî û bêperetî ye jî. Ez bi serê dostên xwe sond dixum ku derdê min ne malê dinyayê an jî xweşiya jiyane ye. Derdê min ne ev tişt in. Derdê min li hember bêbextî û bextreşiyên ku felekê bi serê min ve aniye; dostanî û ciwamêrî ye, hevaltî û hevalbendî ye.

Berê dost û hevalên min gelek bûn. Em li cem hev rûdiniştin û me kêf û henekan dikir, ji xweşiyên jiyane rojên xweş werdigirt. Em bi hev re digeriyan û di vê cîhana xweş de ku salixên wê bi gotinên ser kaxez nayên ziman, me rojên xweş û kesnedîtî derbas dikirin. Dost û heval roj bi roj li yê min ên kevn zêde dibûn û derdora min şên dibû. Ez bi kur ve diçûm qedr û qîmeta min, şeref û heysiyeta min hebû; herkesê ku min nas dikir, ez dawetî ser maseya xwe dikirim an jî ez diezimandim mala xwe. Ez dibirim cîhên xweş û jiyantijî. Em heta ber bi şefeqan diketin kêf û henekan û şev û rojên min bi vî awayî xweş û tijî derbas dibûn.

Xweşî û nametên cîhanê ez kiribûm yekî din, hêviyên min zêde bûbûn, baweriya min bi min û bi derdora min bêtir dihat. Dilê min li jiyane xweş bû, ez dilşad bûm. Derd û kulên jiyane, xeter û nakokiyên wê hatibûn jibîrkin. Bihara jiyana min ji nû ve dest pê dikir. Bêyî ku ez hay ji zikreşî û bêbextiyên felekê hebim min jiyana xwe didomand.

Lê îro? Îro ez bûme pepûkekî reben û ji civatê re bêfeyde. Îro ez bêkes û bêdost û bêheval mame. Qey ez ê vî halî bûm? Ji xweşî û şahiyên jiyane, ji dost û hevalan dûr, bi tena serê xwe mame. Dost û hevalên min ên berê xwe ji ber

min dane alî, mey û şerab ketiye dewsa wan. Çar aliyên min bi şûşeyên şeraban tije bûne. Ne xîret dikim wan bavêjim û ne jî bi hişê xwe ve tîm ku derdora xwe bidim hev û odeya xwe ya biçûk paqij bikim.

Di çîlsaliya xwe de bûme kalekî bi qirêj û gemarî. Rîhê min zêdeyî bihostekê dirêj bûye, çavên min di kûr de çûne, hestiyên min di îşlikê min î qirêjê de dixuyên. Ez bûme mîna guliyê dareke zirav û dirêj ku pelên xwe weşandine. Ew mirovê ciwan î bejndirêj ketiye halekî mirinê. Xortê bedew û jiyantijî şûna xwe daye serxweşekî bêhêvî û tim di xew de. Hey feleka xayîn! Ma ez ê vê rewşê bûm? Kî bawer dikir ku ez dê bikevim van halan? Kî bawer dikir ku Mîrzeyê jîr û aqilmend, bibê serxweşê sûka Entabê û ji bo qedehek an jî şûşeyeke şerabê, destê xwe li ber xelqê veke û gerokiyê bike? Kî texmîn dikir ku mamostayê jîr ê wêjeya kurdî têkeve rewşeke wiha?

Heke ev qedera min be, min tu gotin tune ne. Ger min tiştêkî gelek xerab û kesnedîtî kiribe, tu bersîva min tune ye. Ez dengê xwe jî nakim. Heger min li kesî neheqî kiribe, zerar dabe mirovan û mirovantiyê, ev cezayê min e. Ez pê razî me.

Lê na. Ne yek ji van e jî ku ez xistime vî halî. Felek e; feleka xayîn û bêbext e. Çi bêjim, îro bêbextiyê li min keys aniye û ez kirime serxweşekî "dervayî civatê". Bêkes, bêdost û bêheval ...

Felekê li min keys anî û ez har û dîn kirim, berê min da riyêke xerab û dirêj ku ez nikarim xwe jê rizgar bikim. Taqeta min bi dawî anî, bask û qidûmê min şikand û ez kirim mîna teyrekî kor û baskşikestî.

Çi bû wê rojê bû. Tiştê ku bi serê min ve hat, wê roja bi eyan qewimî. Ew roj bû ku ez ji wargehê mirovantiyê bidûr xistim, ez kirim mirovekî keserkûr û xwedîxem. Ez Mîrzeyê aram û qedirbilind, hoste û mamosta, mirovê rojên giran û egîd, zana û bedew di rojekê de ketim rewşeke tîkel û bêteswîr. Hêviyên min, bîr û baweriyên min bi carekê ji dinyayê şikestin, ez bûm mirovekî bêpejn û bêruh.

Belê, çî bû wê rojê bû. Rojêke eyan. Roja rapêçandina hêviyên jiyane. Roja ragihandina xeberên nexweş. Heyama jî çaxekî derbasbûyina çaxekî din; du çaxên mîna reş û sipî ji hev cuda û ji hev dûr. Her ew roj bû ku ez xistim vî halî. Guhertin? Na. Êdî zor e. Guhertina tarîxê çawa zor be, guhertina rewşa min jî wisa zor e. Derman? Derman heye yan jî tune ye, tu biryar bide. Herçî gotina wê ne hêsan be jî, ez dê li gora taqeta xwe serpehatiya xwe bînim ziman. Belkî tu ji min rebenê hêvîşikestî û keserkûr re dermanekî bibînî.

Belê, her ew roj bû. Roja bêbextî û heyama reş û tarî... Her ew dem bû ku rojê li min tarî û zilûmat kir. Ez ji nav dost û hevalên min, şagird û xwendegeha min avêtim nav heyameke bêserûbin, avêtim der û kuçên kesnedîtî, berdama dinyaya bêbinî. Ez bûm êmê lawir, qertel û masiyan; di nav mirovan de bûm

mirovekî kovî.

Ez serê te zêde neêşînim û dilê te bi xwe neşewitînim. Çawa hebe tu dê pê bihisî. Lewra jî min got ku tu ji min bibihîzî çêtir e. Dema ku tu serpêhatiya min û rewşa min ji devê min bibihîzî, dibe ku tu rastiye bibînî û dilê te bi min bişewite. Heye ku tu bawer bikî, heye ku tu nekî; dibe ku hinek bêjin rast e, hinek jî bêjin derew e. Teqdîr û biryar ya te ye.

Ez Mîrzeyê kurê Sîno, navê diya min Zeynê ye. Xwedê ez çil sal berê li bajarekî Serhedê dame. Piştî xwendina bingehîn, navîn û lîseyê min li Diyarbekirê xwendegeha bilind a mamostatiyê qedand. Şikir ji Yezdanê dilovan re çend sal şûnde welatê me rizgar bû û gelê me gihîşt azadiya xwe. Ji ber ku ez mamostayê edebiyatê bûm û berî rizgariyê bi karê nivîsa kurdî ve jî mijûl dibûm, piştî rizgariyê jî min ev karê xwe, lê xwerû bi kurdî domand. Di dawiya herdu salên mecbûrî ku min li Hezexê mamostatî kir, tayîna min derkete Diyarbekirê, xwendegeha Celadet Bedirxan a ku berî rizgariyê jê re "Ziya Gökalp Lisesi" digotin.

Kêf kêfa min bû, şûr simbêlê min nedibirî. Tayîna min derketibû paytexta teze û di ser de jî xwendegeha Celadet Bedirxan. Bedirxan ku yek ji wan hîmdarê elfabe û edebiyata kurdî ye. Min dê êdî li serbajarê kurdan dersa edebiyatê bida. Ez gelek dilşad û bextiyar bûbûm. Tevî vê jî dilê min bi bajarê min î kevn ve, bi şagird û hevalên min ve mabû. Şagirt û mamostayên hevalên min -digel ku nedixwestin ez ji wir biçim jî- ez bi dilxweşî û bi kêf ji bajarê xwe bi oxir bi rê kiribûm.

Roja pêşîn midûrê xwendegehê Newzatê Smaîl ez bi mamostayan dam nasîn. Dema ku ez çûm sinifa xwe ya nû, bi min re kete sinifê û ez bi şagirdan re tenê hiştim. Ez, mîna şagirdêkî nû ku hê dest bi xwendegehê bike, pirr biheyecan û bikêf bûm. Şagirtên sinifa min a yekem ji 45 kesan pêk dihatin. Ji wan jî 12 kes keçik bûn. Min jî xwe bi wan da naskirin û dest bi behsa girîngiya edebiyatê, ders û zimanê qedîm, bi kurta yî behsa edebiyata kevn a berî rizgariyê kir:

-Edebiyat an jî wêje zimanê evînê ye, zimanê dilê mirov e. Mirov bi wê hîssên xwe, derd û kederên xwe an jî evîna xwe ya ji bo mirovan, xwezayê, dost û hevaltîyê û tiştên din tîne ziman an jî dixwîne. Şaîr û nivîskarên edebiyatê, ziman û dilên civaka me ne, bi civakê re dijîn û derd û xweşiyên wê dinivîsin.

Şagirt di dawiya dersê de, dilşad û bi raman ji dersxaneyê derketin. Lê yên ku herî baş guhên xwe dabûn gotinên min û bi edebiyatê re eleqedar bûbûn, pênc kes bûn. Van pênc kesan ku carna ji min pirs kiribûn û xwestibûn zanebûna xwe di edebiyatê de bêtir bikin, roja pêşî bala min kişandibûn. Ya herî balkêş jî ew bû ku keçeke bedew jî di nav van ciwanan de hebû. Ez jî bi kêfxweşî û dilşad ji dersxaneyê derketim û derbasî odeya mamostayan bûm.

Wekîla midûrê xwendegehê Derya xatûn hat li kêleka min rûnişt û rewşa xwendegehê û şagirdan ji min pirsî. Ji ber ku roja pêşîn bû, min nexwest bersîveke sererast bidim wê. Tevî vê jî min jê re got ku ez gelek dilşad û hêvîdar bûm. Wê devê xwe anî ber guhê min û bi dengê nizam got:

-Zêde xwe bi wê sinifa ku îro tu ketibûyê re neêşîne û guh nede wan. Ew sinif sinifa tiral û şemûzên dibîstanê ye. Her roj şer dîkin û teşqeleyan derdixin. Ji xwe ku ji min bipirsîyana, min dê gişan ji mektebê biqewiranda.

Gotinên wê bi min xweş nehatibûn, lê dîsa jî min dengê xwe nekir. Roja min a yekem bû û hê di roja pêşîn de min nedixwest bi îdarekirên xwendegehê re têkevim nakokîyan. Piştî ku babeta şagirdan tamam bû, dest bi pirsên di derheqê şexsê min de kir. Ez tenê bûm? Erê. Li bajêr nasekî min hebû? Na. Mala min hebû? Na, lê ez niha li pansiyonekê dimam heta ku min ji xwe re cîhekî din bidest xista. Gelek ji pirsên jorîn ecêb û bêsebeb bûn. Bersîvên min jî mîna pirsên wê bûn: na, erê, belê, nexêr...

* * *

Di xwendegehê de ez diçûm tevahiya dersên edebiyatê. Di heftiyê de 40 seet dersên min hebûn ku li 16 sinifên danê şefeqê û danê êvarê par ve dibûn. Herçiqas ez ji pirrbûna dersan diwestiyam û ji halê xwe diketim jî, min guh nedidayê. Mîna ku ku mirov av bide gulan û bi dilşahî wan xwedî bike, min jî edebiyat û xweşiyên wê dixist jiyana şagirdên xwe. Lewra jî ez dilşad û bextiyar bûm. Westîna min, bi pirsên şagirdan û balkêşîya wan a li ser edebiyatê dihat jibîrkirin. Em bi hev re diketin kûrahiya cîhana edebiyatê û tê de wenda dibûn.

Gelek caran piştî dema xwendegehê jî em diketin nîqaşan û civînên bi vî awayî gelek dirêj dom dikirin. Bi taybetî jî hinek ji şagirdên min ên sinifa "şerûd" ku Derya xatûnê behsa wan ji min re kiribû, dihatin mala min, pirsên xwe dipirsîn û digel vê dîtînen xwe jî diyar dikirin. Edebiyat ji wan re bûbû cîhaneke nû û ketibû xwîn û mejûyê wan.

Piştî ku çend meh di ser hatina min de derbas bû, rojekê pênc heb ji şagirdên min hatin cem min û xwestin bi min re xeber din. Ez hinek ketim şikan, lê min di madê xwe de dernexist. Gelo tişteke bûbû yan jî serê wan ketibû belayê? Na, kêfa wan li cî bû û ji heyecanê gotinên xwe di nîvî de dihiştin. Dawiyê min ji wan fêhm kir ku dixwazin kovareke edebî biweşînin û ji bo wê jî ji min alîkarî dixwestin. Ez gelek kêfxweş bûm, ger ne ji şermê bûna ez dê bigiriyama. Lê min di rewşa xwe de dernexist. Çend kovarên ku min dabûn wan, xwendibûn û ji wan pîrr hez kiribûn. Di bin tesîra wan de mabûn û niha jî dixwestin ku ji bo xwendegehê kovarekê biweşînin.

Ez hinekî ketim ramanên kûr. Xortaniya min hat bîra min. Min dizanibû

ku derxistina kovarekê çiqas zor bû. Ji bo wê gelek tişt diviyan; bawerî û zanebûn pêwîst bû, pere lazim bûn. Min ne dixwest kêf û baweriya wan bi carekê re bişkênim, lê îdareyê jî bi taybetî ev sinif xistibû ber reçavan û hêviyên alîkariyê jî ne zêde bûn. Min bi zimanekî xweş zoriyên wê gotin û pêwîstiya alîkariya hinek kesên din jî anî bîra wan. Lê wan hîn jî li ser fikrên xwe rik dikirin û bi eşq mîsal didan. Di dawiyê de bi şertê ku ji hinek sinifên din çend kesên din jî bigihînin xwe, min sozê ku ez dê bi berpirsiyarên xwendeghê re xeber dim, da wan.

Piştî demekê tevî ku ji hinek sinifên din jî çend ciwan beşdarî vê komikê bûbûn, pêşniyara min ne kete serê îdareyê û wekîla midûr Derya xatûnê. Li gorî fikrên wê, xebateke wiha pêwîst nedikir û gelek jî buha bû. Her wiha dê ciwanan piştî çend rojan biwestiyana û karê xwe di nivî de bihiştana. Ez bi gotinên wê îqna nebûm û bi midûr re ketim peywendiyê, lê mixabin bersîva wî jî her ew bû. Di nava mamostayan de jî piştgiriyeke xurt peyda nebû.

Çaxê ku min dîtînen îdareyê ji şagirdan re gotin, bêdengiyê dirêj kete nav wan. Li gorî baweriya min, heke îdareyê destûr nedana, biserketina karekî wiha zor bû. Lê meriv dikaribû hinekî din jî serê xwe li ser biêşanda û li riyên din bigeriya. Şagirdên min bêdeng û hêvîşikestî ji dewsa xwe rabûn û ji odeyê derketin.

Min wisa dizanibû ku êdî ev mesele bi vî awayî hatiye girtin. Roj li pey rojan diçûn û wext ber bi dawiya nîvsala xwandinê ve dikişiya. Çend hefte berî dawiya nîvsalê sê şagirdên min hatin cem min û dîsa xwestin bi min re xeber din. Min texmîn dikir ku dê li ser notên xwe an jî li ser edebiyatê pirsan bikin, lê babet dîsa jî karê kovarekê bû.

Bi eşq û kêf ji min re behsa xebata xwe dikirin. Her yekê ji hêlekê ve xeber dida; tiştê ku min ji wan fêhm kir, ji bo çapkirina kovarekê hinekî pere civandibûn. Min ew dan sekinandin û xwest rewşê ji devekî fêr bibim. Azad ku di edebiyatê de gelek jîr bû, rewşê ji min re got. Neh ciwan li nav hevalên xwe geriyabûn û gelek abone peyda kiribûn. Pereyên abonetiye jî pêşîn weke alîkarî wergirtibûn. Her wiha ji dê û bavên xwe û ji derdora xwe jî pere dabûn hev. Li gorî hesabê ku kiribûn, ji niha ve dikaribûn sê-çar hejmaran biweşînin. Piştî wê? Piştî wê jî Xwedê mezin bû. Dê tev mal bi mal, dikan bi dikan bigeriyana û tevahiya kovaran bifirota.

Ez ji vê şewqa wan re heyirî mam. Dîsa xortaniya min hat bîra min.

Ez di xeyalên xwe de kûr çûbûm lê bi dengê yekî ji wan bi hişê xwe ve hatim.

-Mamoste tu çi dibêjî, tu dê alîkariya me bikî?

Min devliken berê xwe da wan, ez hinek fikirîm û min bersîva wan da:

-Belê, êdî em dikarin dest bi karê xwe bikin. Ez dê di karê kompîturê de alîkariya we bikim da ku hun jî fêr bibin. Ji niha û pê ve, kompîtur û lasera

min ji karê we re amade ne. Hun nivîsên xwse bidin ser hev û pişt re werin em dest bi kar bikin.

Her sê xortan bi kêf destên min guvaştin û ji cem min rabûn. Ji bo wan jiyaneke nû, jiyaneke bi xêr û ber dest pê dikir. Ez jî bi wan re ji nû ve ketibûm dema xortaniya xwe, şewqa xebatê ketibû hişê min û ez dilşad bûbûm.

Min texmîn dikir ku dê îdareya xwendegehê ji vê xebatê aciz bibe û li xwe nexweş bîne. Her wiha min texmîn dikir ku ger tiştêk biqewime dê min sûcdar bikin, lê tevî vê jî min biryara xwe dabû û vegeer tune bû. Min nikaribû ji van ciwanên dilpak û xîretkêş re bigota "na". Ev ne li gora bawerî û tebîeta min bû jî.

Çend roj pişt re xortên me tevî nivîsên xwe hatin mala min a ku min hê nû raxistibû. Mala min a ku min du meh berê kirê kiribû, ji odeyeke razanê û salona mêvanan pêk dihat. Salon an jî odeya mêvanan çar mêtreyê fereh û pênc mêtreyê jî dirêj bû. Du dolabên pirtûkan li her du aliyên dîwêr, tije pirtûk bûn. Kompîter di quncikê odeyê de li ser maseyeke biçûk bû û makîneya nivîsê jî li kêleka wê bû.

Ez û şagird li ber kompîturê, li ser kursiyan rûniştin û me dest bi darsa kompîturê û bikaranîna wê kir. Ew roja me bi vî awayî derbas bû. Şagirtan notên xwe nivîsandin û yek bi yek li ser kompîturê xebitîn.

Berî ku rabin, min ji wan re pêşniyar kir ku ji bo xebata kovarê di nav xwe de kar par ve bikin. Dê bi vî awayî him kar çêtir bimeşiya û him jî hêsantir bibûya. Pêwist bû ku yekî berpirsiyariya kovarê û yekî din jî redaktoriya wê bigirta ser xwe. Yekî din jî karê mîzanpajê bigirta ser xwe û yên mayîn jî dê di karê redaksiyonê de kar bikin. Ji bo destpêkê ez amade bûm ku nivîsan ji hêla gramerî û rastnivîsînê ve kontrol bikim û di vî awayî de daxwaz û pêşniyarên xwe diyar bikim.

Roja din, piştî darsan, ji şagirdan du xort û keçek hatin malê da ku dest bi karê xwe bikin. Her sê ji bo birêvebirina kovarê hatibûn hilbijartin, lê ji bo kar li hev parvekirinê negihîştibûn encamekê. Bi taybetî jî li ser berpirsiyariya wê li hev nekiribûn. Her du xortan rê nedidan hev da ku yek ji wan bibe berpirsiyar. Her yekî xwe pêşniyar dikir, lê ji keçikê deng dernediket.

Min fêm kir ku dê nîqaşa her du xortan zêde dom bike. Ji ber wê jî min ew derxistin derve û fikrê xwe pêşniyar kir. Madem ku her duyan li hev nedikirin, bira rê bidana ku Rewşenê kar bida ser milên xwe. Her duyan jî karên redaktoriyê û mîzanpajê di nav hev de parve dikirin û mesele hel dibû. Bi raman li min mêze kirin; xuya bû ku ne lihêviya tiştêkî wiha bûn. Min wisa fêm kir ku berpirsiyariya keçekê li zora wan diçû. Lê ji bilî vê jî tu riyên din tune bûn. Bêçare herduyan vê pêşniyarê qebûl kirin.

Çaxê ku Rewşenê pêşniyara wan guhdarî kir, şaş ma. Rûyê wê sor bû û

gotin ji devê wê derneketin. Dawî wê jî rewş fêm kir û bêçare wezîfe qebûl kir. Azad bû redaktor û Hêvî jî bû berpirsiyarê mîzanpajê.

Her sê ciwanan dest bi xebata xwe kirin. Ji min re tiştêkî eşkere negotin, lê ji leza wan min fêm kir ku dixwestin hejmara yekem bigihînin berî xelasbûna termînê. Bi vê texmînê min jî giraniya xwe da ser nivîsandinê û rastkirina nivîsan. Piştî xebateke çend şevên bêxew, kovar ji bo çapê amade bû. Du roj berî dawîya termînê kovar ji çapê derket û bidest gihîşt aboneyan, şagirdan û kesên din.

Şagirdên min pîrr bi kêf bûn. Xebata şevên bêxew berhema xwe dabû, kovara şagirdan "Kaniya Dilan" derketibû û amadekarên wê bi serbilindî, kovarê bela dikirin. Şagirtan sernivîsa kovarê ji min re hiştibûn. Min jî di vê nivîsê de pesnê xebat û keftelefa wan, pesnê girîngiya kovareke wiha ku giraniya wê li ser edebiyatê çêdibû, dabû û girîngiya edebiyatê nivîsandibû.

Mamostayan û îdareya xwendegêhê, li weşandina kovarê şaş mabûn. Şaş mabûn ka kovar bi alîkariya kê û bi çi awayî derketibû. Diravên heqê çapxaneyê ji ku peyda kiribûn? Şika tevan ketibû ser min; herekesî bawer dikir ku min weşana kovarê û mesrefên wê dabû ser milên xwe. Lê ji hêla din ve "Kaniya Dilan" di nav şagirdan de cîhekî vala dagirtibû û jê hatibû hezkirin. Ew bi kêf dihat xwendin û li ser nivîsên wê nîqaşên dirêj çêdibûn. Piraniya mamostayan jî bi heyranî ew dixwendin û piştgiriya xwe diyar dikirin.

Di civîna dawî ya mamostayan de midûrê xwendegêhê bi şiklekî dilmayî, ji bo karekî wiha sipasî min kir û hinekî jî pesnê min da. Çaxê ku dora axaftinê hat ser min, min rewşa kar û xebata kovarê û derketina wê bi kurtayî ji wan re got û sipasî wan ciwanên ku vê berhemê derxistibûn, kir. Min tenê rê nîşanî wan dabû û di rastnivîsînê de alîkariya wan kiribû.

Piştî civînê, Derya xatûn hat li ser sendeliyê kêleka min rûnişt û bi serê xwe bi bişirîn silav da min. Bi milê xwe bi hêdîka milê min miz dida û di ber de jî xeber dida. Xwedêgiravî ciwanan gelek ji min hez dikirin, mamostayan û îdareya xwendegêhê ji ber xebata min qedr û hurmeta min digirtin. Ew bi xwe jî weke wekîla midûr bi min serbilind bû û bi vî awayî dixwest vê serkeftina min bi awayekî taybetî pîroz bike. Piştî ku bi vî awayî pesnê min da, ez dawetî mala xwe kirim da ku em vê serkeftinê pîroz bikin û hev bêtir nas bikin.

Li gorî ku min bihîstibû ew jineke jinebî bû û zarokên wê jî tune bûn. Lê weke du mamostayan, di hevdudîtin û sohbetake bi vî awayî de tu xerabî tunebû û lewra jî min vexwendinê qebûl kir. Çend car berê jî ez û çend mamostayên din bi hev re derketibûn û geriyabûn. Heta niha jî tu kesan tiştêkî nebiribû ber dilên xwe.

Lewre jî ez ji xeterên dinyayê bêxeber, çûm mala wê. Min dê çawa zanibûna

ku dê ev ziyaret bibe dawiya jiyana min a normal? Min dê çawa zanibûna ku wê bêbextiyeke wisa kesnedîtî were serê min? Gotineke pêşiyên me heye; dibêjin "xwediyê mirî kor e". Ez jî ji vê bêbextiya ku bi serê merivan ve tê bidûrketî û nehaydar, bûm mêvanê Derya xatûnê.

Xatûnê -êdî ez dil nakim ku navê wê bibêjim- cilekî pîrr sipehî û hinekî jî vekirî li xwe kiribû. Porê xwe yê dirêj berdabû ser milên xwe, çav û birûyên xwe bi mûçingê edilandibûn û rûyê xwe bi boyaxê delal kiribû. Bêhna parfûmê ji wê û hundurê xênî dihat. Çaxê ku derî ji min re vekir, mîna ku xwazgînê wê hatibe mala wê, bi kenekî şermok ez dawetî nav malê kirim. Wê heyamê hinek şik di dilê min de derbas bûn, lê min dîsa fikra qenc neqand. Jîn nê tenê ji bo mêran xwe delal û sipehî dikin. Her çiqas xwe edilandina jinan hinekî zêde û carna bêusûl be jî, êdî ev bûye adeteke jiyânê û mêt jî mecbûr in ku van şertên wan qebûl bikin. Herwiha mêt ji gelek caran xwe xweşik dikin; rihên xwe diqusînin, porê xwe şeh dikin û bêhna xweş bi xwe ve dadikin. Ji ber wê jî ne pêwîst bû ku wê tenê ji bo min xwe edilandibe. Ev bûye adeteke mirovantî û jiyânê. Wekî din jî tu xeter tê de tune ne.

Me xwarin xwar û di ber de jî şeraba sor a Entabê vexwar. Min dixwest ku em li ser dibistanê, pîrs û pîrsgirêkên wê û li ser rewşa şagirdan xeber bidin. Lê wê dixwest bala min bikşîne ser xwe û pîrsên şexsî ji min dipîrsî. Min dixwest ku em li ser edebiyatê û pêşkeftinên wê xeberdin, lê wê behsa tenêbûna xwe û rewşa xwe ya taybetî dikir. Min dixwest ku em weke dost û heval bimînin, lê wê dixwest ku min bibe ser cihê razanê.

Dawiyê hat li ser çokên min rûnişt û lêvên min maçî kirin. Ne ku min ji jinan hez nedikir û kêfa min ji wan re nedihat, lê Derya xatûn li ber çavên min ne weke jinekê bû; ew hevpîşeya min bû û min dixwest têkiliyên me bi vî awayî bimînin. Him jî ez wê gavê ji têkiliyeke wiha re ne amade bûm.

Min bi hêdîka ew ji ser çokên xwe rakir, destê xwe danî ser milên wê û jê re

got:

-Derya xatûn, li min bibûre lê ez niha ji têkiliyeke wiha re ne amade me. Em hevpîşeyên hev in û bira têkiliyên me wiha jî bimînin.

Xatûn şaş ma û di cihê xwe de sar bû. Di nav odeya mêvanan de demekê çû û hat û pişt re berê xwe da min:

-Ez xuşûşiyên te fêhm dikim. Belkî têkiliyên te yên berê te gelek êşandibin, lê dê rewşa me ne wiha be. Ez dê te bextiyar bikim.

Min çakêtê xwe, bêyî ku guhdariya wê bikim, avêtibû ser milên xwe. Milekî min di çakêt de, yê din li derva bû û ez nêzî derî bûbûm. Hat nêzî min û dîsa xwe avêt himêza min:

-Qurbana te tu neçî! Bisekine ku em bêtir hevdu nas bikin û ji hev hez bikin.

Min bi hêdîka wê ji xwe dûr kir û bersîva wê da:

-Tu fêm nakî ez çi dibêjim? Di nav me de tişteki wisa nabe!

-Tu çawa zilam î! Tu dê ji min hez nekî, ji kê hez bikî?

-Ez te baş nas nakim, çawa dikarim ji te hez bikim?

-Ger tu ji min pirr hez nekî jî ez razî me; heyrana te me neçe. Vegere û bibe dostê min.

-Nabe! Tu xwedî şexsiyet î, bi şexsiyeta xwe neleyze.

Çaxê ku xatûnê fêm kir ku ez xwe bi destên wê ve bernadim, pirr aciz bû. Çavên wê sor bûn, bêhna wê bi zor derdiket. Rahîşt her du ferên solên min û avêtin ser û rûyê min.

-Here, here bi zarokan re û bi şagirdên xwe re bileyze! Ez dizanim armanc û daxwazên te çi ne. Tu wisa dizanî ku ez pîr û qert bûme, lê bi dehan zilamên weke te û ji te çêtir, her roj li ber min digerin.

Hinek bêhna xwe derxist û dîsa devê xwe vekir:

-Ger ez jî te di vê dinyayê de rûreş nekim, bira ji min re jî Derya Xatûn nebêjin! Ez dê vî bajarî ji te re bikim zîndan! Tu here bi şagirdên xwe yî temenbiçûk re bileyze! Ez dê mala te bidim şewitandin!

Ez şaş, perîşan û bêçare ji hundur derketim. Min nizanibû ku çi bikim û bi ku ve herim. Lew ez şoke bûbûm. Ez di zaboqan de bêhiş û bêserî dimeşiyam. Mejûyê min êdî nedîşuxulî, serê min ji binî sekinîbû. Lingên min ez bêhemdî birim ber hewşa xwendegehê. Wê hingê ez bi xwe hisiyam ku ez çiqas westiyame. Ez li ser texteyekî, li kêleka hewşa xwendegehê rûniştim û min pala xwe da dîwarê hewşê. Bûyer deqe bi deqe, mîna şerîda filimekî kevn di serê min de derbas bû. Min nexwest bawer bikim. Çawa tişteki wiha bi serê min ve hatibû? Û di demeke wiha nazik de.

Min çixareyekê pêxist, çend hilm jê kişand û rabûm ser piyan. Êdî dema çûyina malê bû. Min xwe bîlez avêt malê, dest û rûyên xwe şûst û xwe li ser texteyê razanê dirêj kir. Min çavên xwe girtin ku razê, lê xew dikeve çavên kê? Heta berê şefeqê, min xwe li herdu aliyên bir û anî. Ber bi banga sibê re çavên min zexel bûn û ez bi zor ketim xewê. Min di xewna xwe de jî xewnên ecêb û xerab dîtî. Li dora min mar û dûpişk digeriyan, gur û kûçik dihewtiyan û lawiran didan pey min. Ez her demekê û carekê ji xew diveciniqîm û di nav xwîdanê de ji xew şiyar dibûm.

Roja din xelaseka termînê bû; ez westiyayî, bêxew û bi halekî perîşan çûm xwendegehê. Xatûn hê nehatibû. Min wisa bawer kir ku bi ber xwe ketiye û lewra nehatiye. Ji ber ku min nedixwest wê bibînim, kêfa min hinekî hat.

Piştî nîvro du polîsên sîvîl hatibûn xwendegehê û ji midûr pirsî min kiribûn. Midûr matmayî hat cem min û rewşê ji min re got. Min jî ecêbmayî da pey wî, ew li pêş ez jî li paş, em çûn odeya wî. Yek ji polîsan navê min ji

min pirsî, min navê xwe jê re got. Yê din li kaxezê xwe nihêrt û berê xwe da min.

-Divê ku tu bi me re werî qereqolê, di derheqa te de giliyek heye.

-Giliyê çi! Kê giliyê min kiriye, çi qewimiye?

Yekî ji wan, pêşî berê xwe da midûr û pişt re li min nihêrt:

-Em dê li qereqolê ji te re bêjin. De kerem ke em herin.

Bi çavên heyirî min li midûr nihêrt û da pey wan. Midûr jî weke ku haya wî ji meseleyê tune be, milê xwe bi aliyekî ve xwar kir û serê xwe bêmane û matmayî bi aliyê din ve xwar kir. Di korîdora xwendegehê de, şagirdan ez bi du zilamên nenas re dîtîm û ew jî şaş man, di bin çavan de li me nihêrtin. Em li otomobîla wan siwar bûn û wê em ber bi qereqolê ve birin.

Paşê ji min re gotin ku xatûnê giliyê min kiriye. Xwedêgiravî ez bêdawet çûbûm mala wê û min doza namûsê lê kiribû. Çaxê ku wê xwe bi destên min ve bernedabû, min lê xistibû û cilên wê seranser ji hev çirandibûn. Laşê wê ji ber lêdanê, di nav birînan de mabû. Wê bi zor xwe ji destên min filitandibû.

Min jî ji polis re bûyerê ji serî heta dawî got û bêsûciya xwe îzeh kir. Min xwest bi sond û eman polîsan bidim bawerkirin ku destên min bi wê nebûbûn û heta ez ji mala wê derketibûm jî ne cilên wê çiriyayî bûn û ne jî laşê wê bi birîn bû. Min dixwest bi wan bidim zanîn ku ez bi zor ji destên wê rizgar bûbûm û ji ber xeberên wê jî xew bi çavên min neketibû.

Tu hey bêje. Polîsan tenê serî dihejandin. Xuya bû ku min derdê xwe ji dîwêr re digot. Xatûnê ne tenê ev tişt xistibûn stûyê min, herwiha li gorî wê min çavê xwe berdabû keçikên biçûkên xwendegehê jî. Qaşo min hinek ji wan bi gotinên xweş û diyariyên buha dixapandin û carna jî ew dibirin mala xwe. Yek ji wan a ku gelek caran dihat mala min jî Rewşenê bû.

Min dê ji vê bextreşiyê re çi bigota? Wekîla midûr a xwendegeheke binav û deng ku bi qedr û qîmet bû, tevî cilên çirandî û birînan çûbû cem polis û giliyê min kiribû. Li hember kesê wisa payebilind, gotinên min çend pere dikirin? Min digot û nedigot, tu kesî guhdariya min nedikir. Ez xerîbê bajêr û gelê bajêr bûm; ji şagirdên min, hinek mamostayan û çend cîranan pê ve, kesî ez nas nedikirim. Polîsekî dixwest ji gotinên min bawer bike, lê yê din guh neda wî. Gilî ji cihekî mezin hatibû û mesele mezin bû. Midûr jî pê hisiyabû û li wekîla xwe xwedî derdiket. Îdareyê tev berê xwe dabû min û dijminiya min dikir, ez dê çawa dîn nebûma!

Ji ber ku min berê tu "sûc" nekiribû, polîsan ez neşandim hepsê. Dê dadgehê li ser "sûcê" min biryar bidaya. Heta biryara dadgehê êşkere bibe jî ez ji kar avêtim. Ji ber ku "sûc" giran bû, li ser daxwaza sawcî ez dê di vê navberê de bê meaş bimama. Ez bûm mîna masiyekî di çemekî ziwa de. Dest û lingên min şikestin, ez bêtaqet mam û ji halê xwe ketim. Heta niha tiştêkî

wiha bi serê min ve nehatibû. Min emsalê bêbextî û bextreşiyêke wiha nedîtibû û sah nekiribû. Dibe ku kesek ketibe rewşeke wiha? Ez nizamim. Tiştê ku ez dizanim û fêhm dikim, bêbextiyêke wiha nehatibû serê tu kesî.

Ez serê te zêde neêşînim. Mahkemeya me nêzî şeş mehan dom kir. Piştî guhdarîkirina şahid û awûqatan "sûc" li ser min îsbat nebû. Ez êdî serbest bûm, lê karê min ji min sitendibûn. Xwendegêhê kar nedida min. Ji ber ku îdareya xwendegêhê tu referens nedabû min, min nikaribû li cîhekî din jî karê mamostatiyê bikira.

Min di vê navberê de li çend cihên cuda kar kir da ku heqê kirêya xwe bidim. Bavê Azad ku kêfa wî ji ber guherîna kurê xwe gelek ji min re hatibû, bi rewşa min hisiyabû û di otêla xwe de odeyêkê û karê hesabê otêlê dabû min. Li gorî wî, ji mamostayekî weke min re karê ber destan ne caîz bû. Di bûyera ku di serê min de derbas bûbû de jî fikrên wî eşkere bûn.

Hinek ji şagirdên min, bi taybetî jî Azad, Hêvî û çend hevalên wan rewşa min pirs dikirin. Rewşenê ji şerman, ji bilî carekê li halê min nepirsî. Lê di dadgehê de tevî piraniya hevalên xwe, li dijî gotinên xatûnê îfade dabûn. Ez bi saya serê wan ji destên sawcî û dadgehê filitîm. Piştî biryara dadgehê, şagirdan ji bo dewamkirina karê min îmze dabûn hev û ji îdareyê dewamkirina karê min daxwaz kiribûn. Lê îdareyê ne îmze wergirtibûn û ne jî guh dabûn gotinên wan.

Piştî bûyerê, ji bêkêsi û ji qehran min berê xwe dabû araq û şerabê. Di destpêkê de min piştî karê xwe hêdî hêdî dest bi vexwarinê kir. Ev vexwarin roj bi roj zêde bû. Hat rewşeke wisa ku êdî min di dema kar de jî vedixwar. Hesenê bavê Azad, ji devê karkeran bi rewşa min hisiyabû lê guh ne dida dora xwe. Heta ku vexwarina min li ser karê min tesîr nekira, tiştê nedibû. Wî bêbextî û tenêbûn dîtibû û ji rewşa min fêhm dikir.

Di dadgehê de wî li ser daxwaza awûqat, ji hakim re behsa rewşa min û karê min kiribû. Li gora xwe rastî û dilsoziya min yek bi yek ji dadgehê re gotibû. Bextreşiya kesên bêbext, dikaribû dinyayê berda pêşberî hev û şerên mezin bianiya holê ku kesî nikaribû bidana sekinandin, gotibû di îfadeyê xwe de. Lewra jî gelek şerên mezin ji ber kesên wisa û bextreşiyên wan dest pê kiribûn.

Heyama ku mahkeme qediya, êdî ez jî bûbûm alkolîkekî bêderman. Min xatir ji Hesenê bavê Azad û çend şagirdên xwe xwest da ku ji bajêr bidûr bikevim. Hesen bêdil destûra min da, lê hinek pere jî xist berîka min û rûyê min maçî kir.

-Xwe bi destê jinên bêbext ve bernede. Tu mirovekî heyf û hêja yî, dest bi jiyaneke nû bike û dev ji araqê berde. Xêr di jiyana wisa de tune û tenê zerar dide mirov.

Min bi rûçikê xemgîn û bêruh jê xatir xwest û ji wir bi dûr ketim. Ev bajarê

ku min ewqas jê hezdikir, ji min re bûbû dojecha jiyane; nebûbû wargehê min û ez neparastibûm. Dilsozî, aramî û baweriya min têr nekiribû ku bajêr min di bin baskên xwe de veşêre. Bi van ramanan, bi van xem û xeyalan li ez otobusê siwar bûm û bi awirên vala ji bajêr bîdûr ketim.

Min dikaribû çi bikira? Jiyanekê nû û cuda? Wê demê min ji bêtaqetî riya xwe nedît. Taqet û baweriya min têr nekir. Lê niha carna wextê ku hişê min tê serê min û ez difikirim, heyfa min li min tê. Min dikaribû qedera xwe bi destê feleka xayîn û bêbext ve bernedim. Lê min li ber xwe neda, ez ji zeîfî û bêtaqetîya xwe re dîl ketim. Çaxê ku ez vê difikirim, dîsa şûşeya nîvtijî bi ser devê xwe ve berdidim û xwe ji bîr dikim.

Guherîn? Niha? Nizanim, belkî. Ger tu kes pere nede min, an ez çend mehan têkevîm hepsê yan jî li cihêkî bêkes û ji bajarvaniyê dûr bikevim, dibe ku ez hinekî bi hişê xwe ve werim û wê hingê bikaribim rastî û şaşîtiyê ji hev cihê bikim. Wê hingê ji bo ku ez ji birçîna nemirim, dibe ku ez dest bi jiyaneke nû bikim.

Ger hinek bifikirin ku bûyerên wiha bi serê gelek kurebavan de hatine lê ji wan her kes jî neketiye rewşa min, bersîva min ev e: Ez fêrî bêbextî û bextreşiyê nebûme, lewra jî ez li hember bêbextiya felekê zeîf ketim. Taqeta min têrî li berxwedanê nekir. Beşa din ê bersîva min jî ev e: Hay ji xwe hebe, li hember bêbextiyê li ber xwe bide û ji taqeta xwe nekeve. Dermanê nerastî û bêbextiyê li berxwedan e û baweriyêke bêsinor e.

Kurd di kitêba Îbn el-Esîr de

Îzzeddîn Ebû 'l-'Hesen 'Elî Îbn el-Esîr (1160-1233) yek ji dîroknasên Îslamê yên bi nav û deng e ku bi eslê xwe ji Cizîra Botan e lê hê di dema zarûkiya wî de bavê wî koçî Mûsilê kiriye, ketiye ber xizmeta malbata Zengiyên Mûsilê û wezîfeyeke bilind li wir girtiye. Piştî qedandina xwendina xwe li Mûsil û Bexdadê Îbn el-Esîr ji wir derbasî Şam û Qudsê bûye û temamê jiyana xwe li wan deran bi xwendin, dersdarî û nivîsandinê derbas kiriye. Ew di dema Selaheddîne Eyyûbî de jiyaye û pê re bi xwe geriyaye.

Berhema Îbn el-Esîr ya navdartinê el-Kamil fi't-Tarîx e ku ji 12 cildan pêk tê; wî di vê kitêba xwe de daye pey rêça dîroknasê îslamê yê pêşiya xwe yê mezin û bi nav û deng et-Teberî û weke wî berhema xwe li gor bûyerên salane beş kiriye, lê wî ya xwe ji ya Teberî hêj berfirehtir û ji xwe li gor dema jiyana xwe bi demdirêjtir girtiye. Îbn el-Esîr ew bûyerên ku di dema Îslamê de qewimîne hêj ji wextê destpêka xelîfetiye ve girtiye destê xwe û sal bi sal pê ve hatiye hayanî sala 1230î û ew bi rêz kirine.

Îbn el-Esîr di gelek cihên vê berhema xwe de behsa Kurdan jî kiriye û ew bûyer yan jî gelşên ku di nav wan û fermandarên Îslamê de – çî yên herêmî bin û çî jî yên navendî bin – qewimîne, carina bi kurtî û bi xirabî û carina jî bi dirêjî û qencî nivîsîne.

Min hinek ji wan cihên ku tê de behsa Kurdan tê kirin niqandin û ji Erebi wergerandin Kurmancî. Herweha min ew notên çapxaneyê ku di binê rûpelan de hatibûn nivîsîn û cudahiya navbera nusxeyan didan, li gor herfa serê navên wan mîna çapa "A.", "B.", "C." –çawa ku di eslê wê de jî wusa bû - wergerandin û xistin dawiya nivîsê. Di cihek diduyan de jî min ew da ber hinek cihên berhema Îbn Xeldûn ku di eynî babetê de, berê di kovara Çirayê (hejmara 8 û 9'an) de hatibûn weşandin. Di paşiya her beşekê de jî min navê berhemê û cild û rûpelên wê ên ku min ew beş jê wergerandine nivîsîne da ku xwendevan bikaribin wan rûbarî hev bikin.

Ji bilî vê kitêba Îbn el-Esîr ya ku navê wê li jor bihûrî, çend berhemên wî yên din jî hene: "Ûlu'l-Ebsar" li ser tarîxa Atabegên Mûsilê, "Esed el-Xabe fi Me'rîfet es-Sehabe" li ser jiyana 7500 eshabeyên Muhemmed Pêxember, "Tuhfetul'Ecaîb we Turfetul-Xeraîb" û "el-Lubbab"¹.

Emîn Narozi

JÎ "EL-KAMİL FÎ'T-TARÎX" A ÎBN EL-ESÎR

Vegirtina Şehrezorê

Piştire Qu'htebe berê Ebû 'Ewn 'Ebd el-Melîk îbn Yezîd el-Xorasanî û Malik îbn Terafet el-Xorasanî bi çar hezar leşker ve da ser Şehrezorê. Hingê 'Usman îbn (kurrê) Sufyan di gel pêşewa 'Ebdullah îbn Merwan îbn Mu'hemmed jî li wir dima. Ew di bîstê zîlhîcçeyê [Meha 12 mîn ji salnameya hîvî ya koçî ye. - Narozî] de bi du fersexan [du fersex dikin 25 km. - Narozî] nêzî Şehrezorê bûn û şev û rojekê piştire dest bi şerê wî ['Usman] kirin. Hevalên 'Usman jî şikestin, hatin kuştin û Ebû 'Ewn jî li Bajarê Mûsilê ma.

Tê gotin ku 'Usman nehatiye kuştin lê reviyaye çûye cem 'Ebdullah îbn Merwan; Ebû 'Ewn jî leşkerê wî talan kiriye û pîrrên hevalên wî kuştine. Qu'htebe jî leşkerekî zahf şande cem Ebû 'Ewn û bi vî awayî sî hezar leşker li cem civiyan. Dema nûçeya vê bûyera Ebû 'Ewn gihîşte Merwan îbn Muhemmed ku hingê li 'Herranê bû, ew ji wir tevî leşkerê Şamê, yê Cizîrê û yê Mûsilê digel Emewiyan li cem meşîya ser Ebû 'Ewn heyânî ku giha nik Zabê Mezin [çemê Zab]. Ebû 'Ewn wê meha zîlhîcçeyê û ya muherremê jî ji sala sed û sîh û diduwan li Şehrezorê ma û pênc hezar diravên hingê wek tar avêtin ser wir².

(.)

Walîtiya Xalid Îbn (Kurrê) Bermek

Di vê salê [148/765] de Xelîfe Mensûr, Xalid Îbn Bermek kire waliyê Mûsilê. Çiku di wê demê de nûçeyên raweşan û xirabiyên Kurdan li wê wîlayetê gihîştibûnê. Wî [Mensûr] got:

- Ew der li kî? Wan bersîv da:
- Li el-Museyyîb îbn Zuheyr.

Lê 'Ummar îbn Xumre, Xalid îbn Bermek destnîşan kir û Mensûr jî rabû ew kir waliyê wir û şande ser Mûsilê. Wî qencî bi xelkê wir re kir, lê zor da xiraban û ew ji wir dûrxistin. Digel qencî û başîya wî ji gelê bajêr re jî dîsa bizdeke mezin jê kete nav wan.

Di 23 yê zîlqe'deya wê salê de, berî çêbûna er-Reşîd îbn el-Mehdî bi heft rojan, el-Fedl îbn Yehya îbn Xalid îbn Bermek hate ser rûyê cihanê û el-Xeyzerana diya er-Reşîd şîr dayê. Yanî el-Fedl îbn Ye'hya birayê er-Reşîd yê şîr e û ji ber vê yekê jî şair Selm el-Xasir di helbesta xwe de dibêje:

"el-Fedl û Xelîfe Harûn, bûne şîrvexwerê pêsîrên jina herî baş".

Şair Ebû el-Cenûb jî di helbesteke xwe de weha dibêje:

” Besî te ye ey Fedl ku qencirîn jina azad ji yek pêsirê şîr daye te û Xelîfe”³.
(. . . .)

Walîtiya 'Ebdullah Li Mûsilê û Kuştina Wî

Di vê salê [224/838] de li deverên dora Mûsilê yek ji serekên **Kurdan** yê bi navê **Cafer îbn Fehirces**⁴ serî li ber îdarê rakir, bi wî re gelek ji **Kurdan** û hinek ji wanên ku li xirabiyê digeriyan jî serî hildan. Mu'tesem rabû 'Ebdullah îbn es-Seyyid îbn Enes el-Ezdî kire serokê Mûsilê û ferman kir ku here şerê Ca'fer. 'Ebdullah meşiya çû Mûsilê lê Ca'fer hingê çûbû ser Man'îsê û ne li wir bû. [Gava 'Ebdullah bihîst ku Ca'fer li Man'îs e] hingê, wî jî hima rast berê xwe da wir û dest bi şerê wî kir, zor dayê ta ku wî ew ji wê derê derxist.

Cafer ji wir berê xwe da çiyayê **Dasin** (Cebel Dasin), li wir kete cihekî bilind î asê ku riya wî pir teng bû û kesî nikaribû xwe bigihîstandayê. Lê 'Ebdullah jî dû wî nefitilî û berê xwe da wî cihê asê. Ew di wan riyên teng î asê û di wan şeverêkan de çû heyana gihîşte cem Ca'fer û pê re kete cengê. Ji ber ku Ca'fer û **Kurdên** pê re ew der qenc dinasîn û bi şerkarên xwe jî ji 'Ebdullah û hevalên wî xilbetir bûn, wan [**Kurdan**] zû zora 'Ebdullah û leşkerên wî bir, ew şikiyan û pîrrên zilamên wan hatin kuştin.

Yek ji nav wan leşkerên 'Ebdullah yê bi navê **Rebah êrîş** bir ser **Kurdan**, seffên wan ji hev qelaştin û bi nav wan ve çû. Wî [**Rebah**] piştê ji **Kurdan** stand û ew bi xwe ve mijûl kirin da ku negihîjin hevalên wî û bi vî awayî hinek ji hevalên xwe xilaskirin. Gava **Kurd** pir lê raweşiyan û cih lê teng bû wî ji serê çiya xwe avête ser piştê hespê xwe, di bin wî de çemek hebû, hespê wî terayî wî çemî bû û bi vî awayî ew jî filitî.

Di nav wanên ku Ca'fer hêsir kiribûn de du zilamên ku navên wan **Îsmail** û **Îshaq îbn Enes bûn**, hebûn. **Îshaq** apê 'Ebdullah îbn es-Seyyid bû û xezûrê Ca'fer bû. Gava Ca'fer ew anîn cem xwe, **Îsmail** texmîn kir ku dê Ca'fer wî bikuje lê ji ber xezûrtiyê dê **Îshaq** nekuje; ew rabû temîniya zarûkên xwe li **Îshaq** kir lê **Îshaq** jê re weha got: ”Ma tu bawer dikî ku tu ê bêyî kuştin û ez ê bimînim? Piştê **Îshaq** li Ca'fer fitilî û jê re got: ”Ez divê ku tu pêşî min bikujî da ku dilê wî [**Îsmail**] rihet bibe”. Ca'fer rabû pêşî ew kuşt û piştê jî **Îsmail**.

Dema Mu'tesem vê nûçeyê bihîst, ferman da **Îtax** ku here ser Ca'fer û şerê wî bike. Wî haziriya xwe kir û sala 225 [839]'an berê xwe da Mûsilê û qesta çiyayê **Dasin** (Cebel Dasin) kir. Riya wî kete **Sûq el-Ehed**. Ca'fer çû pêşiya wî û şerekî giran pê re kir, lê ew [Ca'fer] hate kuştin, hevalên wî ji hev belabûn û tade û xirabiyên wî ji ser xelkê rabûn.

Tê gotin ku Ca'fer jahriyê xwariye û miriye, piştê **Îtax** jî êrîş biriye ser **Kurdan**, wî birreke mezin ji wan kuştîye, malên wan talan kirine û tevî dil û

pîrekan ve hemû birine Tikrîtê. Hinek jî dibêjin ku ev êrîşa Îtax di sala 226 [840]î de çêbûye, lê Xwedê çêtir dizane⁵.

(.)

Ketina Zenciyan Ya Ramehurmuzê

Di vê salê [266/879] de Elî îbn Eban û zencî ketin Ramehurmuzê. Çiku çawa me li pêş jî [di cihêkî din yê vê berhemê de] got, **Muhemmed îbn 'Ubeydullah** ji Eliyê kurê Eban ditirsiya û ji destê wî dîtibû. Ew rabû wî ji Înkîlay⁷ îbn el-'Ulwîyye re nameyek nivîsand û jê xwest ku bavê Înkîlay destê Elî ji ser rake û wî têxe bin maîyeta xwe. Vê yekê kerba Elî rakir û ji Xubeys re nivîsand, destûr jê xwest ku êrîş bibe ser Muhemmed û bi vê cewetê xeracê jî jê bistîne. Wî destûr dayê û ew jî rabû wî xeber şand cem Muhemmed ku jê re xeracê bişîne. Lê Muhemmed xwe mijûl kir û şandina xeracê derengî xist, Elî vê yekê fahm kir û êrîşî ser Mu'hemmed kir ku hingê li Ramehurmuzê dima. Ew ji wir reviya lê Elî û zencî ketin Ramehurmuzê û wir talan kirin. Di wê navê de Muhemmed jî pê ve çû heya ku gihîşte kele û parêzgehên xwe yên herî bilind, Elî jî bi talanan ve dageriya û çû.

Muhemmed tirsiya û ji Elî hêviya lihevhatinê kir, Elî ev hêviya wî bi şertê dayina hinek mal pejirand. Muhemmed rabû dused hezar dirav jê re bir, wî jî xeber şand ba mezinê zenciyan û wan jî dev jê û ji aqarê wî berdan.

Di vê salê de bûyerek li zenciyan qewimî û zora wan çû, çiku piştî lihevhatinê Muhemmed dijî **Kurdên Darînan**⁸ ji Elî alîkarî xwest da ku pezê wan ji wî û hevalên wî re zêft bike. Elî ji mezinê xwe destûr xwest, wî jî jê re weha nivîsand: "Leşker bişîne lê tu bi xwe heya ku hinek kesan wek gerew (rehîne) nestînî û xwe bi wan ewle nekî, neçe û herweha ta ku tu qenc dilbicih jî nebî bê ew li pey heyfa xwe nagere tukesî ji wan bermede". Elî rabû jê re nivîsand û jê xwest ku ew jê re sond bixwe û hinek kes jî wek gerew bişîne cem da ku lê ewle bibe. Muhemmed jê re sond xwâr lê şandina gerewan derengî xist. Ji ber dilbijandina xwe ya pez Elî li benda rehîneyan nema û rabû jê re leşker şand, wî jî hinek ji hevalên xwe amade kirin û çûn ser **Kurdan, Kurd** jî derketin pêşiya wan û şer di nav wan de dest pê kir. Hevalên Muhemmed dev ji zenciyan berdan û ew bi tenê hiştin, ew şikestin û **Kurdan** gelek ji wan kuştin.

Muhemmed berê hinek meriv amade kiribûn ku dema şikestinê ew bidin pey wan û gava ew şikestin wan êrîş kir, ew girtin û mal û terşên wan ji wan sitandin. Ew di rewşeke xirab î perîşan de zivirîn. Elî rabû nameyekê ji el-Xubeys re şand û ew ji meselê xebardar kir. Xubeys jî jê gazin kirin û jê re weha nivîsand: "Te bi devjêberdana sitandina gerewan emrê min şikand" û bi nameyeke din jî gef li Muhemmed xwarin. Muhemmed jê tirsiya û bi

nameyekê bersîva wî de, di nameyê de wî serê xwe ji Xubeys re nizim kir, xwe jê re şikand û digel hinek dewar ve ew name jê re rêkir. Muhemmed di nameyê de weha digor: "Min zor daye ser wan û bi kotek evên han ji ber wan xilas kirine." Xubeys bi vê yekê jî pirr aciz bû û xeyda xwe jê re diyar kir. Li ser vê aciziya Xubeys, Muhemmed jî qasidek şand cem Behdûd û Muhemmed îbn Yehya el-Kermanî ku nêzîktrîn dostê Elî bûn û soz da wan ku ger ew wî, Elî û mezinê Elî li hev bînin dê mal bide wan. Ew rabûn daxwaziya bexşandina Muhemmed ji Xubeys kir. Xubeys bi şertê xwendina xutbê li ser navê wî hêviya wan qebûl kir. Wan jî ev xeberê da Muhemmed û şertên Xubeys jê re gotin. Wî tiştên ku jê xwestibûn giş pejirandin û di nav du'ayan de carina li ser mînberan navê wî dida xwendin.

Piştî Elî ji bo [keleya] Mattûsê hazîrî kir û çû ser wê, lê bi ser neket. Ew zivîrî û dest bi çêkirina sêlim û haletên ku pê xwe bigihîjîne ser sûrê kir û xwe jê re amade kir. Lê Mensûr el-Belxî⁹ ku hingê li bakûrê Ehwezê bû pê hisiya û gava Elî çû wir [ser Mattûsê] hingê Mesrûr jî bi pêşiya wî [Elî] ve çû.

Wextê mexrebê, dema Elî giha wir, hingê Mesrûr jî ji nişka ve gihîştê. Çaxê ku zenciyan serê siwarên Mesrûr dîtin pêre pêre reviyar, ew pîs şikestin û çî tiştên ku anîbûn di cih de hiştin. Gelek ji wan hatin kuştin û Elî jî qidûmşikestî reviya, çû. Pirr di ser de neçûbû gava ku nûçeya hatina el-Muweffeq gihîştê. Ji xwe piştî Mattûsê tu êriş nehatibûn ser Elî heya ku Sûq el-Xemîs û Tehusa ji aliyê el-Muweffeq ve nehatin vegirtin. Bes piştî hingê mezinê wî jê re nivîsand, ew pirr herişand û jê xwest ku dagere here ser wî [el-Muweffeq]¹⁰.

(. . . .)

Destpêka Mîrîtiya Benî 'Hemdan ['Hemdaniyan] li Mûsilê û tiştên ku anîn serê Kurdan

Di vê salê [293/905] de el-Muktefî Bîllah, Eb ul-Heca' 'Ebdullah îbn 'Hemdan îbn 'Hemdûn et-TeXelubî el-'Edewî kire waliyê Mûsilê. Ew di yekê meha muherremê (Meha yekemîn ji salnameya koçî ya hîvê ye. - Narozi) de giha wir, rojek li wir ma û roja din ji bo bi hevdenenasîna merivên pê re û xelkê Mûsilê derkete nav xelkê. Di wê navê de ji Nînewa (Ninowa) nûçe û daxwaza hewarê hat ku **Kurdên el-Hezbaniye** (Hezbanî) tevî pêşikvanê xwe Muhemmed Îbn Bîlal êrişî ser bajêr kirine, ketine bajêr û gelek talan bi xwe re birine. 'Ebdullah û hevêlên wî di cih de di ser pirê de derbasbûn û çûn aliyê rojhilat. Ew li 'Urûbetê [Navê cihekî ye. - Narozi] li ser el-Xezerê gihîştin **Kurdan**, wan pê re şer kir û yek ji hevalên wî yê bi navê Sîma el-'Hemdanî hate kuştin. 'Ebdullah ji pey wan fitilî û bi nameyekê hewarê ji Xelîfe xwest. Piştî çend mehan gava hewar gihîştê, sala not û sisiya [293/905] qediyabû û ketibû sala not û çaran [294/906].

Di rebî'ulewwela [meha duyemîn ji salnameya koçî ya hîvî ye. - Narozi] vê salê de 'Ebdullah îbn 'Hemdan tevî kesê pê re meşîya ser **Kurdên Hezbaniyê**. Pênc hezar malên Hezbaniyan hebûn; dema wan dît ku 'Ebdullah di girtina wan de ji dil dike, ew ji cihên xwe rabûn û çûn hêla deriyê çiyayê Seleq (cebel es-Seleq). Ew derî diket birekeke teng ya çiyayekî bilind li raserî **Şhezorê**. Wan nikaribû derkevin ser wî çiyayê bilind û ji ber vê yekê jî mezinê wan Muhemmed îbn Bîlal dageriya, çû nêzî îbn 'Hemdan û bi qasidekî re şand cem ku ew dixwaze têkeve ber fermana wî. [Ji bo ku ewlehiya Îbn 'Hemdan li wî bê] wî got ku ew û zaruyên wî karin wek gerew herin cemê û dev ji xirabiyê berdin. Îbn 'Hemdan vê yekê pejirand û Muhemmed jî fitilî da ku sozê xwe bîne cih lê hevalên wî ew herişandin (gij kirin) û zor danê ku ber bi aliyê Azirbaycanê [Azerbaycanê] ve herin. Ji xwe tiştê ku wî dixwest û li ser bi Îbn 'Hemdan re jî li hev kiribû, ji bo jêqerîna (devjêberdana) ji girtina wan û nermkirina wî bû ku ew rihet û bi hêsayî bi rîya xwe ve herin.

Gava vegerandina Muhemmed bi ser îbn 'Hemdan ve dereng ket, wî meqseda Muhemmed fahm kir, rabû hinek ji nav xelkê xwe digel birayên xwe Suleyman, Dawud, Se'îd û hinek mêrxasên pêbawer î din jî veqetandin, tevî wê hewara ku jê re ji cem Xelîfe hatibû jî, berê xwe da ser wan. Wan [hewara ku jê re hatibû] xwe sist kir û wî jî dev ji wan berda û kete pey rêça **Kurdan**. Ew, li çiyayê ku bi navê **Çiyayê Qendil** navdar bû, gihîşte wan, li wan xist û hinek ji wan dan erdê. Lê gava **Kurdan** xwe hilda navsera çiyê, hingê Îbn 'Hemdan jî ji pey wan qetiya û wan jî bi hêsayî xwe gihand Azirbaycanê. Îbn 'Hemdan rewşa wan gihîştand Xelîfe û wezîrê wî, wan jî hinek çekdarên din jê re rêkirin. Ew fitilî Musilê, merivên xwe dan ser hev û careke din berê xwe da ser çiyayê Seleqê ku Muhemmed îbn Bîlal tevî **Kurdan** tê de bûn. Îbn 'Hemdan ji ber tîrsa kemînên **Kurdan** tevî sîxurên xwe ve kete çiya, ew bi pêş ket û heval û leşkerên wî jî hemû li pey wî diçûn. Kesekî ji wan xwe li paş nedihîşt, ew her pê ve çûn, heyanî ki çiya derbaskirin û nêzîkî li **Kurdan** kirin. Di wê navê de berf li wan [**Kurdan**] bariya, sir û seqem û axlêveyek giran bi ser wan ve hat, qût û mûnetê (zexîreya) wan, êm û alifê terş û tareşê wan qediya. Deh roj di ser de neçû, barê kayê û êm rabû sih dîrhemî û piştî ew jî li cem wan qediya lê wî [Îbn 'Hemdan] her sebir dikir û li benda wan bû.

Dema ku **Kurdan** arama Îbn 'Hemdan û hevalên wî dîtîn û tu rê di xapandin û bi paşveşandina wan de nedîtîn, hingê Muhemmed îbn Bîlal rabû xwe tevî zaruyên xwe û kesên pê re avête tor û bextê Îbn 'Hemdan. Îbn 'Hemdan jî dest danî ser xanî, gund, êl û malên wan. Wan daxwaza êminiyê lê kir, wî jî ewleyî da wan û li ser wan sekinî, heyanî ku piştî ew vegerandin bajarê Hezzetê û mal û milkên wan li wan zivirandin. Îbn 'Hemdan ji zilamê ku hevalê wî Sîma el-'Hemdanî kuştibû pê ve, tu kes nekuşt û destê xwe neda yekî din. Bi hatina wî re bajar ewle bûn û xelkê wan bajarên jî baş bûn.

Piştire Muhemmed İbn Bîlal daxwaza bexşandin û ewletiyê lê kir, viyana wî hate pejirandin û İbn 'Hemdan ew anî Mûsilê, danî cem xwe. **Kurdên Humeydî** û yên çiyayê **Dasin** jî li pey wî [Muhemmed] çûn û ewleyî danê. Bi vê re êminî û ewleyî hate bajar, gengeşe ji herêmê derket û rewş li hev rast bû¹¹.

Wergera ji Erebî:
Emîn Narozi

(1) Christopher Toll, *Den Arabiska Litteraturen*, Norstedt & Söners Förlag, Stockholm, N. d. (dema çapê ne diyar e), r. (rûpel) 146-47

H. A. R. Gibb, *Arabic Literature*, Oxford University Press, Oxford û London, 1963, r. 132
Ferdinand Tûlû, *El-Muncid fi 'l-Luxe we 'l-E'lam*, Dar el-Meşriq, Beyrût, 1973, beşa dîrok û agahan, çap: 7, r. 8.

The *Encyclopaedia of Islam*, New edition, Ed. B. Lewis, V. L. Ménège, Ch. Pellat and J. Schacht, The International Union of Academies, E. J. Brill, Leiden, 1971, vol. (cild) III, r. 723-24.

(2) Ji berhema İbn el-Esîr, *El-Kamil fi't-Tarîx*, Dar Sedir, Dar Beyrût, 1965, c. (cild) 5, r. 400-01, beşa sala 131/748'an hatiye wergerandin.

(3) Ji berhema İbn el-Esîr, *El-Kamil fi't-Tarîx*, c. 5, r. 585-86, beşa sala 131/748'an hatiye wergerandin.

(4) Li gor çapa B. "Mihirxweş" û li gor yên C. û B. jî "Mihirwûş" e. (Binêre İbn el-Esîr, *El-Kamil fi't-Tarîx* c. 6, r. 506)

(5) Ji berhema İbn el-Esîr, *El-Kamil fi't-Tarîx*, c. 6, r. 506-507, beşa sala 224/838'an hatiye wergerandin.

(6) Ramehurmuz navê herêm û bajarekî ye ku li Xuzîstanê, li ser riya navbera Ehwaz, Şûşter û Îsfahanê dimîne. Ew gotineke hevdudanî ye ku ji "Ram" a Farisî ya bi maneya mirad û ji navê şah Hurmuz pêk hatiye. (Yaqût el-Hemawî, *Mu'cem el-Buldan*, Dar Beyrût, Dar Sadir, Beyrût, 1957, c. 3, r. 17; Ferdinand Tûlû, *el-Muncid fi el-Luxe we el-E'lam*, Dar el-Meşriq, Beyrût, 1973, çapa 7'an, beşa dîrok û agahan, r. 303)

(7) Di çapa C., P. û B. de "Înkîlan" e. (Binêre İbn el-Esîr, *El-Kamil fi't-Tarîx* c. 7, r. 330)

(8) Di çapa A. de "Dadîban" û di ya B. de "Darîban" e. (Binêre İbn el-Esîr, *El-Kamil fi't-Tarîx* c. 7, r. 331)

(9) Li gor Teberî ev nav "Mesrûr el-Belxî" ye. (et-Teberî, *Tarîx er-Rusul we el-Milûk*, Dar el-Mearif, Qahîre, 1960, c. 9, r. 554-56)

(10) Ji kitêba İbn el-Esîr, *el-Kamil fi't-Tarîx*, c. 7, r. 330-332, beşa sala 266/879'an hatiye wergerandin.

(11) Ji berhema İbn el-Esîr, *El-Kamil fi't-Tarîx* c. 7 r. 538, beşa sala 293/905'an hatiye wergerandin.

Nivîsek ji mecbûrî!

Laleş Qaso

Bi rastî di navbera bîst, sih salan de li Kurdistan û temamê dinyê gelek guhertin hatin kirin. Di demên raborî de ji tuneyî, rêvebirekî rêxistinek kurd belkî dikarîbû hem bûba civaknas, zimannas, astronom, perefesorê tarîxê, textorê herî mezin, nivîskar û şahirê gubgube, dirûnker û goşkarê bi navûdeng û hwd. û ev karana hemû digelhev bimeşandana. Belê îro rewş hatiye guhertin: Civaknas bi karê xwe dadikeve, têkilî karê mirovê zimannas nabe; astronom bi astronomiya xwe û textor jî bi textoriya xwe dadikeve. Di nav milletên pêşketî de çerxa civakê wilo zîviriye û dizîvire. Sefar ji karê textoriyê û textor jî ji karê sefariyê fêr nake. Serê însanekî têra ku hem bibe sefar, keşe, şêx, pêximber, ehremen, qomitan, sosyolog, psîkolog, romannivîs, artîst û hwd. nake. Tişteki seyr e, bi kurdî distirê, xwe hozanê kurd dibîne û nizane bi kurdî! Dengbêj e, ji dêvla ku sitiranek nû pêşkêşî millet bike, bi sitiranên gelêrî dilîze, li gora serê xwe ê piçûk difesilîne û mîna ku di hunerê muzîkê de tofan rakiribe xwe dinepixinê! Bi kurdî dixwîne bi tirkî, bi tirkî dixwîne bi kurdî fêr dîke û nizane bê zayend çî ye, gramera kurdî dinivîsîne!

Wek têzanîn, bi giştî ji sala 1980 î vir de, hin rewşenbîrên kurdan ên serbixwe li Ewrûpayê di warê kultur û edebiyata kurdî de karekî hêja kirin. Di bin serokatiya van rewşenbîran de enstutiyên kurdî hatin damezrandin. Bi kurdî dibistan vebûn. Bi sedan kitêb û kovar hatin nivîsandin û hwd. Belê mixabin di nav van îmkanên mezin de tu zimannasên ku wê mirov wan bikaribe wek otorîte qebûl bike çênebûn û çênebûn.

Bi qasî ku mirov dibîne, zaravê kurmancî ê nivîskî di van çend salên dawî de li Swêdê hinekî kemilî. Nivîskaran devokên têvel ber bi hev de anîn û ziman bi rûniştîkirin dan. Îcar mixabin îro jî hin ji wan bêku zanista zimên bizanibin, destdirêjî gramera kurmancî kirine û habela zimanê me dizewrinin. Bi

bingehên zimên dilîzin, dikin lebixe û li ber me datînin. Di vê dema ku kurmanc hêdî bi hêdî li zimanê xwe vedigerin û xwe hînî gramera Celadet Bedirxan dikin, mirov bi gramerê bilîze ne çewt e gelo? Dema ku kurmanc li dor bîst milyonan bin û ji van bîst milyonan pêncî hezar kes hîn nizanibe bi kurmancî bixwîne û binivîsîne, mirov jî bi qayideyên gramera Celadet bilîze baş e gelo? Eger îro kurmanc xwedî zimannasên bijarte û partyên gelparêz bana, helbet lîstina me a bi zimên re wê di cih de ba. Mesele bêteq û req safî dibû ji xwe. Di esasê xwe de bi tevayî îro jî mirov dikarîbû di vî warî de hin gav bavêtana, belê ka ew tevayî! Ka ew otorîteyên me ên kurdperest û qeran! Em hem li ser guhertina du tîpan (i-î), ku di baweriya min de jî divê zû bên guhertin, li hevûdin nakin û hem jî em bi qarekterê zimên dilîzin. Ji bo ku yek yekî neheq bike, xwe li keleman diqelîbîne, ji heft kaşan avê dikşîne, tîpan dike ilm û pêşkêşî me dike. Tîp sembol in. Mirov wêneyê bizmarekî an çakûçekî jî dikare bike tîp. Û dikare di şûna tîpekê de bixebitîne. Hin ji me mîna ku bi rastî sê-çar akademiyên zimên xwendibin bêtirs bi qarekterê zimên dilîzin û vî zimanê me ê dewlemend gindorkî bi vir de wir de digindirînin. Ev mirovana di vê yeka ha nagihên ku mirov gramera zimanê miletekî zanibe tiştek e û mirov zimannasê zimên be tiştek e. Her mirovê ku lîse qedandibe dikare gramerê baş bizanibe, belê nikare bibe zimannas yanî dîlbîlîmcî. Zimannasî karekî mezin e. Mirovên zimannas dikarin bi esasê zimên bilîzin belê gramerzanek nikare bi esasê zimên bilîze. Ezê li vir bisekinim û li ser elfabeya Osman Sebrî û ferhenga Mûsa Anter ku îro dîsa wek problem derketiye pêşiya me, rawestim.

Li gora Osman Sebrî, bi zimanê kurmancî, di navbera van çar tîpan de (T-K-P-Ç) çar deng hene. Û ji bo vê yeka ha li elfabeya kurmancî divabû çar tîp zêde bûbana. Celadet bi a Osman Sebrî nake, elfabeya kurmancî bi sih û yek tîpan dirikubîne. Belê Osman Sebrî jî bêku dilmanî têkeve nav wî û Celadet hem elfabeyekê bi 37 tîpan diweşîne û hem jî di Hawarê de bi awayê elfabeya Celadet dinivîsîne.

Mûsa Anter jî dide ser rêya Osman Sebrî û di ferhenga xwe de dibêje: Ji neçarî tîpek nû î hevdudanî (k-h) me stend, elîfbêya xwe. Mûsa Anter kurdî dike khurmancî û gotinê didomîne: Di navbera (b-p) de dengekî ku dibe (p-h) û yan jî dibe (b-h) heye. Erê bi vî dengî di kurmancî de pir xeber nînin. Lê dîsa jî ku bi tîpek xweser bê stendin hîn çêtir e. Ev deng di van pirsan de çêtir tên hîn kirin. *Pik, piling, pizan, pirs, pitik*. Qenc bê mijûl kirin, wê bê dîtînin ku bi dizî tîpa (h) van tîpan nêzikî hev dike.

Dengê duduyan jî di neqeba (c-ç) de ye. Li vîra jî (h) yeke bi dizî heye û (ç) nêzikî (ç) dike; dibe wek (ç-h) yan (c-h). *Wek çiya, çir, çik, çikçikand, çileg*.

Wek ku Osman Sebrî û Mûsa Anter jî dîbêjin di navbera hin tîpan de mirov hin dengên cihê dibihîze. Belê bi qasî têgihiştina min gerek ev neyê wê manê ku mirov ji ber hindê li elfabeya kurmancî hin tîp an hin îşaretan zêde bike.

Çimkî ev problema ha, kê-m-zêde, di her zimanî de heye. Ji vê problemê re:

- a)Homonym
- b)Homograf
- c)Homofon tê gotin.

Di **homonymê** de deng û nivîsandina gotinê yek e belê mane cihê ye. Di **homografê** de nivîsandina gotinê yek e, deng ne yek e, mane cihê ye. Di **homofonê** de deng yek e, nivîs ne yek e û mane jî herwiha cihê ye.

Di vir de ezê zimanê swêdî û kurmancî bi çend mînakên bidim berhev daku em bizanibin ne tenê di zimanê me de wilo problem hene.

a)Homonym

Bi zimanê swêdî mînak:

1Fâr.navdêr. *Mih*. 2Fâr.lêker. *Stendin*.

1Matt.rengdêr. *Pirhejmariya têr*. 2Matt.navdêr. *Merş*.

1Man.navdêr. *Mirov*. 2Man. navdêr. *Mûyê hespê*.

1Plan.rengdêr. *Rast. Yanî erdekî rast*. 2Plan. navdêr. *Plan, proje*. 3Plan. navdêr. *Qat*.

1Mitt.pronav. *Min*. 2Mitt. hoker. *Di nêvî-navê de, tam*. 3Mitt. navdêr. *Navend*.

Bi zimanê kurmancî mînak:

1Tîr. rengdêr. 2Tîr. navdêr.

Mastê Gulnaz tîr e. Di vir de tîr rengdêr e. Tîr û kevanê min heye. Di vir de tîr navdêr e.

Gulnaz qîzeke spehî bû. Wê zeriye tîrek li dilê min da.

Çeqilmastê tîr xweş e.

Di vir de vekirî dixuye ku ku mirov qala çî dike.

1Hûr. rengdêr 2Hûr. navdêr.

Lawê min girs e belê qîza min hûr e. Di vir de hûr rengdêr e. Hûrê lawê min bi qasî hûrê gayekî mezin e kuro! Di vir de hûr navdêr e.

1Tî. rengdêr. 2Tî. navdêr.

Ez tî me! Di vir de tî rengdêr e. Kejo mêrê Kejê ye. Birayê Kejo Bozo tiyê Kejê ye. Di vir de tî navdêr e.

1Têr.navdêr. 2Têr. rengdêr. 3Têr. hoker

Serhanê omerî têra xwe ji genim dagirt. Di vir de têr navdêr e.

Ez têr im. Di vir de têr rengdêr e.

Xwe têr bike. Di vir de têr hoker e.

1Sih.jimarnav. 2Sih. navdêr. Sih zilamên bi tiving. Di vir de **sih** jimarnav e. Siya xênî. Di vir de **sih** navdêr e.

1Xwar.lêker. 2Xwar. rengdêr. 3Xwar. hoker.

Çêlekê em **xwar**. Di vir de **xwar** lêker e.

Dîwarê hewşa Heso **xwar** e. Di vir de **xwar** rengdêr e.

Heso dîwarê hewşê **xwar** lêdike. Di vir de **xwar** hoker e. (Rengdêrên bi zaravê kurmancî hemû wek hoker, û lêker jî hemû wek navdêrên mê tên xebitandin. Ev yeka ha jî zimanê kurmancî dewlemend û xweş dike.)

1Ber. navdêr. 2Ber. navdêr. 3Ber.navdêr.

Berekî têxe qulika hêtê qesirê. Yanî zixurekî.

Gulşah li ser **berekî** rengîn rûniştibû.

Dapîra min carna **berê** xwe dida bakur û limêj dikir.

Ji mînakan dixuye ku mirov çî dibêje.

1Pir.hoker. 2Pir rengdêr. 3Pir.navdêr.

Berf **pir** bariya. Di vir de **pir** hoker e.

Li Swêdê berf **pir** e. Di vir de **pir** rengdêr e.

Ez li ser **pirê** me. Di vir de **pir** navdêr e.

Ez di ser **pira** Mala Badê re derbas bûm. Navdêr e.

Ez ji **pirê** ketim. Navdêr e.

Pir bi ser min de herifî. Navdêr e.

Ez **pir** nexweş im. Hoker e.

Li Kurdistanê dims **pir** e. Rengdêr e.

Di mînakan de xuya dike ku ez çî dibêjim.

Bi rastî mirov têngahî bê çîma bi awayê du dengdaran *pir-pirr* ji hev cihê têng nivîsandin. Di zaravê kurmancî de ez bawer nakim ku bi qasî zimanê swêdî û tirkî homonym hebin. Di mînakan de vekirî xuya dike ku pêwîst nake mirov ji bo homonymên kurmancî, bêjeyan biselîxîne an du dengdaran (konsonantan) berhev lêke û an jî li elfabeya xwe tîpekê zêde bike. Zimanê kurdî fonetîk e; yanî deng û nivîsandina gotinan yek e. Belê digel ku ev ziman fonetîk e jî, wek zimanê hîndo-ewrûpî *pir* normal e ku hin taybetiyên xwe hebin. Ev taybetiyên ha jî em dibînin ku di gramerê de wek homografan derdikevin pêşîya me. Gerek di zimanê kurdî de homograf tunebana, çimkî kurdî zimanekî tam fonetîk bû. Belê mixabin hin gotin hene. Ev gotin çawa, çîma ketine zimanê me? Îcar ew ne karê min e, karê mirovê zimannas e.

b) Homograf

Bi zimanê swêdî mînak:

1And.navdêr.*Ordek*. 2And navdêr.*Ruh*.

1Hov.navdêr.*Sim* 2Hov.navdêr. *Ji temamê mirovên ku di seraya qrêl de karên dewletê dimeşînin re, têgotin.*

Bi zimanê kurmancî mînak:

1Kwîr. rengdêr. 2Kwîr.rengdêr.

Çelo ji her du çavan de kwîr e. Di vir de zelal e ku ez çî dibêjim.

Çala gund heyşt metroyan kwîr e. Di vir de jî zelal e ku ez çî dibêjim.

1Kêr.navdêr. 2Kêr. hoker.

Kêr li ser masê ye. Di vir de kêr navdêr e.

Nexweşiyê lê kêr kir. Di vir de kêr hoker e.

1Kar.navdêr. 2Kar. navdêr.

Çelo kar dike.

Min ji Çelo re karek serjê kir.

Karekî Xanimê î şim heye. Di mînakan de dixuye ku ez li ser çî disekinim.

1Kew.navdêr. 2Kew. navdêr.

Min îro li çiyayê Mavan refek kew dît.

Kew dijminê serê xwe ye.

Mehmetçîkên misilman bi lêdanê canê min tije kew kirin.

Xwîn li Çelo tewirî ruyê wî tije kew bûn.

Di mînakan de diyar e ku mirov çî dibêje.

1Ker.navdêr. 2Ker.rengdêr.

Li Kurdistanê ez li ber garana keran bûm.

Ez ji kerê ketim. Ker reviya!

Di her sê mînakan de ker navdêr e.

Ma dengê min nayê te qey tu ker î?

Ew xortê delal ker û lal e. Di her du mînakan de ker rengdêr e.

Bi qasî ku di zimanê swêdî de homograf hene di zimanê kurmancî de ewqas tunene. Zimanê swêdî jî mîna ê kurdî fonetîk e. Belê swêdiyan ji ber vê yeka ha tu tîp li zimanê xwe zêde nekirine.

c)Homofon

Bi zimanê swêdî mînak:

Gärna.hoker. *Bi memnûnî.*

Hjärna. navdêr. *Mejî.*

Full. rengdêr. *Dagirtî, tije*. Ful. rengdêr. *Bêmikûs, bêfiqir, bêçehir*.
Kol.navdêr. *Lehane*. Kâl.navdêr. *Komir*.

Bi qasi ku ez dizanim di zaravê kurmanci de homofon tunene.

Ji bo gotinên ku homonym û homograf in, swêdî mîna hin nivîskarên me ku *pira* hoker bi du konsonantan ji *pira* navdêr cihê dinivîsîn, tofanê ranakin. Bi sebeba ku *1Pir-2Pir-3Pir* ji hevûdin bê naskirin, hîç pêwîst nake mirov li aliyekî *pirr* û li aliyê din jî *pir* binivîsîne. Baş e gava min jî *pira* sisêyan bi awayê *Pirrr* nivîsand wê çawa bibe gelo? Çimkî li gor formê *pirr* gerek *pirrr* jî bê nivîsandin. Zimanê kurmancî nerm û sivik e. Bi min wilo tê. Mîna erebî bi fethe, kesre û şeddêyan nazewire. Evên ku li gora formê *pirr* diçin wîçaxî gerek *1kew-2kew* jî bi awayê *kkew* ya jî *keww* binivîsîn ma ne ji xwe. Çimkî di van her du bêjeyan de du dengên cihê hene û her du bêje jî wek *pirr* bi konsonantan destpê dikin û diqedin. Wilo kêfî nabe. Li hêlekê hûnê konsonantekê ducar binivîsîn û li gora serê xwe qaşo tîpê qalind bikin û li hêla din jî hûnê hîç dest bêjeyên dengcihê nedin.

Ji aliyekî din de:

Dema ku du gotinên *1tî-2tî* wek homonym di vî zimanî de hebin, li gora zihniyeta *pirr* gerek *1tî* bi awayê *tîî* ya jî *ttî* bê nivîsandin. Û ya jî gerek em dev ji elfabeya Celadet berdin bi a Osman Sebrî û Mûsa Anter bigirin û zimanê kurmancî bi 37 tîpan binivîsîn.

Ji aliyekî din de:

Li hêlekê *kwîr* û li hêlekê jî *kwîrr* dinivîsîn. Nivîsandina bi vî awayî problemê ji xwe hîç safî nake. Çimkî problema deng ne di zêdekirina (rr) de, di (k) de ye. *Kwîr* (yanî kor), dengê ku ne tam (k) ne jî tam (g) dide. Ji ber hindê ya divê *1kwîr-2kwîr* wek homograf bèn qebûl kirin, ya bi awayê zihniyeta ku *pirr* dinivîsîn, *kkwîr* bê nivîsandin û ya jî mîna ku Osman Sebrî dibêje em tîpekê li elfabeya xwe zêde bikin û binivîsîn. Belê gava ku wê li elfabeyê tîpêdekirin ne karê me be, wîçaxî jî gerek em dev ji nivîsandina *kwîrr-pirr* û hwd. berdin.

Ji aliyekî din de:

Berî her tiştî divê em bizanibin ku di zaravê kurmancî de bi nivîsandina du dengdaran di dengê tîpan de guhertin nayên kirin. Yanî du (rr) deng ne qalind ne jî zirav, ne bilind ne jî nizm dike. Hin ji ba xwe van tiştan derdixînin. Di zanista zimên de ji bo tîpên dengdar qayideyek wilo tune. Tîpên dengdêr (vokal) muzîkal in. Bi van tîpan mirov dikare bilîze û bi alîkariya hin îşaretan di deng de guhertinê bike. Belê di tîpên dengdar de tişteki wilo tu kesî ne kiriye. Nikarin bikin, çimkî çênabe. Mirov bêwestan bêku bêhnê berde dikare aaaaa, êêê, mmm, ûûûû bibêje, belê mirov nikare b, c, ç, r û hwd. wek aaaaa, êêê, mmm, ûûûû bibêje. Du dengdar tenê gotinê bi serhev de dizewirînin. Gava bû sisê, çar, pênc wîçaxî jî wê tîp tîpan mîna lûlikê êş biliklikînin. Yanî dengê tîpan

dîsa jî wê qalind û zirav, bilind û nizm nebe. Wek mînak: Gelek, gellek, gellllek.

Di her sê gotinên cihênivîs de dengê tîpa (l) herwiha dîsa dengê berê ye. Yanî ne qalind ne jî zirav bûye. Guhertina ku dibe: Gelek (nerm e), gellek (dizewirîne), gellllek (diliklikîne).

Belê yekî ku kurmancî nizanibe dikare ji qayîdeyên deng dûr bikeve, tîpê qalind û zirav bike û biliklikîne. Îcar yekî ku di civata kurmancan de mezin bûbe, trênek (l) jê re rêz bikin, ewê ji dengê (l) pêve tu dengî dernexe.

Di gramera Celadet de îşaretek ku ji tîpa T, K, P, Ç, R dengê duduyan yan jî denegekî qalind an zirav raber bide tune. Ji ber vê yekê heta ku kurmanc bi vê gramerê rabin û rûnên kurmanc mecbûr in ku gotinên wek 1kwîr-2kwîr, 1ker-2ker, 1kar-2kar, 1kew-2kew û hwd. homograf qebûl bikin û tîpan ducar nenivîsînin. Te divê (r)yekê bike deh rrrrrrrr, (ş)yekê bike deh şşşşşşş, (l)yekê bike bîst llllll û binivîsîne, dengê tîpê ji serî de çî be ew e. Bi rastî ez mereq dikim, ewên ku gotinê bi du konsonantan (rr) diqedînin ji kîjan kitêbê hînî vê yeka ha bûne? Di kîjan zanistê de dibêje ku bi du konsonantan deng zirav û qalind an bilind û nizm dibe?

Gotina dawî:

1)Eger emê gramera Celadet Bedirxan ji xwe re bingeh bigirin, wîçaxî jî divê ku em homograf û homonymên di zaravê kurmancî de qebûl bikin û bi awayê (*pirr*) nenivîsînin.

2)Na eger emê homograf û homonyman di vî zimanî de qebûl nekin, wîçaxî jî divê ku em bidin dû Osman Sebrî, belê ne bi tîpên elfaba wî, tîpên nû li qêlib xînin û binivîsînin, ewqas.

Azad

Guy de Maupassant

Ew, markîsa piçûk *de Rennedon*, mîna guleyêke tifingê bi bayê bazdanê ji pencereyêkê ve ket hundir; mîna wê roja ji vir û mehekê berê, gava ji hevala xwe re got; ku ji ber zorbeyî û hesûdiya mêmê xwe, ji bo tolhildanê ji markîsî, ew bi yekî din re, tenê ji bo heyfa xwe bistîne hew carekê tenê razaye; her wek wê carê berî ku dest bi axaftinê bike, welê keniya ku çavên wê tije rondik bûn

Baronessa piçûk *de Grangerie*, ku li ser dîwanekê paldayî dixwend, pirtûk ji destê xwe avêt, bi meraq li Anette mêze kir; û her di wê gavê de wê bi xwe dest bi kenînê kir.

Dawiyê wê got:

- Te cardin çi kiriye?

- Ohoo, delalê, delalê; pîrr komîk e, pîrr komîk e. Lê bifikire. Ez azad im! Azad! ... Azad! ... Azad! ...

- Mebesta te çi ye? Ma tu azad î!

- Belê, ez azad im.

- Ji çi azad î?

- Ez ji mêmê xwe azad im, delalê. Ez hatim rizgarkirin. Ez azad im! Azad! Azad!

- Tu ji mêmê xwe çawa azad bûyî? Bi çi awayî?

- Bi çi awayî? Ma ji bilî hevduberdanê mirov çawa azad dibe? Ez dê ji wî veqetim. Her tişt hazir e.

- Ma tu jê veqetiyayî?

- Na, hîn na. Tu jî çiqas dîn î... Ma di sê saetan de mirov azad dibe! Lê di destê min de delîl heye... delîl lê... delîlê ku ew bi min re ne sadiq e. ... Ew li ser sûc hatiye girtin; li ser sûc, ew di destê min de ye.

- Na lê, de ka bêje... ango tu dibêjî ew bi te re ne sadiq e?

- Belê, ango na... erê û na... bi rastî ez nizanim. Lê ev çi ye? Di destê min de delîl heye; ya girîng ev e.

- Te çi kir, çawa delîl bi dest xist?

- Min çi kir? Niha tu dê bibihîzî! Belê, min dekbazî kir; dekbaziyeke mezin. Di van sê mehên dawiyê de nema derdê wî dihate kişandin; qet nedibû, bênsaf, zorbe, bi kurtî cîrnexweş. Min xwe bi xwe got: Bi vî awayî nabe, divê ez ji wî veqetim. Lê çawan? Karekî ne hêsa bû. Min hewl da, da ku ew li min bixe; lê wî li min neda. Wî her tişt bervaî min dikir; gava min dixwest ez li malê bim, wî ez mecbûr dikirim ku ez herim derve; gava min dixwest ez herim derve restoranê, vêca wî ez mecbûrê hundir -malê- dikirim. Wî jîyan li min heram kir; lê li min nedixist.

Paşê ez lê xebitîm ku bizanibim ka dosta wî heye an na. Belê, dosta wî hebû. Lê gava ew diçû cem wê, wî hertim tedbîra xwe distend ku kesek wan bi hev re nebîne. Ango ne mumkin bû ku mirov ji nişkê ve bi ser wan de bigire. Tu karî texmîn bikî ka min çi kir?

- Na, bi Xwedê ez nikarim.

- Na, çu carî tu nikarî texmîn bikî. Min ji birayê xwe re got ku fotografekê wê ji min re peyda bike.

- Fotografa dosta mêrê te?

- Belê. Gelekî mesref lê çû. Sê sed frank heqê êvarekê saet ji heft heya diwanzdehê, şiv jî têde, serê saetê şêst frank, li ser Jacquesî bû mal. Wî fotograf mift û belaş bi dest xist.

- Bi ya min, wî dikaribû bi fêlbaziyê fotograf bi dest biêxîne bê ku ... bê ku ... bi orîjînalê re bide û bistîne. -

- Na na, ew pirr şêrîn e. Jacques ne li dijî dîtina wê bû. Ji hêla din pêwistiya min bi gelek detayan hebû. Divê min marîfetên laşê wê, her tişt, di heqê bejna wê, sînga wê, rengê canê wê de zanibaya, herhal tu fêm dikî?

- Na, ez fêm nakim.

- Rawest e, ez dê bêjim. Gava zanyariyên ku pêwistiya min bi wan hebû, min bi dest xistin ... ez çûm, belê ... bêjim çi ... mirovekî xweser... cem yekî, tu zanî yên ku bi her wezîfeyê radibin, mirovekî ku buroya wî heye.

- Belê, kêma zêde ez mebesta te fêm dikim ku tu çi dibêjî. Te ji wî re çi got?

- Min fotografa Clarîsessê (navê wê Clarîsess e) nîşanê wî da û got: Ez li xizmetkareke di vê bejnûbalê û şiklî de digirim. Divê ew spehî, zirav, bîaqil

û li hev be. Heçî heqê wê ye ez didim; daxwaza wê çî be jî. Heke li ser min bi hezar frank jî rûne, ne xem e. Lê tenê ji bo sê mehan pêwistiya min bi wê heye.

Ew gelekî ecêb ma û got: Ma tu dixwazî bila ew bêqusûr be?

Ez sor bûm û min got:

-Belê, divê ew durist be.

Wî got:

- Û bi terbiye û îtîbar be?

Min cesaret nekir ez bersîv bidim. Min qîma xwe bi serîhejanê anî. Lê ji nişkê ve ez têgehîştim ku wî ez xelet fêm kirim; min xwe winda kir û got:

- Na, na... ew ji bo mêrê min e; mêrê min bi min re ne sadîq e; li bajêr wî karî dike... ez dixwazim bila li malê bi min re ne sadîq be; ... herhal tu fêm dikî ... bi vî awayî ez dikarim wî zeft bikim.

Ew mirov kenîya, min ji nêrînên wî fêm kir ku îtîbara min cardin li cem wî çêbû. Wî pesnê min da, ji min re got ku ez gelekî jîr im. Ez cesaret dikim şert bigirim, ku di wê gavê de wî dixwest destê min mist bide.

Wî got:

- Xanimê, ez dê di heşt rojan de, daxwaza te bi cih bînim. Heke pêwist be, em dê yeke nuh biceribînin. Ez dibêjim di dawiyê de em dê bi ser kevin. Tu dikarî mesrefa min -heqê min- paşê bidî. Xuya ye ev fotograf ya dosta mêrê te ye?

- Belê.

-Xuya dike ku spehî ye; bejin zirav e, lê bê ku zeîf be. Kîjan parfumê bi kar tîne?

Min fêm nekir ka mebesta wî çî ye. Ji ber wê yekê min dubare kir:

- Kîjan parfum? Çima tu pîrsa parfumê dikî?

Ew bişirî:

- Belê, ji bo jirêderxistina zilamekî parfum yê herî girîng e. Parfum hestên bîranînên bêşiûr divejîne ku kesî mecbûrê fiiliyatê dike; dibe sebebê geşbûn û vejîne di ruhê wî de, wî sergêj û tehrîk dike da ku kêf û zewqên berê yên jiyayî bifikire. Û hewl bide ku tu bizanî ka mêrê te li cem wê jînikê, dosta xwe, kîjan xwarinê, şivê dixwe. Ew roja ku tu dixwazî bi ser wî de bigirî, heke tu karibî ji wê cûre xwarinê bide wî. Ooo, xanima delal, ew di destê me de ye, destê me.

Ez bi kêfxweşî ji wê derê çûm. Pîrê eşkere bû ku min mirovekî erbabê karê xwe hilbijartibû.

Piştî sê rojan jineke dirêj, spehî û esmer hat cem min. Wê ji jor ve û bi xwe bawer mêze dikir, di rûyê wê de tehrîkkariyek xuya dibû. Hereketên wê li hember min bi temamî bi rêk û pêk bûn. Wê gavê ku min ew nas nedikir û

nedizani ka ew ki ye, min ji we re got 'xanim'. Le we got:

-Heke tu beji Rose, bes e.

Me dest bi axaftine kir.

- Belê, Rose, herhal tu dizani ka çima min gazî te kiriye.

- Belê, min hayî jê heye.

- Pirr baş e. Û tu pê naêsi, ... bê huzûr nabî?

- Na, na. Ev dibe hevduberdana heştemîn ku ez pêk tînim. Ji min re ne xerîb e; ez fêrî karê xwe bûme.

- Gelekî baş e. Bi ya te wexteke dirêj divê?

- Bi rewşa mêrê te ve girêdayî ye; piştî ku ez pênc deqîqeyan li cem wî biminim, ez dikarim bersîvekê bidim xanimê.

- Tu dê di midetke kurt de wî bibîni. Lê divê tu zanibî ku ew ne mirovekî li hev e.

- Xem nake, ne girîng e. Piraniya wan yê ku min ji hev veqetandin kesên gelekî zîst bûn. Min dixwest ez bipirsim, gelo te derheqê parfuma wê de çu agahdarî bi dest xistin?

- Belê, ez dizanim, Rose; navê parfuma wê *Verveine* ye.

- Pirr baş e, ez ji bêhna wê parfumê gelekî hez dikim. Ma xanim dizane, gelo dosta mêrê te kincên binî yê hevrîşimî li xwe dike an na?

- Na, ew patîska yê bi tentene û perçimî li xwe dike.

- Ne bêje, xuya ye jineke kubar e. Modeya hevrîşimê li ber kêmbûne ye.

- Belê, rast e.

- Wê gavê çêtir e ku ez dest bi karê xwe bikim.

Wê dest bi karê xwe kir; mirovî digot qey di jiyana xwe de ji bilî xizmetkariyê tiştekî din nekiriye.

Piştî saetekê mêrê min hat malê. Roseê tew li aliyê wî jî mêze nekir; lê wî nedikarî awirên xwe ji wê bi dûr bixe. Bêhna parfumê, -Verveine- ji wê difûriya. Piştî pênc deqîqeyan xizmetkar ji odeyê çû derve.

Wî tavil pirsî:

- Ew keçik ki ye?

- Ew? Xizmetkara min ya nuh e.

- Te ew ji ku anî, çawa peyda kir?

- Baronessa *de Grangerieyê* ew ji min re peyda kir. Tawsiyeyên wê yê hêja hene.

- Himm. Gelekî spehî ye.

- Spehî ye?

- Belê, yanî wek xizmetkarekê.

Ez gelekî kêfxweş bûm. Ji niha ve ew ketibû dehfikê. Her wê êvarê Roseê ji min re got:

- Ez soz didim te ku ji çardeh rojan zêdetir dê najo. Mêrê te li ser dehfikê ye.

- Ma te xwe ceribandîye?

- Na, lê tiştê wisa mirov bi nêrînekê fêrî dike. Ji nuha ve gava em li korîdorên pêrgî hev tînin dilê wî heye ku min ramûse.

- Wî ji te re tiştê gotîye?

- Na, tenê ji min navê min pirsî; ji bo ku bibihîze ka dengê min çawa ye.

- Baş e, Rose, lê bixebite da ku gaveke zûtir tu bigehî encamekê, keçîka şêrîn.

- Weyy, xanim tu qet meraq neke. Ez tenê ji bo dema pêwîst xwe radigirim da ku mêrê te nefikire ku ez bi rehetî tîme bidestxistin.

Piştî heşt rojan hema bêje mêrê min nema diçû derve. Li malê, vir ve wê ve diçû û dihat; gava min dixwest ez herim derve, nema dibû astengê min jî. Ez jî -ji xwe- ji sibeyê heta êvarê li derve bûm da ku ew li malê -azad- be.

Êvara roja nehemîn gava Roseê ji bo xemilandinê alîkariya min dikir, bi awayekî şermoke ji min re got:

-Ew tişt serê sibeyê qewimî, xanim.

Ez piçekî şaş bûm, belê, piçekî hêrs bûm; ne ji bo tiştê qewimî, lê ji ber awayê gotina wê.

Bi kêtekirinê min got:

- Û baş-der-bas-bû?

- Belê, gelekî baş. Ev her sê rojên dawiyê wî çu rehetî neda min, lê min nedixwest; ez difikirîm ku hîn zû ye. Niha xanim, tu bi xwe karî biryarê bidî, ma tu kîjan rojê dixwazî bi ser me de bigrî?

- Ka ez mêze bikim; roja pêncşemê çawan e?

Gelekî baş e. Ango roja pêncşemê. Çêtir e heya wê rojê ez xwe giran ragirim da ku ew bêtir sor(teşwîq) bibe.

- Ma tu jê bawer î ku tu dê serfiraz bibî?

- Ohoo, ez sedî sed bawer im. Ez dê welê baş lê bixebitim ku ew dê bes wek daxwaza min bilive. Kîjan dem, saet?

- Em bêjin saet pênc.

- Saet pênc. Li ser pêncan me li hev kir. Û em li ku bin?

- Li ku bin? Li vir, li odeya min.

- Pirr baş e. Ango li odeya xanimê.

Belê, delala min, niha yê mayî tu bi xwe dikarî texmîn bikî. Ez çûm, min dê û bavê xwe, mamê xwe *d'Ovelin* û assesor* Rapplet, dostê mêrê xwe, anîn. Min ji wan re negot ka mesele çî ye; min ew hemî bi awayekî bêdeng birin ber deriyê odeya xwe, ez sekinîm heya ku saet bû pênc; bi lédana zengilê saetê re dilê min ecêb fikir kulpînî! Min dergevanê bînayê jî wek şahidekî zêdetir anîbû. Tam di saet pêncan de min derî vekir. Teew! Teew! Teew! Tam di wextê wî de li nîva hedefê. Êdî tu şiklê rûyê wî bifikire! Gava ku wî ehmeqî serê xwe zîvirand, divê te rûyê wî bidiya! Bi Xwedê pirr komîk xuya dikir. Ez keniyam û keniyam. Bavê min gelekî aciz bû û dixwest li mêrê min bixe. Gava ku me li wan mêze dikir; dergevanê bînayê jî tirsî ku dê ji karê xwe bibe, alîkariya wî dikir da ku ew cilên xwe li xwe bike! Wî sîrebendê mêrê min şidand. Wey Xwedê, çî komîk bû! Û Rose, yekta bû yekta. Ew digiriya, wisa ji dil digiriya ku mirovî jê bawer dikir. Keçikeke pirr spehî ye, heke rojekê, tu jî bikevî rewşeke wekî ya min, bila ew keçik di bîra te de be!

Û niha ez li vir im. Ez bi lez û bez hatim vir da ku her tiştî jî te re bêjim. Ez azad im. Bijî hevduberdan!

Û gava wê li odeyê dest bi reqsê kir; baronessa piçûk bi xeyal û acizbûnê miremir dikir:

- Çima te gazî min jî nekir da ku ez jî bibînim?

Wergera ji swêdî:
Serdar Roşan

Guy de Maupassant nivîsevanekî Frensî ye. Ev novel jî pirtûka "Upplagd för Kärlek" ya bi swêdî hatiye wergerandin.

* Assesor: Karbidestê ku endamê meclisa bajêr an jî dadgehekî bilind e.

Çend nivîs ji perîyodîkên Kurdî (1908-1963)

Di vê hejmara Çirayê de, ez ji hin rojname û kovarên kurdî yên kevn çend nivîsan wek nimûne pêşkêş dikim. Wekî ku di binê nivîsan de jî hatiye nivîsîn min ew ji kovar û rojnameyên *Kürd Teaviün ve Terakki Gazetesi* (1908), *Bangî Kurd* (1914), *Têgeyiştinî Rastî* (1918), *Kurdistan* (1919), *Pêşkewtin* (1920), *Bangî Kurdistan* (1922), *Rojî Kurdistan* (1923), *Bangî Heq* (1923), *Umêdî İstiqlal* (1923), *Jiyaneve* (1925) û *Dicle-Firatê* (1963) girtine û ji herfên erebî wergerandine ser herfên latînî (eslê nivîsa Edîp Karahan bi herfên latînî bû). Ji wan, du nivîs jî min ji tirkî wergerandine.

Ev kovar û rojname di navbeyna salên 1908 û 1963'yan de, li Silêmanî, Îstanbul û Bexdadê derketine.

Carna min bi notan derheqê nivîsan de hin agahdarî dane. Notên ku ne yên min bin, yên nivîskarên din bin, min navê nivîskarê wan nivîsiye.

Malmîsanij

1-EY GELÎ KURDAN! ¹

Hişyar bin, evê firseta ha ya tereqqîyê wunda nekin. Tereqqî dibêjine zanîna sen'et, me'arîf, xwendin û xûşderbazkirina [xweşderbazkirina] wilayeta.

Îttihad dibêjine îttifaqa bo wilayeta xwe ra bira Fille be (?). Lakin dîn jî hemû tiştî muşerreftir e. Lazim e şerî'et çi emr kiriye, bi wê rê herin. Şerî'eta Mihemmedî zilm, xedr, dizî, talan, xirabî bêtifaqîyê men'i kiriye.

Heta nuha wan zalimê memûra hemû şûl bi me kirin, bi me dane kirinê jî Xudê kerem kir hurriyet derket. Hurriyet mîna Çiyayê Qaf ketiye pêşîya hemû xirabiya[n] bi wê şertê em dînê mubînê Ehmedî mihefeze bikin; daîra dîn da hemû şûlê qenc welatîyê xwe ² yê Filla ra xûşderbazkirin Xudê li me emr kiriye, lewra xerac didina [didine] hukûmetê. Herçî kesê emrê hukûmetê nekire dînê wî zi'îf e. Xudê emr kiriye "Utî'ûllahe we utî'û'r-resûle we ûlî'l-

emre mînkum”. Dîndariya Kurdistanê li hemû ciya tune.

Dizî, talan, bêttifaqî şerîetê da heram e. Hukûmetê jî men’î kiriye. Misilmanê [ku] daîma li heramîyê bixebite iflah nabe. İstibdad ji we ra nîşaneyek (?) e. Zemanê istibdadê çiqas xirabî dibû, lewra memûrêd me ekser dînê wan ze’îf bû.

Ji îro paş eger zilm, xedr bi we kirin, we talan kirin³ Cem’iyeta Kurdistanê lewra⁴ eger memûrake [memûrekî] xirab, xaîn ji we ra şandin yan kesekî li we zilm kir hûn halê xwe ’erzî hukûmetê bikin. Eger li halê we nepirsîn wê weqtê binivîsine İstanbûlê bi navê Cem’iyeta Kurdan⁵ ewê li halê we bipirsîn. Cem’iyet jî li ser fikra hukûmetê ye. Ha xirabî qebûl nake. Lazim e hûn îta’eta emrê hukûmetê [bikin û] bi welatîyê xwe ra [ji bo] qenc derbazkirinê bixebitin. Hukûmet ji xeyrî qenciyê tiştê nabêje we. Emanetê we ittifaq, ittifaq, ittifaq.

Ey gelî Kurdan,

Hûn qenc bizanin ku welatê me bi îttihadê û xûşderbazkirinê⁶ ewê zêde bike. Riya rehetî daîma îttihad e. Lewra heya niha ’alemê digo ”Kurmanç⁷ ji medeniyetê dûr in”. Sebeba ewê jî bêttifaqî[ya] berê bû. Eve çar mah [meh] e Xudê kerem bi me kiriye. Îro ne ew roj e ku bi ew (?) ra neyê xûşderbazkirin. Xelqê bi îttihadê welatê xwe ava kirin. Ji îro paş lazim e bi sin’et û ’emelê qenc hûn nav bidine ’alemê. Ew exlaqê qenciyê ku li nik Kurdan e li cem tu qewmî tune. Ew jî diyanet, sdaqet, zekawet, ’iffet ku namûs e. Ew exlaqane diya hemû tereqqiyat e, diya hemû qencîyan e. Zemanê berê ku zilm, xedr dibûn jî weqtê ew memûrê xaîn bi me wane kirin. Ev çar mah [meh] e dînê Mihemmedî şu’le daye hemû deran. Hemû xelq bi halê me îro bexîlî dika [dike]. Lazim e hûn jî boy tereqqiya welatê xwe xirabî[ya] xaînê di berê bi carekê⁸ ji bîr bibin [bikin], bi hev ra wekî bira derbaz bikin. İttihad sebebê zêdekirina Kurdistanê ye. Hûn binêrin welatê me, Fille sin’etê qenca [qenc] dizanin çi dikin. Em ji wî sin’etê bêpar in. Sebeba ew bêpariya ma [me] bêttifaqî ye. Lazim e hûn [li] welatê xwe Fille ra qenc derbaz bikin. Hûn jî wekî wan sifet û ’emelê baş hîn⁹ bin. Çi jî dikin hûn temamen bikin. Li Wanê zêrkerî çiqas nav daye ’alemê, necarî çiqas nav daye ’alemê. Gelo ji Kurda[n] kesek heye ku wan ’emela[n] wekû wan bîne meydanê. Xirabiya berê bîrkinin lazim e. Boy welatê xwe ra qencderbazkirin lazim e ku navê wehşetê ser Kurda rabe. Milliyetekî mutedeyyîn, saxlem çi ra bi bêttifaqî xwe nik¹⁰ ’alemê bike wehşî. Qencî bi xûşderbazkirinê dibe. Eman[et]ê we qencî, qencî, qencî*.

Seyyah Ehmed Şewqî

*Kürd Teavün ve Terakki Gazetesi (Cemiyetin vasıta-i neşr-i efkârıdır), İstanbûl, no: 1 (22 Teşrin-i sani 1324/11 Zilka’de 1326 [1908]), s. 7-8

(1)Di eslê vê nivîsê de, di ciyê herfa "V" de herfa "waw", di ciyê herfa "G" de herfa "K" hatiye nivîsîn.

(2)Di eslê vê nivîsê de, kelîmeya "xwe" carna wek "xwe" (xwh), carna wek "xwa" carna jî wek "xu" (xw) hatiye nivîsîn, lê min hemî wek "xwe" nivîsîn.

(3)Di eslê nivîsê de li vir nuqte hatiye danîn.

(4)Di eslê nivîsê de li vir nuqte hatiye danîn lê wekî ku tê fêmkirin di vê cumleyê de kêmasî heye.

(5)Mebest jê "Kürt Teavün ve Terakki Cemiyeti" ye.

(6)Di eslê nivîsê de, di ciyê "derbaz" de carna "derwaz" hatiye nivîsîn, lê min hemî wek "derbaz" nivîsîn.

(7)Li hin derên Kurdistanê, di ciyê "Kurmanc" de "Kirmanc" jî tê gotin.

(8)Di eslê nivîsê de, ev kelîme bi herfên erebî wisa hatiye nivîsîn: çarpkî.

(9)Di eslê nivîsê de li vir herfa "waw" jî heye.

(10)Di eslê nivîsê de, ev kelîme bi herfên erebî wisa hatiye nivîsîn: lyk.

2-LISÂNIMIZ KÛRTÇE: MEKTUB-U MAHSÛS¹ [ZÎMANÊ ME KURDÎ: NAMEYA TAYBETÎ]

Sed hezar silav² û merheba li (?) Cem'iyeta Te'awun û Tereqqîya Kurmanca

Ey merdên 'alîhîmmet, tac[a] serê me Kurdan
..³ hûn bûne sebaba def'a cehlê ji 'alemê,
Va⁴ hûn bûne delîla neşra 'ilmê di 'alemê,
Da hûn bibin tebîb û dermanê kullî derdan

* * *

Îro gelek pîrr neş'e me; ji feyza xezeta⁵ hewe
Hêvîya mirî dilê me da, lewra ku⁶ îro rabî
Derket navê me qenc, ji wan defterên xirabî
Mane hemî wilayetê me jî li minneta hîmmeta hewe

* * *

Bi van hêstirê[n şadî ku jî çavê min dibarî
Eger qelem bikare neqş kit hisandina dilê min
Bo pîroziya tifaq û cerîda wilayetê min
Dê sed hezar kitaba[n] binivîsim û bikim diyarî.

Ey Cem'iyeta bilindhîmmet, şertê mezinahîyê dîlnizmî ye! Ser rûperra vê

kaxezê wekî sê piç beytek, li pêroziya Cem'iyetê û teb'a xezeta Kurda[n] re şandina min, ji bo xatira qesta Silêman û mûrîyê qebûl bikin.

Eger munasib e ji bo meqседа şîreteke ji wilayetê me ra, wan çar xeberên ha jî bi qezeta⁷ Cem'iyetê neşr bikin. Zarok, ku izna ştexaliyê ji nû bistîne [bistîne], enceq evqas li hev bîne[bîne]. Înşaallah roj bi roj bi saya hîmaye û terbiya we mezina[n] emê bi'elimîn û qenc bibîn mirov*.

Diyarbakir'den Telxrafî Mihemed Tahir Cizîrî

*Kürd Teavün ve Terakki Gazetesi (Cemiyetin vasita-i neşr-i efkârıdır), İstanbul, no: 6 (27 Kanun-u evvel 1324/17 Zilhicce 1326 [1909]), s. 47-48

- (1)Navê nivîsê di eslê nivîsê de tenê bi tirkî bû.
- (2)Di eslê vê nivîsê de, di ciyê herfa "V" de carna herfa "waw", carna jî "F" hatiye nivîsîn.
- (3)Li vir kelîmeyek nehate xwendin.
- (4)Ev kelîme di eslê nivîsê de bi herfên erebî wisa hatiye nivîsîn: wy. Loma dikane wek "wey" û "wa" jî bête xwendin.
- (5)Di eslê nivîsê de, di ciyê herfa "xeyn"ê de "herfa "'eyn" hatiye nivîsîn.
- (6)Di eslê nivîsê de, ev kelîme bi herfên erebî wisa hatiye nivîsîn: kh.
- (7)Li jorê, ev kelîme wisa hatibî nivîsîn: "xezeta".

3-GELÎ BIRAKÊN 'EZÎZ Û GELÎ KURMANCA!¹

Hûn hemî zanin, hukûmeta me berî nihû hukûmetekê mustebid bû! Ji pênc heyva bi hir da hukûmetek meşrû' û meşrûte ye. Lakîn tehqîq hindek ji we, çunkî hukûmeta kevn, weke mal û canê we, 'eql û çav û guhê we jî talan kiribî. Hûn nizanin, di mabeyna va her du hukûmeta ferq çi ye, û me'na istibdad û hurrîyetê çi ye?

Hindekê dî qenc weke şeytana dizanin welakîn ew îdara mustebid çêtir muwafiqê 'îş û menfe'eta wa[n] bî. Çunkî her yekî ji wan bi sûreteke bêînsafî qetek ji laşê diya me -ku weten e- û qismek ji yetimên wî wetenî -ku xweh û birayên me ne- nav pençeyê xwe² da zebt kiribîn û weke gurên har, ber diranê xwe de digemirandin.

Qismê sisiyan, ji etba' û me'iyetê wan qatila, wan zaliman e; 'eynî mîna tajî û tûla[n], bi xizmeta wan nexçîrvanê [nêçîrvanê] bêînsaf keyfa wan dihat.

Ev her du qîsm, neyarê dîn û 'eql û 'ilm û çav û mal û canê me ne! Ew bi xwe ked û kesbekê nakin, ked û kesba me ji me distînin. Sal diwazde mah

[meh] me dikir, wan dixwarin. Dijî hurriyet, em ji xwandina 'ilmî men'i dikirin da [ku] em ef'alê wan nezanîn. Em ji 'îbadeta Xudê men'i dikirin da [ku] em ji wan tinê bitirsîn, îta'eta wan bikîn. Çunkî dizanin Misilmanekî xas û muxlis hurr e, mutewekkîlê Xudê ye, ji tu 'ebda[n] natirse û ji xeyrê Xudê 'îbadet û ta'eta tu 'ebda[n] nakit, nabit esîrê tu kes!!! Me ji gerê, ji dîtina dinê men'i dikirin da [ku] em welatê xelqê nebînîn³ û welatê xwe weke wa[n] ava nekîn. Hasilî me ji hemî tiştan men'i dikirin. Da [ku] em ji xeyrê wa[n] kesekî, şey'eki nas nekîn, nezanîn; esîrê wa[n] bîn. Li daîre[y]ên hukûmetê ji bona cînayetekê sed ji me bi carekê⁴ mehkûm dikirin da [ku] em nekarîn biçîn bajarê xwe jî. Herçî hukûmet bû, ew jî menfe'eta xwe ra mu'înî wan zalima[n], wan murtekiban bî! Ez nahiyeyekê 'îbaret ji neh, deh gunda[n] nas dikim, ji qalûbelayê de nebûne xudî pênc sed peza[n]; ew her sal deh, pazde hezar pez li ser wan dinivîsîn û qemçûra wa[n], baqî dihiştin û muqabilê wa[n] peza[n] çar sed ew qedêr ji exnamê qezayê kitm û rusûmatê (?) wa[n] îxtilas⁵ dikirin. Bi vî sûretî her sal ewqas heqê beytulmal û millet telef dibî. Eger ji bo tehsîlatê memûrê hukûmetê biçû[ya] nava nahîyeyê, eger bi wa[n] re 'eskerê zehf⁶ hebûya, gundî hemî direviyan serê çiya[n]. Eger hindik bûna, nedihîştin bikevin nav gund; şer dikirin, derdixistin. Eger ne pir ne hindik bûna, ye'nî muqabilê hev bûna, axayê nahîyeyê xulamê xwe û tehsîldara bi hev ra bera nava gund bida, ji ..⁷ xelas bikiran[a]. Herçiqas, mesela sed hezar tehsîl kirin, pêncî axê ji xwe re hilaniya, sih lîre li tehsîldar û 'eskera[n] belav bikira, bîst lîre enceq dihat sindûqa hukûmetê. Ji axa hetta gavan hemî mehkûm kiribîn. Da [ku] kes neyê pirsra ..⁸ xwe li hukûmetê nekit. E'şar û tekalîfê wê jî li vê qiyas bikin. Elhasil bi navê tekalîfatê beytulmal herçend pereyên bihata tehsîl kirin, herçendî didan mesref û me'aşê 'esker û memûr û cendirma welakin ew 'esker [û] memûr ji dêl îdara mulk, muhafaza weten û te'mîna asayiş û muhafaza huqûqê feqîra[n] enceq di xirabiya welat⁹, kuştin û şêlandina feqîr û ehaliya îstixdam dikirin. Heç wekî millet başqe, hukûmet başqe, her du neyarê hev bîn. Gerek ji vê sebebê û gerek ji sebeba fesad û bêittifaqiya 'eşîra[n] û bê'eqliya me ehaliya, hukûmet[ê] ji alîkî em xirab¹⁰ kirin, me xwe bi xwe ji terefekî hev xirab kir. Îro di welat da hûn ji xirba avahîkê, ji hezar feqîra[n] dewletlîkî, ji deh hezar cahila 'aqilekî nabînin!

Ev qanûn[a] esasî -ku çar ruknê wê; hurriyet, 'edalet, uxûwwet, musawat e û muwafiqê emrê Xudê û şerî'eta pêxember e- sed hezar rehmet li erwahê wan û tewfîqa Xudê te'ala her alîkarê wan bit! Cem'iyeta Îttihad û Tereqqiya 'Usmanliya bûne sebeba îstirdadê¹¹ hurriyeta me. Xudê wan ji serî kême neke. Îcar hukûmet û millet hemî bîn yek, heqê kîçik û mezina[n] miqabilê qanûnê, bi mûcibê emrê Xudê muhafaze bî. Emma garanek ji wan zalimê mustebîd û memûrên murtekîb dîtin [ku] muqabilê ronahiya 'edaletê ra hêdî nikarin dizî, fisq û fucûra xwe bikin û bisitirînin. Bi van texlît, dest bi hîla[n] û seytaniya[n] kirin; ji serê ewilî gotin emê ho bikin û ho bikin, bi zirt û pirta[n]

ehlê hurriyeta[n] tirsandin, neçû serî. Paşê îftira û bêbextî li padişah kirin, gotin: Sultan 'Ebdulhemîd hurriyetê qebûl nake, heman fîrsetek bi destê wî bikevî, wê car dî qanûna esasî hilîne û derewan [derewên] wa[n] jî ji xeyrê rûreşîya wa[n] tiştêk hasil nekir*.

(Maba'dî var.)

Muhammed Tahir Cizîrî

*Kürd Teavün ve Terakki Gazetesi (Cemiyetin vasita-i neşr-i efkârıdır), İstanbul, no: 6 (27 Kanun-u evvel 1324/17 Zilhicce 1326 [1909]), s. 48

- (1)Di eslê vê nivîsê de, di ciyê herfa "V" de herfa "F", di ciyê herfa "G" de herfa "K" hatiye nivîsîn.
- (2)Di eslê vê nivîsê de, carna kelîmeya "xwe" wek "xwa" hatiye nivîsîn lê min hemî wek "xwe" nivîsîn.
- (3)Di eslê nivîsê de, nuqçeya "nûn" a vê kelîmeyê tune.
- (4)Di eslê nivîsê de ev du kelîme bi van herfên erebî hatine nivîsîn: byçarky.
- (5)Îxtîlas kirin: dizîn, dizî kirin
- (6)Di eslê nivîsê de ev kelîme bi herfên erebî wisa hatiye nivîsîn: zxfy
- (7)Li vir du kelîme nehatin xwendin.
- (8)Li vir kelîmeyek nehat xwendin.
- (9)Di eslê nivîsê de ev kelîme bi herfên erebî wisa hatiye nivîsîn: walat
- (10)Di eslê nivîsê de ev kelîme bi herfên erebî wisa hatiye nivîsîn: xram
- (11)îstîrdad: paşde girtin, bidest xistin

4-LİSÂNİMİZ KÜRTÇE:

WETEN Û ÎTTİFAQA KURMANCA[N]¹

Weten, tu çîqa 'ezîz î, tu çîqa letîf î. Lalezarê te ji xûna şehîdan e, sinbil² û reyhanê te ji rindiya çavê³ 'egîdan e. Wextekî her terefê te ava bû, her koşeyê te mecme'ê suwaran bû, dar⁴ û berê te menzilê xortan û lawan bû, deştê[d] te bi cotyaran, zozanêd te bi konan, newalêd te bi kerî[yêd] pezan, mêngêd te bi refê hespan, guhêr û mexelêd te bi bêrivanan xemilî⁵ bû[n]. Her alî te wekî cenneta derewî[n] bû. Ne di dilê me da kederek⁶, ne di terşê me da kêmasiyek hebû. Nagâh tofan[a] zilm û îstîbdadê muselletê te bû. Ewladê te kuşt, her terefê⁷ te xera kir, tê da eserê şahî û bextiyarî nehişt.

Weten, tu îro ji destê zilmê wêran î. Meskenê bûman û maran⁸ î. Ewladê te sefîl û perîşan e. Jin û zaroyê wan tazî û birçîye.

Weten, felaketa ha ji nezaniya me Kurma[n]can bû. Hukûmeta zalim me Kurma[n]can muselletê hev kir, dersê kuştin û talankirinê da [me]. Me jî ji bo xatirê⁹ wan zaliman, ji bo dilxwastê wan fir'ewn û Şeddadan xanûmanê xwe¹⁰ şewitand.

Îro jin û zarûyê wan zaliman di koşkan da bi rahatî û bi dilxweşî 'umrê xwe diborînin. Jin û zaroyê me ji tazîti û birçîti li ser 'erdê sar, li bin berf û baranê dinalin.

Eger memûrêd zalim bi zilm[a] fir'ewniya xwe bi xirabkirina wetenî, bi perîşankirina ewladê wetenî qena'et bikiran[a], ji bo me Kurma[n]can se'adeteke mezin, mirovaniyeke bilind dê biwaya (?)¹¹. Hal ew ku ji alîyek ûrt û ocaxê me diqelandin, jinê[d] me jinebî, zarûyêd me sêwî dihiştin, ji alî dî me di nezera 'alemê da eşqiya û bêqabiliyet nîşan didan.

Ah wan zalima[n] ewwil[î] me Kirma[n]can ji xwendin û nivîsandinê, paşê ji təcîrî û ji cotyariyê mehrûm hiştin, paşê her çi xwestin derheqê me da îcra kirin û digotin, Xudê û pêxember bîra xwe neanîn.

Bi hîmmeta Cem'iyeta Îttihadê, bi mu'aweneta 'eskerî qanûna esasî derket, belayê zulmê ji ser me rabû. Meb'ûsa muhterema¹² civiyan û [di] Meclis[a] Meb'ûsan da¹³ halê wetenî dê bêjin. Xudê heman tewfîqa wan bide, çavê xainan kor bike.

Kurmanc, di nav qewmê 'Usmanî da 'unsurek mazin e. Dîndar e, ciwamêr e, jêhatî ye. Kîjan qîrîn bûye ku suwarê wan, 'egîdê wan di serheda weten da xûya nebûye? Ji bo hifza wetenî, ji bo şerefa milletî, ji bo bilindiya diyanetê xûna xwe nerêtiye, ji meydana qîrînê rûyê xwe zivirandiye; hemîyyeta xwe, xeyreta xwe, dîndariya xwe nîşan nedaye, ji bo tarîxan navek qîmetdar nehiştiye?

Feqet hukûmeta mustebida[n] mêraniya¹⁴ me, zekaweta me daîma înkâr kir. Nef'a xwe di îxtifa me da dî[t]. Me jî ji nezaniya xwe xeberê[n] wan kirin, xanûmanê xwe xira kir, rûhê bab û bapîrê xwe mehzûn kir, dilê zaliman şa kir.

Ji vî halî 'îbret bistînin, wekî 'Ereban, wekî Tirkan, wekî Arnawudan, wekî Rûm û Fillan bixebitin, cewherê xwe bidine naskirin.

Qewmê necîbê Arnawud çawan de'waya xûn a sedsale [ya] xwe terk kirin, destê hev¹⁵ girtin, qîmeta xwe, mêraniya xwe dane zanîn, em jî wekî wan de'wa xûnê, de'wa neyarî[yê] hilînin, birayê hev bibin, şerefa Kurmancî muhazeze bikin, bi mal û bi can bixebitin, wetenê xirab ê xwe ava bikin!

Gelî Kurma[n]can! [Ji] wetenê xwe hez¹⁶ bikin, çunkû muhebbeta wetenî ji îmanê ye.

Gelî biran! Dijminî û neyarî ji dilê xwe derxin, aşt bin, bi hukmê "Înneme'l-mu'mînûne îxwetun"¹⁷ 'emel bikin.

Gelî hevalan! Mekteban vekin, ewladê xwe bidine xwendin, 'arê nezanî li ewladê xwe layiq mebinin, çunkû emrê "Utlîbu'l-'îlme"¹⁸ mîne'l- mehdî îla

lehdî” li me ferz e.

Ey ’ulemayê navdar, ey meşayîxê xudanîqtidar, ey ruesayê sahibnufûzê Kurma[n]can! Hûn qenc bizanin ku heyata qewmê me, selameta wetenê me di îttifaqa, di xeyreta we da ye. ’Adetê berê terk bikin. Kurma[n]can bi hev bixin, ji wan ra ji qencî û xirabî bêjin. Çunkû hûn zana ne, ew nezan in. Delalet bikin û delaleta we [bila] ji bo nef’a wetenî, ji bo tereqqiya milletî be, ji bo nefsa we nebe¹⁹. Roja heşrê bîra xwe bînin. Dinyaya fanî da navê xwe bi qencî baqî bikin. Hukmê ”Ehsen²⁰ kema ehsenellahu îleyke” ji ’eqlê xwe der mexin!

Motki aşiretinden Halil Hayalî*

[Ji eşîra Motkî Xelîl Xeyalî]

*Kürd Teavün ve Terakki Gazetesi (Cemiyetin vasîta-i neşr-i efkârıdır), İstanbul, no: 8 (10 Kanûnî sani 1324/1 Muharrem 1327 [1909]), s. 69-71

TERCÜME

[VATAN VE KÜRTLERİN İTTİFAKI]²¹

Vatan, sen ne kadar mukaddes, ne kadar latîfsin. Lâlezârın hûn-i şühedâdan, sünbül ve reyhânın letâfet-i vech-i şüc’ândan mürekkebdır. Bir vakitler cevânib-i erba’an birer ma’ûmezâr, her köşen süvârişlere bir mecmâ’-ı, eşcâr ve cibâlin gençlere, babayığitlere birer melce’ idi. Ovaların çiftçiler ile, yayalaların çadırlarla, derelerin koyun, mer’âların at sürüleriyle, mandelerin[mandıraların] süt sağan genç kızlarla müzeyyen bir cennet idi. Ne gönlümüzde bir keder, ne de malımızda bir noksan var idi. Ansızın tûfân-ı zulüm ve istibdâd sana musallat oldu. Evlâdını öldürdü, her tarafını tahrîb etti, bir yerinde âsâr-ı meserret ve saâdet bırakmadı.

Vatan, sen bugün zulüm ve istibdâd yüzünden bir harabezârsın. Baykuşlara, yılanlara me’vâsın. Evlâdların sefil ve perişân, aç ve çıplaktır.

Vatan, senin bu felâketlerin bizim cehâletimizden neş’et etmiştir. Hükûmet-i müstebide bizi yekdiğerimize taslît etti, katli ve ğarât dersini öğretti. Biz de cehâletimizden o zâlimlerin hâtırı, o firavun ve Şeddâdların arzû-yi kalbisi için hanümânımızı²² yaktık.

Bugün o zâlimlerin evlâd ü ıyâli köşklerde râhatla, gönül hoşluğuyla imrâr-ı hayât ediyor. Bizim evlâd ü ıyâlimiz ise açlıktan, üryânlıktan soğuk yerlerde yağmur ve kar altında inliyor.

Eğer me’ûrîn-i zâlîme, o zulm-i firavunîleriyle yalnız vatanın tahrîbi,

evlâd-ı vatanın ducâr-ı perîşânî olması ile iktifâ etseydi biz Kürtler bunu yine bir saâdet, bir insâniyet telakki edebilirdik. Halbuki bir taraftan hanümânımızı imhâ ediyor, kadınlarımızı dul, çocuklarımızı yetim bırakıyor; diğerk taraftan bizi alem nazarında eşkiyâ ve kabiliyetsiz gösteriyor idi.

Ah bu zalimler evvelâ biz Kürtleri okuyup yazmaktan, sonra ticâret ve zirâattan mahrûm bıraktılar, sonra da hakkımızda istediklerini icrâ ettiler, aksi[ni] söylediler, Allah'ı ve peygamberi hatırlarına getirmediler.

Cemiyet-i İttihâdiye'nin himmeti, askerimizin muavenetiyle kanûn-i esâsî neşr ve belâ-yı zulm ve istibdâd üzerimizden ref' olundu. Muhterem meb'ûslarımız toplandılar, Meclis-i Meb'ûsân'da ahvâl-i vatanı söyleyeceklerdir. Hemân Allah onlara muvaffakiyyet virsün, hainlerin gözünü kör itsün.

Kürtler akvâm-ı Osmaniye arasında büyük bir unsurdur. Diyânet, şecâat ve sahâvet, meziyet ile muttasıftır. Hangi bir muhabere olmuştur ki Kürt süvarîleri, Kürt babayığitleri hudûd-u vatanı görünmemiş, vatan-ı mukaddesin muhâfazası, milletin şerefi, diyânetin müte'âlisi için kanını dökmemiş, meydan-ı harbden yüzünü çevirmiş, hamiyetini, gayretini, muktezâ-yı diyânetini göstermemiş, tarihlere kıymetli bir nâm bırakmamıştır?

Fakat hükûmet-i müstebide bizim şecâatimizi, kâbiliyetimizi, zekâvetimizi inkâr etti. Kendi fâidesini bizim ihtilâfımızda gördü. Biz de cehâletimizden sözlerini tuttuk, hânümânımızı yıktık, âbâ ve ecdâdımızın rûhunu mahzûn, o zâlimlerin kalbini tesrîr ettik.

Bu hallerden ibret alalım, Araplar, Türkler, Arnavutlar gibi çalışalım, cevher-i zâtimizi gösterelim.

Arnavut kavmi necîbi nasıl yüz senelik kan davâlarını terk, yekdiğerkine dest-i uhuvveti uzatmakla kıymet-i zâtiye ve şecâat-i cibilliyelerini izhâr ettiler, biz de onlar gibi kan davâlarını kaldırıp kardaş olalım, Kürtlük şerefini muhâfaza edelim, cân ve malımızla muhâfaza-i vatana çalışalım!

Ey Kürtler! Vatanınızı seviniz, çünkü muhabbet-i vataniyye imândandır.

Ey kardaşlar! Adâvet ve husûmeti kalbinizden çıkarınız, barışınız, "İnneme'l-mü'minune ihvetun" hükmünü nazar-ı dikkate alınız.

Arkadaşlar! Mektebler açınız, evlâdınızı tahsil-i ilme çalıştırınız, cehâlet ârını onlara lâıyk görmeyiniz, çünkü emr-i "Utlibu'l-ilme"²³ mine'l- mehdi ila lehdi"ye imtisâl bize farzdır.

Ey meşâhir-i Osmânî, ey meşâyih-i sâhibiktidâr, ey rüesâ-yı zînüfûz-i Ekrâd! İyice biliniz ki kavmimizin hayâtı, vatanımızın selâmeti sizin ittifâkınzdadır, gayretinizde, hamiyetinizdedir. Âdât-ı kadîme-i reddiyei terk ediniz. Efrâd-ı Ekrâd-ı barıştırınız, hayır ve şerri onlara anlatınız. Zîrâ siz âlim, onlar cahildirler. Delâlet ediniz, delâletiniz vatanın fâidesine, milletin terakkiyâtına âid olsun, nefsiniz için olmasın. Kıyâmeti hâtırınıza getiriniz. Bu alem-i fânîde nâminızı iyilikle ibkâ ediniz. "Ehsen kema ehsenellahu

ileyke” ayet-i kerîmesinin hükmünü aklınızdan çıkarmayınız*.

Motki aşiretinden Halil Hayalî

*Kürd Teavün ve Terakki Gazetesi (Cemiyetin vasıta-i neşr-i efkârıdır), İstanbûl, no: 8 (10 Kanûnî sani 1324/1 Muharrem 1327 [1909]), s. 69-71

- (1)Di eslê vê nivîsê de, di ciyê herfa "V" de herfa "F" hatiye nivîsîn.
- (2)Di eslê nivîsê de ev kelîme bi herfên erebî wisa hatiye nivîsîn: sbnl.
- (3)Di eslê nivîsê de ev kelîme bi herfên erebî wisa hatiye nivîsîn: caf.
- (4)Di eslê nivîsê de ev kelîme bi herfên erebî wisa hatiye nivîsîn: dad.
- (5)Di eslê nivîsê de ev kelîme bi herfên erebî wisa hatiye nivîsîn: zml.
- (6)Di eslê nivîsê de ev kelîme bi herfên erebî wisa hatiye nivîsîn: kryk.
- (7)Di eslê nivîsê de ev kelîme bi herfên erebî wisa hatiye nivîsîn: traf.
- (8)Di eslê nivîsê de ev kelîme bi herfên erebî wisa hatiye nivîsîn: mararan.
- (9)Di eslê nivîsê de ev kelîme bi herfên erebî wisa hatiye nivîsîn: xath.
- (10)Ev kelîme, di eslê nivîsê de, bi herfên erebî carna wek "xw" carna jî wek "xwh" hatiye nivîsîn.
- (11)Di eslê nivîsê de, piştî kelîmeya "bilind", bi herfên erebî wisa hatiye nivîsîn: dbwya.
- (12)Li gor wergera tirkî ya vê nivîsê, divê di ciyê "Meb'ûsa muhterema" de yan "Meb'ûsên muhterem" yan jî "Meb'ûsêd muhterem" bihata nivîsîn.
- (13)Di eslê nivîsê de ev kelîme bi herfên erebî wisa hatiye nivîsîn: wa.
- (14)Di eslê nivîsê de ev kelîme bi herfên erebî wisa hatiye nivîsîn: dyranya.
- (15)Di eslê nivîsê de ev kelîme bi herfên erebî wisa hatiye nivîsîn: hq.
- (16)Di eslê nivîsê de ev kelîme bi herfên erebî wisa hatiye nivîsîn: xt.
- (17)Înneme'l-mu'mînûne îxwetun: Mumîn (kesên ku bawer dikin) birayê hev in.
- (18)Di eslê nivîsê de, -bi herfên erebî- di ciyê kelîmeya "utlîbû" de bi şaşî "etabû" hatiye nivîsîn.
- (19)Min li vir "nebe" nivîsand, lê di eslê nivîsê de, di ciyê vê kelîmeyê de -bi herfên erebî- "nyh" hatiye nivîsîn. Ji wergera nivîsê tê fêmkirin ku ev şaş hatiye nivîsîn û "nebe" rasttir e.
- (20)Di eslê nivîsê de, -bi herfên erebî- di ciyê kelîmeya "ehsen" de bi şaşî "hsn" hatiye nivîsîn.
- (21)Di eslê nivîsê de, piştî her paragrafa kurdî wergera wê ya tirkî hebû.
- (22)Di eslê nivîsê de ev kelîme bi herfên erebî wisa hatiye nivîsîn: xanhanmzy.
- (23)Metnin aslında, -Arap harfleriyle- "utlibu" sözcüğü yanlışlıkla "etabu" biçiminde yazılmıştır.

5-ÎTTÎHAD¹

Bo tereqqîy mulk û millet îttihad-man lazim e
Serfî xeyret çak e ba xeybî nekeyn em firsete
Awedanî ew be zorî 'îlm û fenn û sen'et e
Îş eger wa bê weten nûranî yû me'mûr debê
Ristgarî-man debê ême ş le dest em zulmete
Dujminî 'îlm û me'arîf xane-man wêran deka
Zor xirap e w muhlîk e, dermanî keyn em 'îllete*.

*Bangî Kurd, Bexdad, no: 3, 1332 [1914], r. 68

Yê ku neql dike: Dr. Kemal Mezher Ehmed, "Têgeyîştinî Rastî" û Şwênî Le Rojnamenûsî Kurdî da, Le çapkirawekanî Korri Zanyarî Kurd, Bexdad, 1978, r. 76

(1)Navê vê şî'rê min danî.

6-ÇAKEY HUKÛMETÎ BRÎTANYAY MU'IZZEM BO 'ÎRAQ¹

'Îraq le-m şerre 'alemgîre da le hemû la newcewananêkî zorî be kuştin dira ke be rastî quwwetî ejno w hêzî destî bextîyarî ayende bûn. Le ber eme em wilate xendebare, hemû layekî le zorî hetîwanî henasesard û bêwejinanî bêkes û der hemîşe degirya. Hezaran mal wêran bû, sûta, wek cigerî xanexwê bû be koy zûxal. Hezaran bax û coge w zewî bêxawen ma. Rizq, şitûmek roj be roj kem, feqîr û hejar ta ehat zor debû. Gelê kes êware bê çira dema, şew bê şew ser-yan enayewe. Hemû laye pîrr le şîwen û hawar û giryan û bawkerro bû. Bêserî w bêderî hemû wilatanî xembar kird. Bêîşî, bêbazarrî xelqî le giyanî xoy bêzar kird. 'Îraqîye-bêçarekan le jêr barî giranî xwênîni em hemû şerr û şorre, em hemû xem û xefete de-yan-naland... Axirî Xwa Hukûmetî Mu'ezzemey Brîtanayay bo 'Îraqîyekan rexsand, hukûmete-zalime-'acizekeyan derkird û hemûwanî le kot û zencîrî bêrehmî ewan necat da. Le halî nez'î gêrranewe, dûbare jiyane... Îngilîz be zerrebînî qanûn û 'edalet temaşay heq û heqîqet deken... Ew zewîyaney ke caran sê-yekêkî le ber zulm nedeçênra emro hemû sewz ekatewe. Hukûmetî Mu'ezzemey Brîtanayay genim û coyekî zorî be fellahekan da w îşî tewaw bo asan kirdin. Be-m core w le sayey Îngilîz da hemûwan 'umrêkî altûnîn û zîwînîn radebiwêrin*.

*Têgeyîştinî Rastî, Bexdad, no: 1 (1 Kanûnî duwem 1918)

Yê ku neql dike: Dr. Kemal Mezher Ehmed, "Têgeyîştinî Rastî" û Şwênî Le Rojnamenûsî

(1)Rojnameya Têgeyiştinî Rastî, ji bo propagandaya Îngilizan û di bin berpirsiyariya Major (Binbaşî) Soane de bi kurdî derketiye. Li ser rojnameyê ev îbare hatibû nivîsin: "Rojnameyekî siyasî, îctima'î w xadimî yekbûn û serbestîy Kurdan e." Li gor ku Kemal Mezher Ehmed dinivîse, hejmara we ya pêşîn di 1 Kanûnî duwem 1918'an de derketiye lê bi şaşî li ser wê hejmarê 1917 hatiye nivîsin (Binêre Dr. Kemal Mezher Ehmed, "Têgeyiştinî Rastî" û Şwênî Le Rojnamenûsî Kurdî da, r. 103, 111, 136-139).

7-DEBÊ KURD ÎSTÎFADE LE HUKÛMETÎ BRÎTANYA BIKEN¹

Temaşa ken Ehmed Hilmî Şehbenderzade ² ke yekêk e le muherrîrînî Turk le kitêbî Eqwamî Cîhan da elê Kurdekan hiç edebîyat-yan nîye. Ke Ehmed Hilmî wa bilê debê xerbîyekan çî bilên? Turkêk ke legel Kurd ewende heyat rabiwêrê hêştâ Kurd çî ye naynasê, le kwê detwanê ziman û 'adeti ew têbiga w rêy tereqqî pê nîşan bida. Kesê agay le xoy nebê çon detwanê yekêkî-tir agadarî bika. Kurd, wekû wit-man, debê xo-yan se'î biken û îstîfade le qewmî Îngilîz û Hukûmetî Brîtanya biken, çunke hiç qewmêkî bê tedarukat û bê esbab be bê yariyey hukûmetêkî be quwwet be meqsûdî xoy negeyiştûwe w naga. Ewane ke se'î bo qewmî Kurd deken nabê temaşay menfe'eti xo-yan biken, debê bo ehfad-yan se'adet hazir biken çunke ewî çawî le qazancî xoy bê natwanê bo qewmî îş pêk bihênê, baxusûs muhafezey weten û îhya w îrşadî qewmêk îşêkî zor gewre ye, her be piyawî xeyyûr û fîdayî ser degrê... Bizanin şa'îrêkî Kurd ke Ehmed Hilmî na-y-nasê çon basî wetenîyet deka:

Dil siyaseng nebê, maîlî xakî weten e
Xalî lêwî Hebeş e, sakînî burdî Yemen e³
Dilî Nalî ke enîsî Qeredax e êsta ş⁴
Daxî serçawe wû dêwaneyî dar û dewen e⁵

Têgeyiştinî Rastî, no: 11 (5 Şubat 1918)

Yê ku neql dike: Dr. Kemal Mezher Ehmed, "Têgeyiştinî Rastî" û Şwênî Le Rojnamenûsî Kurdî da, Le çapkirawekanî Korri Zanyarî Kurd, Bexdad, 1978, r. 162-163

(1)Ev nivîs, beşek ji nivîsa Têgeyiştinî Rastî ye. Navê nivîsê min lê kir.

(2)Şehbenderzade Ahmet Hilmî (1865-1914), nivîskarekî Osmanî ye. Li Darulfunûna Îstenbolê dersên felsefê dane.

(3)Di çavkaniyeke din de wisa ye: "Xalî le'li Hebeş e, sakînî burdî Yemen e". (Binêre: Dîwanî Nalî, r. 524). -Kemal Mezher Ehmed

(4)Di çavkaniyeke din de wisa ye: "êsteyš". (Binêre: Dîwanî Nalî, r. 527). -Kemal Mezher Ehmed

(5)Ez vê şî'ra Nalî ji Dîwana wî (r. 524-527) neql dikim.

Dil siyaseng nebê, maîlî xakî weten e
Xalî le'li Hebeş e, sakîni burdî Yemen e
Perçemî sunbulî yû qeddî "qezîbu'l-ban"î
Zulf behlûlî yû xet zengî yû wechî hesen e
Tel'eti ayetî can. Mezherî î'cazî beyan:
Lebi durc û dehenî sîrr û kelamî 'elen e
Dest le xwên-im mede, alûde meke damenî pak
Xwênî min sabîte, batîl nîye wek rengî xene
Wek gulî ateşî, xemlîwe be bergî çemenî
Qametî nareber e, narwer e, narewen e
Roşnî dîde be însan e, ke mujdey qedem-it
Roşnî dîdeyî xemdîdeyî "beytu'l-hezen" e
Dilî Nalî ke enîsî Qeredax e, êste-yş
Daxî Serçawe wû Dêwaneyî dar û dewen e

8-HACÎ QADİR*

Hacî Qadir wit-man şa'îrêkî bênezîrî Kurd e, şî'rekanî zor muteceddîdane ye, xoy xayet mîlletperwer e. Wek şa'îrekanî-tir be zulf û xal-ewe xoy xerîk nekirdûwe, her legel îctîma'iyatî qewmî Kurd heyatî şî'rî rabiwarduwe. Temaşay em menzûmeye biken çend tenqîdkarane w îctîma'iyane ye:

Ta yek nekewin qebîlî Ekrad¹
Her wa debine xerabeabad
Enwa'î mîlel le gewre w piçûk²
Xemlêwe memalîkî wekû bûk
Yek berg in yek ziban³ û yek reng
Bêxeybet û 'eyb û 'ar û bêdeng
Her Kurdan egerçî pakî merd in
Pamalî zemanê qetlî⁴ kirdin⁵
Her manewe be nêwa w mezlûm
Wek bûmî xerab e zarî meş'ûm
Ger ba'îsî eme depirsî "kam e?"
Şertêk e ke bo hemû tamam e

Ew şerte be kullî îttifaq e
 Ger Mer'eş û Wan e ger 'Îraq e
 Sed şêx û mela w emîr û xanî
 Bo lezzetî 'eyşî zîndeganî
 Le-w la we be hîlebazî⁶
 Le-m la we eman be teqlebazî
 Qurr-yan be hemû wilate we da
 Ta mulk û re'yyet pakî fewta
 Yek-yan emî to de-y-key ne-yan-kird
 Xem-yan nebû Kurd eger hemû mird⁷

Têgeyiştinî Rastî, no: 24 (Nisan 1918)

Yê ku neql dike: Dr. Kemal Mezher Ehmed, "Têgeyiştinî Rastî" û Şwênî Le Rojnamenûsî Kurdî da, Le çapkirawekanî Korri Zanyarî Kurd, Bexdad, 1978, t. 188-189

*Navê nivîsê min lê kir.

Ev heft notên jêrîn, yên Dr. Kemal Mezher Ehmed in:

- (1) Le dîwane çapkirawekey da: "*Ta rêk nekewin qebîlî Ekrad*" (l. 96).
- (2) Le dîwane çapkirawekey da: "*Enwa'î mîlêl be gewre wu piçûk*" (l. 96).
- (3) Le dîwane çapkirawekey da: "*ziman*" (l. 96).
- (4) Be hele '*mtl'* çapkirawe" (l. 96).
- (5) Le dîwane çapkirawekey da:
 "Her Kurd in egerçî pakî merd in
Pamalî zemanê mehwî kirdin" (l. 96).
- (6) Le dîwane çapkirawekey da: "... *be hîlesazî*" (l. 96).
- (7) Le-m şîrey Hacı, Têgeyiştinî Rastî tenha em beytey perranduwe:
 "Dunya be tirran dexon û de-y-den
Her çonê meram-yan e de-y-ken" (l. 96).

9-Î'LAN*

Min ke Wilyem Rîn Marşal -Key. Sê. Bê.- w ferîqî ewwel-im, bîna le ser ew selahîyetey be sîfetî Leşkirgêrî 'Umûmîy Quwwetî 'Îraq ke le celaletmeabî Berîtanya we be min dirawe, feqeratî atîye î'lan dekem:

Her kesê qiseyekî diro yaxûd şaye'eyek ya teqrîrêk ke xelet be emnîyetî 'umûmî bigeynê w ... xelq bêlizûm bitirsênê w eftar-yan mişewweş bika, ke em curme le serî sabît bû î'dam weya be eqûbetêkî sûktir be pêy bîrî dadga

hukm dedrê¹.

*Têgeyiştinî Rastî, no: 27 (6 Mayısî 1918)

Yê ku neql dike: Dr. Kemal Mezher Ehmed, "Têgeyiştinî Rastî" û Şwênî Le Rojnamenûsî Kurdî da, Le çapkirawekanî Korri Zanyarî Kurd, Bexdad, 1978, r. 141-142

(1)Be nawerokî ew agadarîye da wa derdekewê Turkxwayanî 'Îraq ew rojane çalakane xerîkî bilawkirdinewey propagende bûn diji Îngilîz.-Kemal Mezher Ehmed

10-EDEBİYAT-I KÜRDİYYEDEN BAZI NÜMUNELER [HİN NİMÛNE Jİ EDEBİYATA KURDÎ]

Mistefa Begî Kurdî

1

Sa'îqe w berqî nihûset zulmetî da şerq û xerb¹
Berdebaran e be mexsûsî le ser milkî Beban

2

Çawî 'îbret helbire ey dil le wez'î² dehrî dîn
Seyr ke sa...³ felek çî kird be zumrey kurdzeban⁴

3

Çareser ken bênewayan, nan û nî'met-tan birra
Lûle bû sifre w newale⁵ win kirawe zerf û xwan

4

Cumle sadat û mela w hacî bila şîn ken be soz⁶
Defterî ehlî wezaîf ser heta pê hek kiran

5

Dil le mihnet keyl e, meylî seyrî naw şar-im niye
Her dû çaw-im xwênî têzawe le daxî ...kan⁷

6

Bêzeban⁸ kû-kû zenan her xanedan tê defikrim
'Enkebût xwace-nişîn û cûtî kund in dîdeban

7

Qewmî Kurdan, girye ken bo axekan û gewrekan
Nîwey mehbûs, nîwey meqtûl, nîwe-yan menfî kiran

8

Kol be doş û xirqepoş bin tac û keşkol helgirin
Rû biken⁹ eflakî bedxû, biçne şarî xamûşan.

[Wergera tirkî ya Muhemmed Mihri]

1

Nuhûsetin saika ve berkleri aydınlık değil bilakis şarkı ve garbı istila edecek bir zulmet-i zulmü intac eylediler. Bu saika ve berklerin akabinde Baban ümerasının mülk ve ülkelerinde yağmur yerine taşlar yağdı.

2

Ey gafil, ey sersem gönül!.. İbret gözlerini aç, şu zaman-ı denî ve sefilin vaziyetine bak, yağmager feleğin Kürd lisanıyla mütekellim olan kavme karşı reva gördüğü mezalim ve fecayi'i nazar-ı dikkat ve ibretle mütalaa et.

3

Ey fukara, ey muhtaçlar, başınıza bir çare bulunuz, zira ekmek ve nimetiniz kat' oldu. Veliyyü'l-ni'mler tarafından size verilen ziyafetler kaybolup her tarafta mebsût olan nimet sofraları tayıldı.

4

Bütün sâdât, ulema ve zahitler hüngür hüngür ağlamalıdır. Zira, ehl-i vazaif ve ashab-ı muavenet ve himayetin defatir-i işesi, ser ta kadem silindi.

5

Mihnetin derd-i bîdermanından gönlüm doludur, binaenaleyh teneffüs için şehrin içinde gezmeye mail olamıyorum. Bilhassa düşmanların te'sir-i mezaliminden gözlerim kan ile doludur, hiçbir şey göremem.

6

Hangi saray ve hanedana bakarsam, anı çöl mahrûb ve lisan-ı hâl ile malikinden daimî surette mütefahhıs ve kapucuları örümcek ve nöbetçileri baykuş olarak görüyorum.

Ey Kürd kavmi, ekabir ve eşrafınız için kıyamete kadar ağlamalısınız. Zira bir kısmı maktul ve mahpus oldu ve mütebakisi nefy edildi

(Adeta edib-i muhteremimiz takriben 150 sene¹⁰ mukaddem hiss-i kablelvuku vasıtasıyla Bitlis Hadisesini¹¹ keşf ve merhum Şeyh Seyid Şehabeddin, Seyid Ali, Seyid Muhammed Şirin, Mela Muhyeddin, Halife Mela Selim hazretleri ve akraba ve mensuplarının felaketlerini tasavvur ve tasvir etmiştir.-Muahmmmed Mihri)

Kap kakak ve eşyanızı yükleyiniz, dervişler gibi dünyayı terk ve dervişlik mesleğini ihtiyar ediniz. Şu bedhaslet feleklerin yüzüne nefretle bakınız, sakit ve sessiz ve şözsüzlerin şehrine gidiniz*.

*Kurdistan, İstanbûl, no: 2 (12 Cemaziye'l-ûla 1337/9 Şubat 1335 [1919]), r. 19-20

(1)Ev şî'r di kitêba Tarîxa Edebyeta Kurdî ya Prof. Qanatê Kurdo de jî heye. Lê tekstê Qanatê Kurdo de hin şaşî hene. Wek nimûne, di ciyê "dehr" de "behr", di ciyê "kû-kû zenan" de "koma jinan" hatiye nivîsîn. Di Antolojîya Helbestvanên Kurd a A. Balî de jî ev şaşî hene. Herçiqaş A. Balî nenivîsandiye ku wî ev şî'r ji ku girtiye jî, tê fêmkirin ku ji kitêba Qanatê Kurdo -tevî şaşiyên wî- girtiye.

Binêre Prof. Qanatê Kurdo, Tarîxa Edebyeta Kurdî, c. II, Weşanên Roja Nû, Stockholm, 1985, r. 17

-A. Balî (Berhevkar), Antolojîya Helbestvanên Kurd, Pelê Sor Yayınları, İstanbûl, 1992, r. 252-253

(2)Di ciyê kelîmeya "wez'î" de, di kitêba "Sedîq Borekeyî (Sefîzade) de kelîmeya "wesfî" hatiye nivîsîn. Bi a min, heke meriv me'na vê beytê bifikire kelîmeya "wez'î" munasibtir e.

Binêre Sedîq Borekeyî (Sefîzade), Mêjûy Wêjey Kurdî-II, Bane (?), 1991, r. 535

(3)Di ciyê kelîmeya "sa..." de, di kitêba "Sedîq Borekeyî (Sefîzade) de kelîmeya "sa kû" hatiye nivîsîn.

(4)Di ciyê kelîmeya "kurdzeban" de, di kitêba "Sedîq Borekeyî (Sefîzade) de kelîmeya "kurdziman" hatiye nivîsîn.

(5)Di kitêba Sedîq Borekeyî (Sefîzade) de, li vir "W"yek (herfa waw) heye.

(6)Di ciyê kelîmeya "soz" de, di kitêba "Sedîq Borekeyî (Sefîzade) de kelîmeya "sewz" hatiye nivîsîn.

(7)Di ciyê kelîmeya "...kan" de, di kitêba "Sedîq Borekeyî (Sefîzade) de kelîmeya "Turkekan" hatiye nivîsîn.

(8)Di ciyê kelîmeya "bêzeban" de, di kitêba "Sedîq Borekeyî (Sefîzade) de kelîmeya "bêziman" hatiye nivîsîn.

(9)Di ciyê kelîmeya "biken" de, di kitêba "Sedîq Borekeyî (Sefîzade) de kelîmeya "kene" hatiye nivîsîn.

(10)Mistefa Begî Kurdî, di sala 1267'an [1850-1851] de miriye.

(11)Mebest jê, serîhildana Bidlîsê ya 1914'an e.

11-TETİMMEYÊ BÎDARÎ

'E. Q. ¹

Bego meqsûdê ma azadegî hest
Be coz azadegî hergîz ez ûnha

Rêzadade meşov ba zûr û ba zer
Be coz azadegî ez hokmê ûnha

Eger ênsaf benemûdend û dadend
Beşov şakir be heq z' ênsafê ûnha

Eger êhqaqê heq ra men'i kerdend
Nebayed ...² merdan û zenha

Be coz azadegî hergêz nebayed
Bexahî coz be mergê comle maha

Kêfayet bad in qovl û beyanha
Resed ber gûşê 'edlê an dovelha

Ke darend daêm êzhar û beyanha
Be neşrê 'edl der beynê milelha

Eger eqval û ef'al û beyanha
Yekî şod, şokr bayed heqqê ûnha

Eger ef'alêşan şod 'eksê eqval
Bebayed red nemûd ef'alê ûnha

Betercîhê şehadet ez mezellet
Be zîrê hokmê covrê doşmenanha

Eger kerdî şehadet ra murecch
Zi zillet ...³ der hokmê ûnha

Be 'ezm û cezmê tam merd û zenha
Weten ra hifz dar ez Ermenîha

Se'adet ra beyabî der do donya

Şevî me'rûf der beynê dovelha

Eger 'ezmê se'adet ra to dari
Kêfayet bad î n pend⁴ û beyanha

Eger 'ezmê mezellet ra nemûdî
Hezar efsûs bada î n beyanha

Êlahî, to beheqqê êsmê e'zem
Bêde nosret be qovmê Pehlevîha⁵

Kurdistan (siyasî, ictimai, edebî ve ilmî olarak haftada bir defa neşr olunur), İstanbul, no: 6 (21 Recep 1337/22 Nisan 1335 [1919]), r. 57

(1)Em baş nizanin 'E. Q. kî ye, lê dibe ku 'Ebdul Qadir, yanî Seyid Evdîlqadir (kurrê Şêx 'Ubeydullahê Nehrî) be.

(2)Li vir kelîmeyek -ku ji herfên "zysyn" ên erebî pêk hatiye- nehat xwendin.

(3)Li vir kelîmeyek -ku ji herfên "zysyn" ên erebî pêk hatiye- nehat xwendin.

(4)Di eslê nivîsê de ev kelîme -bi herfên erebî- wisa hatiye nivîsîn: bnd.

(5)Li vir mebest ji "qowmê Pehlevîha", Kurd in.

12- CEWANAN*

Be munasebetî zîndûbûnewey Hêvî/Umêd [Ümid]

Qazîzade M. Şewqî

Helstawun cewananî weten, dîsan be bêbakî
Le hesret derdî¹ koney mulkî bab-yan hatine çalakî
De dil 'ezm û le ser şûrî² cewanî w hatû dexwazin
Ke birjênin le ser xakî weten xwên-yan be serpakî.
Bila têraw bibê be-w xwênesûre gul le mêrgulan
Be şu'ley nûrî ummêd-yan weten ba bête rûnakî
Weten!.. Ey mulkî bapîr-im le bo³ çî ewroke rûxawî?
Le bo çî cê w meskenî weş û tuyûr e xakekey pakî?
Le bo çî ewladî to ye'nî biraza w mam û cîran-im
Belê, bapîregewre w xuşk û pûr û bawke xo daykî
Le jêr kabûsî cehl û kot* exsîrî denalên
Serapa poşiyekî reş, cilkî matem bo çî de ber nakî?!

Le xurbet lawî Kurdan bo nîgay weslî to mahzûn in
 Şew û roj nasrewên bo şehdî şîrîn jehrî tiryakî
 Le ser şaxî bilind û mêrgeşînî to bila rabin**
 Be şûrî dil bixwênin bulbulan ewro be xemnakî.
 Wilat û şarî me xoş e, bela heyf e ke wêran e
 Le bo çawî be firmêskî cewanan surme ye xakî
 Zibanî⁴ kurdî şîrîn e w hewarî ême rengin e
 Bela çünke hemû-man duşmin in zor se'b e îdrakî
 Nîfaqî me gunahêkî 'ezîm e ca webalî wî
 Be gerden[î] şêx û axa wû mela wû dest-mîswakî
 Le nêw cewanan de pêş da Şewqî bêçare wêstawe
 Be nûrî hubbî mewtîn dilfirûz e w hate rûnakî
 Le rêgay dûrî Hêvî, ye'nî Umêd dest be dest degrin
 Be 'ilm û me'rîfet têraw biken ca xakekey pakî...⁵

Kurdistan (siyasî, ictimai, edebî, ilmî usbû'î ve müstakilü'l-fikir mecmuadır), İstanbul, no: 9 (12 Ramazan 1337/11 Haziran 1335 [1919]), r. 115

(1)Ev kelîme di kovara Kurdistanê de -bi herfên erebî- wisa hatiye nivîsîn: dwd. Lê Marif Xeznedar ev şî'r ji nû ve weşandiye. Min ji li gor nivîsandina Marif Xeznedar wek "derdî" nivîsand.

Binêre Mumtaz Heyderî, Mistefa Şewqî w Peyje, Hewlêr, 1985, r. 79-90.

(2)Ev kelîme di kovara Kurdistan de -bi herfên erebî- wisa hatiye nivîsîn: şwd. Marif Xeznedar ev kelîme wisa nivîsandîye: şorî.

(3)Di ciyê kelîmeya "bo" de, di nivîsandina Marif Xeznedar de "po" hatiye nivîsîn.

(4)Di ciyê kelîmeya "zibanî" de, Marif Xeznedarî kelîmeya "zimanî" nivîsandîye.

(5)Marif Xeznedarî li vir kelîmeya "degrin" jî nivîsandîye, lê di kovara Kurdistanê de piştî kelîmeya "pakî" sê nuqte hene.

Notên Qazîzade Mistefa Şewqî:

* Baban Kürtçesidir. Kot: kelepçe

** rabin: Baban lisanında "helstin".

13-QUMAR¹

Delêm em yarîyane le ser pare ya çay bê, yaxûd le ser heç şitêkîtir bê qumar e w ferqêk-yan nêw da nîye. Le Qur'anî mecîd a bêjrawe:

"Yes'elûneke 'enî'l-xemrî we'l-meysêrî, qul fîhuma îsmûn kebîrun we menafî'un lîl-nasî, we ismîhuma ekberû mîn nef'îhuma."

Ye'nî:

"Le to depirsîn le mey û qumar, bilê le-w duwane da ziyânî gewre w qazanc heyê, belam ziyân-yan zortir e le qazanc-yan."

Dîsan fermûrawe:

"Înnema yurîdu'ş-şeytane en yûqî'e beynekumu'l-'edawete we'l-buxza fî'l-xemrî we'l-meysêrî we yesiddekum 'en zikrîllahî we 'enî's-selewâtî."

Ye'nî:

"Cige le-m-e niye ke şeytan deyewê le naw-tan dujminî w rîq bixatin be mey û qumar û êwe bihêlêtewe le zikrî Xwa w le niwêj."²

Hakimî Siyasî Mîcer Son [Major Soane]*

*Pêşkewtin, Silêmanî, 14. 10. 1920

Yê ku neql dîke: Dr. Kemal Mezher Ehmed, "Têgeyîştinî Rastî" û Şwênî Le Rojnamenûsî Kurdî da, Le çapkirawekanî Korri Zanyarî Kurd, Bexdad, 1978, r. 104-105

(1)Navê nivîsê min lê kir.

(2)Pêşkewtin, di bin berpîrsiyariya hakimê siyasiyê Îngiliz Major (Bînbaşi) Ely Bannister Soane de derketiye.

14-BO ZANÎNÎ HEMÛ

Mecîd kurrî 'Elî Hemewendî 27 sale ye, destepiyaw e, simêlî pîrr û dirêj e, rîşî top e, mûy sûr e. Piyawî kuştûwe w helatûwe. Heç kesê hewalî ew Mecîde bida ke bo kwê çûwe, ya bîgrê w bîgeyênête, huk[û]met sê sed rûpyey edrête.

Hakimî Siyasî Mîcer Son [Major Soane]*

*Pêşkewtin, Silêmanî, 3. 3. 1921

Yê ku neql dîke: Dr. Kemal Mezher Ehmed, "Têgeyîştinî Rastî" û Şwênî Le Rojnamenûsî Kurdî da, Le çapkirawekanî Korri Zanyarî Kurd, Bexdad, 1978, r. 105

15-SÏMKO W 'ECEM

Bena le exbarî İstamûl xezeteyî El-Rafdan (?) nûsîwye ke leşkirî Simko daxilî Tebrîz buwe. Wezaretî Tehran le xewf a telebî mu'awenet û îmdadî le Firqey Yazdehomî Bolşevîk (Rûsye) kirduwe.

"Seba helse dexîl-it bim biro bo Çarî lay Simko
Bilê tawî bida espî heta Tebrîz û Qaflanko
Hemû Kirmancî Kirmanşah be awat in be can û dil
Sine hazir hemû xelqî delên bê leşkirî Simko"*.

*Bangî Kurdistan ("îlmî, îctima'î, edebî xezeteyêki hurr û serbest, mîllî ye), no: 5 (4 Eylûl 1922), r. 5

16-DETÏRSÏM EY WETEN BÏMRÏM NEBÏNÏM BEXTÏYARÏ TO¹

Detirsim ey weten bimrim nebînîm bextiyarî to²
Humay Pehlewî key bê be ser Kurd a binîşî to

Hemû qewmê be dewlet bû ke çî Kurdan legel yektir
Xerîkî şoriş in ya Reb, wekû gurgan legel yektir

Bira bîn îttifaqê keyn xerîkî karî xo-man bîn
Nekû ta rojî mehşer dê esîrî qewmî dîger bîn

Bira Kirmanc û Kurd û Lurr hemû yek bîn legel Zaza
Ke ême Pehlewîesl in bizanê ehlî Ewropa

Selaheddînî Eyyûbî le Pişder hatû çû ta Şam
Le ber çî ême êsta ke bilên "Her nokerî çak e"?

Bizanin Cûleke w Ermen be dewlet bûn ke çî ême
Delên "Her nokerî çak e, le bo-man nokerî çak e"

Be qewlî mufsid û bedgo legel yek têk meçin îtir
Eger le-m pende gwê negrin, be mirdin çin le jîn çatir*.

(1)Navê nivîsê min lê kir.

(2)Bi qasî ku tê fêmkirin ev şî'r şî'ra Mistefa Paşay Yamulkî ye. Hin şî'rên wî jî alî kurrê wî 'Ebdul'ezîz Yamulkî hatine berhevkerin û bi navê "Hendê Le Metrûkatî Mistefa Paşa Yamulkî" hatine çapkirin. Li ser tirba Mistefa Paşa ev beyt hatiye nivîsîn:

Etirsim ey weten bimirim nebînim bextiyarî to

Binûsin ba le ser qebr-im weten xemgîn û min xemgîn

Herçiqas ku li ser tirba Mistefa Paşa, di binê vê beytê de navê Mistefa Paşa bi xwe hatiye nivîsîn jî ev beyt di eslê xwe de wergera kurdî ya beyteke şairê Tirk Namîk Kemal e. Di "Hendê Le Metrûkatî Mistefa Paşa Yamulkî" de şî'ra pêşîn jî bi "Detirsim ey weten bimirim" dest pê dîke.

17-DÎSAN SERDARÎ NUSRET: SÏMKO (ÎSMAÎL XAN)

Bena be exbarêkî taze ke le Bane-we wergîrrawe, cenabî Îsmaîl Xan (Simko) le paş eme ke meqerrî xoy yanî Çarî terk û tehesunî be mewqî'î menbe'î şaxanî Somay û leşkerêkî 'Ecemî bêşumar Çarî w etraf-yan hemû îstila w yexma kird, Simko çend rojê em ehwaley seyr û temaşa w be-m wesîle-we 'Ecemekanî îxfal û tedarikatî xoy-şî ikmal dekird, le paş em istih'zarane şewêk be ser leşkirî 'Ecem da şebeyxûnêkî mahiraney kird û be rewayetêkî muwesseqe qerîbî penc hezar nefer telefiyat û birîndarî be ordûy 'Ecem da w le paş em-îş bo etraf te'mîmî nûsî ke hesebe'l-însanîye her kes û her 'eşîretêkî Kurd be qeder îmkanî xoy bo kifin û difnê ew 'Ecemane mu'awenetî neqdîyey teleb kird. Le ser em xalibîyetey-îş dîsan cenabî Simko 'ewdetî bo Çarî munasib nedîwe w legel tertîbatêkî mexsûsey xoy meşxûl e. Bizanîn ta em hemley duweme bo kwê ye. Welhasil Cenabî Simko dîsan xalib e. Ême zaten ta êsta be mexlûbîyetî ew çunke be rastî bawer-man nekirdibû, her behsî xalibîyetî ew-man denûsî w însaallah hîç Kurdêk le ser heq mexlûb nabê w le Xuda temenna dekeyn ke em îxtîlaf û munaze'ate le beyn Kurdan ye'nî qewmî Pehlewî w 'Ecem da ye, be zûyî mubeddelî xeyr bibê ta le her dû teref new'î benî beşer û Musulmanan îtir zererdîde nebin. Çunke Kurd bo ême çend metlûb e dostî hemû Êran û 'Eceman ke xanedanî muhterem û munewweran[î] be qiymetî zor e, bo ême ewende be qîmet û pêwîst e.

Beşaret bê, delên Simko hucûmî kirde ser Êran
Bilawey kird 'Ecem têk çûn wekû rêwî le ber şêran
Şebeyxûnêkî merdane şîkak û Herkîyan kirdî
Bilindî kird bihemdellah kulah û tepleyî Kurdan

Desa Kurdan, feda-tan bim, hemû helsin be yekcare
Netîcey em şere xêr e ke îstiqlal e bo Kurdan*.

*Bangî Kurdistan, no: 6 (18 Eylûl 1922), r. 5

18-SÏMKO

Bena le kaxizêk ke le Bane-we hatuwe cenabî Simko heta êsta dû def'e legel
'eskerî 'Ecem musademey waqî' buwe w her dû def'e ke telefîyatêkî zorî le
'Ecemekan dawê, be muweffeqîyet gerawetewe bo Çarî*.

*Bangî Kurdistan, no: 8 (29 Eylûl 1922), r. 3

19-ÎSMAÏL XAN (SÏMKO)

Muddeyêk e le teref Îsmaîl Xan-ewe hîç xeberê nebû. Dwênê le Bane-we
xeberê hatuwe ke Serdarî Nusret Simko le paş eme ke Çarî (meqerrî qedîmî
xo-yan) le 'Eceman bi zor girtewe, leşkirî muzefferî Şikakanî bo terefî Selmas
rewane kird û Dîlman ke merkezî mehalî (qeza) Selmas e le duşminanî xoy pak
û istirdad kirdewe. Xuda Kurdan le ser heq le hemû cêgayeka xalib bika w be
mamûranî mexrûrî 'Ecemanî dost-man-iş insaf û fehmêkî ba siyaset bida ta
em xwênrijandine le beyn dû firqey Îslam da tewaw bibê.

Bikêşe xencer-it Simko, bide ne're heta Tûran
Selamêke le ...¹ ke yar e bo hemû Kurdan
Nihayet de be Qacaran ke cay Qacar le Tûran e
Welî cay Pehlewî w Fursan tewawî mulkî Êran e
Desa Dêbokriyan helsin legel Mengûr be azane
Bibestîn rêy firarî ()², esîrî kin be merdane*.

*Bangî Kurdistan, no: 9 (8 Teşrînî yekem 1922), r. 5

(1)Li vir kelîmeyek nehat xwendin.

(2)Di eslê nivîsê de jî nava parantêzan vala ye.

20-SÛMKO (SERDARÎ NUSRET ÎSMAÏL XAN)

Le Mîna [Mîne] Axa ke reîsê 'eşîretî Gewrik[î] terefî Saqiz e w xoy êsta ke le dey Kendesûre (tabî'î Bane) ye, rîwayet deken cenabî Simko (Îsmaîl Xan Serdarî Nusret) ez ser nwê şehîrî Rûmîye istîla w istirdad kirdûwe w 'eşayîrî Kurdanî ew terefane hetta Gelbaxî w saîrey cihetî Saqiz û cîwarî Siney-îş bo mu'awenetî Simko bîl'umûm hazir in û hukûmetî Êran-îş em care le hîmmet û sebatî Kurdan têgeyîştuwe w bo muzakere w rêkkewtin xeberî bo Simko narduwe. Me'lûm debê ke xeberî xêrî teşekkulî hukûmetî musteqîley Kurdîstan le Silêmanî da demarî hemîyet û xeyretî Kurdanî hênawetewe hereket.

Desa Kurdan be qurban-tan, hemû yek bin wekû şêran
Reha bin ta Xuda bîyka le zulmî daîmî Êran*.

*Bangî Kurdistan, no: 10 (15 Teşrînî yekem 1922), r. 4

21-ÎRAN-SÛMKO-RÛSYA

Li gor xeberan, hukûmeta Rusyayê ji hukûmeta nû ya Îranê aciz bûye û li dijî Îranê taqîbat kiriye. Îhtimal heye ku vê gavê Simkoyî bikşîne cem xwe. Hukûmeta Ankarayê jî hem ji ber meyl û hezkirina xwe ya hember bolşevîkan hem jî ji ber daxwaz û ...¹ xwe ya ku tim serekên Kurdan bişîne ser talukeyan, wekî ku çar-pênc sal berê kiribû vê carê jî dê çek û cebxane bide Simko û bi vê yekê dê bibe sebebê tevliheviyeke din*.

Yê ku ji tirkî wergerandiye: Malmîsanîj

*Bangî Kurdistan (siyasî, edebî, fennî ye), Bexdad, no: 14-2 (15 Şûbat 1926), r. 4

(1)Li vir kelîmeyek nehat xwendin.

22-'ERZÎ TEŞEKKURAT¹

Le mêj a (demê bû) le weten û qewm û biraderanî 'ezîz-im dûr û mehcûr bûm.

Şukrî Xwa natwanim be cê bînim ke minî le-m roje pîrozeyî serbexoyî qewmî Kurde wa hênayewe Silêmanî. Le lutf û merhemetî eşrafî memleket û muteheyyizan û biraderanî weten gelê mesrûr û mubahî m. Le direng û zûyî î'adeyî zîyaret, temaşay qusûr-im neken. Xwa le hemû layê razî bê.

Be wasitey Rojî Kurdistan-îş 'erzî teşekkurat û te'yîdî îhtiramat dekem.

Qumandanî 'Eskerî Kurdistan Sahêbqiranzade Salih Zekî*

*Rojî Kurdistan, Silêmanî, no: 3 (16 Rebû'l-axir 1341/6 Kanûnî ewwel 1338 [1922]), r. 4

(1)Navê nivîsê min lê kir.

23-BEYANÎ MEMNÛNÎYET¹

Le ser de'wet û îradeyî hezretî celalet Melikî Kurdistan û seyyidül'sadat cenabî Melik Mehmûdî Ewwel dameşewketuhu be kemalî şewq û şetaret-ewe bo kesbî şerefî ziyaretî hezretî Melikî mu'ezzem hatime Silêmanî. Le hemû xusûsêk-ewe mezherî tewecuhat û 'înatî hezretî mulûkane bûm. Le ber ewe be hemû mewcûdiyet-im-ewe 'erzî teşekkur û iftixar ekem we le şeweyî însanîyet û hîssîyatî qewmîyetperweraney ke le merasîmî îstîqbal da le teref cenabî reîsu'l-ruesa w sadatî kîram û ruesa w memûranî 'eskerî w mulkîy hukûmet û eşraf û munewweran û ehaliy Kurdistan-ewe derheq be şexsî min rewa bînrabû gelê muteşekkir û muftexîr im. Belkû her felaket û ezîyetê ke le rêgay xizmetî azadî w xelasî em millete da be ser-im a hatuwe le bîr-im çotewe. Be wasitey Rojî Kurdistan-ewe beyanî memnûnîyet û mesrûrî le hemû biraderanî Kurdî Silêmanî ekem. Xuda hemû layêk-man muweffeq bikat*.

Simko

*Rojî Kurdistan, Silêmanî, no: 8 (23 Cemazîye'l-ewwel 1341/10 Kanûnî sanî 1338 [1923]), r. 3

(1)Navê nivîsê min lê kir.

24-QEHREMANÎ KURDISTAN HEZRETÎ ÎSMAÎL AXA-SIMKO

Hefteyê le-me-w pêş cenabî Tahir Efendî serkatibî hezretî Mulûkane be quwwetêkî suwarî-yewe teşrîfî hereketî kird bo îstîqbalî hezretî qehremanî Kurdistan cenabî Îsmaîl Axa.

Rojî 7 Kanûnî sanî [13]39¹ ke cenabî Axa qonaxê nizîkî Silêmanî bowe, hezretî Reîsu'l-ruesa cenabî Şêx Qadir Efendî ke le me'îyyetî mubarekî da qumandanî taburî janderme be quwwetêkî zorewe w kullî eşrafî memleket mewcûd bûn bo îstîqbal hereket fermabû. We nizîkî menzilî teşrîfî çû be pîrîyewe.

Rojî 8 Kanûnî sanî [13]39² 'umûmî dewayîrî hukûmet te'tîl kira, ehalî dukan-yan helgirt. 'Umûmî sadatî kîram û memûranî 'eskerî w mulkî w ruesa w eşraf û munewweran û ehalîy muhtereme bo merasimî îstîqbal nizîkî nîw se'at be suwarî w be piyade hereket û rû-yan kirde rêgay îstîqbal û întizar.

Cenabî Reîsî Daxilîye legel cenabî Keptan Çepmen Wekilî Fexametî Mendûbî Samî da be otomobîl û sayîr ruesay hukûmet qîsmen be suwarî qîsmen be otomobîl ta sa'etê rêga îstîqbal-yan kird. Herçî ruesay 'eşayîrî ke le Silêmanî hazir bûn herkesê be xoy û deste w dayireyewe be sûretêkî muntezem û ciyawaz daxilî merasimî îstîqbal bûn.

Le paş tertîb û tenzîmî em merasîme gerdûneyî hezretî celalet Melikî mu'ezzemî dameşewketuhu sa'et le şeşî kurdî le şar-ewe nizîkî nîw sa'et rêga bo îstîqbal teşrîfî fermû. We le cêgay mexsûs întizar û îstirahet-yan fermû.

Ke teşrîfî mubarekî hezretî Axay namdar nizîk bowe, le riyasetî Qumandanî Quway Millî da 'umûmî qite'atî suwarî millîy mulûkane sa'etê rêga le şar dûr ta kenarî şar le her dû lay rêga da sefbesteyî ihtîram û selam bûn û 'erzî te'zîmat û tebrîkîyyet-yan kird.

Le paş qederê ke hezretî Axay namdar legel cenabî Ehmed Axay biray muhteremî w sayîr xizman û me'îyyetî mubarekî w ruesay kîram û zî'l-îhtîramî 'eşîretî Pişder cenabî Babekr Axa w cenabî 'Ebbas Axa w sayîr ruesay Pişder û Mengûr û Ocax le xizmetî cenabî Reîsu'l-ruesa hezretî Şêx Qadir Efendî da be tewawî nizîkî mewqî'î mexsûsî celalet hezretî Melik bûnewe. Ewsa gerdûneyî hezretî tacdar-îş tozê çûwe pêşewe, her dû teref dabezîn musafehe w beyanî xoşamedî w tebrîkat û lewazimî muhebbet û hurmetî fewqul'ade le her dû cîhetewe be cê hênra. We ba îradey mulûkane, hezretî Axay muhterem le gerdûneyî mexsûseyî mulûkane da exzî mewqî'î fermû w le xizmetî hezretî Melik da gerranewe bo şar.

Umera w zabitan û 'esakîrî mensûreyî Kurdistan-îş ke le xaric şar da be sûretêkî muntezem sefbesteyî ihtîram û selam bûn rasimeyî te'zîmat û selam-yan îfa w gelê goranîy wetenîy xoş-yan xwêndewe w du'ay tereqqî w muweffeqiyetî hukûmet û mîlletî Kurd-yan kird. Le teref celalet hezretî Melik

û hezretî Axay namdar-ewe teftîşî 'eskerekan kira w yeke yeke mezherî selam bûn.

Le diwayî da be 'umûmî 'ewdet kirayewe bo xanû w mewqî'î mexsûsî hezretî Axay Muhterem û le ber ...³ teweqquf-yan fermû, le wê da hemû şagirdanî mekteb be sûretêkî rêk û pêk le seffî hurmet û întîzar da rawestan. Gelê goranî w eş'arî kurdîy wetenîy be te'sîr-yan xwêndewe ke dilî sami'înî ekird be aw.

Le teref yekê le şagirdanî mekteb-ewe be munasebetî ew roje mubareke w ew zate muhterem-ewe nutqêkî ciwan û rewan xwênrayewe ke 'erzî xoşamedîy hezretî Axay namdar, du'ay beqay muweffeqîyyet û tereqqîy hezretî Melik û milletî Kurd bû. Le-m îstîqbale muntezeme w le-m menzere muhteşeme 'adeten 'alemî kurdîyyet û qewmîyyet îhya buwewe. Le paş da musafirînî muhtereme le xizmet hezretî celalet Melik da teşrîf-yan çuwe meqamî xusûsîy xo-yan.

Heqîqet em roje rojêkî tarîxî w zor muqeddes e. Ême natwanîn derkî me'alî w medh û senay û xidematî wetenperwerane w îqdamatî fedakaraney hezretî Axay namdar bikeyn. Lakin be nawî 'umûmî milletî Kurd-ewe 'erzî xoşamedî w tebrîkatî hezretî em qehremanî Kurdistan-ewe w refîqanî muhteremî ekeyn û be teşrîfhawirdin-yan î'lanî mesarr û îftîxar û se'adet û muweffeqîyyetî hemû qewmî Kurd le baregahî kîbrîya îstîrham ekeyn*.

Rojî Kurdistan

*Rojî Kurdistan, Silêmanî, no: 8 (23 Cemazîye'l-ewwel 1341/10 Kanûnî sanî 1338 [1923]), r. 4

(1)Ev hejmara Rojî Kurdistanê bi xwe di 10 Kanûnî sanî 1338'an de derketiye. Loma di vê tarîxê de şaşî heye.

(2)Binêre nota pêşîn.

(3)Li vir kelîmeyek nehat xwendin.

25-Î'TIZAR

Wextê ke hezretî qehremanî Kurdistan Îsmâil Axa daxilî şarî Silêmanî bû, be şeref û hurmetî em zate muqeddes-ewe hewt 'eded topî selam û ihtîram endaxt kirawe.

Le nusxeyî pêşûy Rojî Kurdistan le merasimî îstiqbal da em xusûse-man le bîr çûbû, 'erzî me'zeret ekeyn*.

Rojî Kurdistan

*Rojî Kurdistan, Silêmanî, no: 9 (30 Cemazîye'l-ewwel 1341/17 Kanûnî sanî 1338 [1923]), r. 3

26-BEYANNAME¹

Bîsmîllahîrrehmanîrrehîm

"Inneme'l-mu'mînûne îxwetun."

1-Le Beyannamey pêşû ke be tarîxî 8 Mart 1339 [1923] nûsrabû, dûr û dirêj beyan-man kirdibû ke ême meqsed û xaye-man se'adet û selametî Îslam û qewmî necîbî Kurd e. Ême be dû rabite biray yek in. Ewwela Îslam in, saniyyen hemû Kurd in. Em dû rabiteye êmey yekdil û yekemel kirdûwe ke hîç kes be hîç lewnê ême le yek cwê nakatewe. Le 'ezm û muçahedatî millîyey xo-man feraxet nakeyn.

2-Weqtî ke teyarey Îngilîz şarî Silêmanî be bomba bombardman kird û mal û mindal û 'eyalî bêgunah û bêdestelatî em millete me'sûmey agirbaran kird, mahîyet û me'nay mewa'îd û mu'awenatî Îngilîz be tewawî me'lûm bû. Em zilm û wehşete le-m 'esrî medeniyet da bo me'nay însanîyet û beşerîyet şaîbeyêkî fecî' ...². Em fecayî'e, mes'ûlî, ihtimal be'zê me'mûrînî Îngilîz [e] ke tabî'î hewa w hewes û sûû îctîhadatî seqîmey xo-yan bûn. Eme elbet zeman hesabî debînê*³

*Bangî Heq (Siyasî, İctimâî xezeteyêkî resmî ye le Qerargay 'Umûmîy Ordûy Kurdistan teb' dekrê, xaye w emelî îstihsalî huqûqî Kurdan e), Eşkewtî Casene [Şikefta Casene], no: 1 (8 Mart 1339 [1923]), r. 1

(1)Navê nivîsê min lê kir.

Piştî ku Îngilîzan êriş birin ser Silêmanî û bajêr bombebaran kirin, Şêx Mehmûdê Berzencî

û hevalên xwe mecbûr man ku ji bajêr derkevin. Wan xwe gîhand şikefta Casene û li wir rojnameya Rojî Kurdistanê derxistin.

(2)Li vir kelîmeyek nehat xwendin.

(3)Dewama vê nivîsê heye, lê min temamê wê peyda nekir.

27-BO HUZÛRÎ HEZRETÎ MELIKÎ ME'EZZEMÎ DAMŞEWKETE

Qerarî Meclisî Millî wa ye Hezretî Melikî damşewkete be sûretêkî 'acil be her new'î xoy teswîb efermûyt, bo selametî weten û millet te'mînî muxabere w munasebet û rabitey hîmayet legel Hukûmetî Brîtanya w dostî legel Hukûmetî Îraq da bikat. Îtir emr emrî ûlu'l-emr e. Ferman*.

Reîsî Meclisî Millî w Reîsî Daxilîye Xerîb

*Umêdî Îstîqlal, Silêmanî, no: 1 (1923), r. 1

28-XERAÎB

Bo te'mînî îstîqlalîyet, qewmî Kurd le bîdayetî Herbî 'Umûmî ta êste deh hezaran qurbanî da w bê hesab talanî rroy. Êsta bê me'lûmatî em millete em dû hukûmete meşxûlî planî qutdan in. Elbette 'edalet rêgey xoy edozêtêwe. Xwa kerîm e*.

*Umêdî Îstîqlal, Silêmanî, no: 1 (1923), r. 2

Yê ku neql dîke: M. R. Hawar, Şêx Mehmûdî Qareman û Dewletekey Xwarûy Kurdistan, bergî duhem, Londra, r. 544

29-PÛLÊN HUKÛMETA KURDISTANÊ¹

Rîyasetî malîye qiyemetî yekaneyî w heştaneyî w bo tapo pênc rûpyeyî pûlêkî tazey îstîhdas kirduwe. Em pûlane le ser zemînî sewz e w nimûney çapkirawî heye².

Umêdî Îstîqlal, Silêmanî, no: 9 (1923)

Emro pûlî çwar rûpyeyî w rûpye w nîwî we yek rûpyeyî teb'i kira w xiraye mewqî'î tetbîq-ewe³.

Umêdî Îstîqlal, Silêmanî, no: 20 (27. 3. 1924)

(1)Navê nivîsê min lê kir.

(2)Yê ku neql dike: M. R. Hawar, Şêx Mehmûdî Qareman û Dewletekey Xwarûy Kurdistan, bergî duhem, Londra, r. 542

(3)Yê ku neql dike: M. R. Hawar, Şêx Mehmûdî Qareman û Dewletekey Xwarûy Kurdistan, bergî duhem, Londra, r. 542

30-LE GWÊM DÊ DENGÎ LAYLAYEY WETEN¹

Le gwêm dê dengî laylayey weten, daykî cigersûtaw
Dirêjênê be ser wêranekey xwênawî-ya xwênaw
Delawênêtewe w degrî serî şîn e le matem da
Şew û roj kotelî mindalekanî wa le ber dem da
Delê: Le-w fitneyey Kurd-a kurrî çak-im nema, kujran
Ew-îş mabû hemû mirdin le birs-a bê kifin nêjran
Xuda padaşî em tenganeyey wa dayewe w wa-m dî
Be pêy xoy hate ber pê-m tacî gewherdarekey kurdî
Selaheddîn celalî way nebû, te'rix le pêş çaw e
Hemû paşay Beban mirdin be hesret rojêkî wa we
Şewê dest ehrimen kewt Xatemî milkî Silêmanî
Ke çî mîr û gizîrî pê ekird qedrî weha zanî
Be sermestî meyî serşar, xwênî mîlletî noşî
Le cêy cubbey siyadet ranikî sûrî pîyawkujî poşî
Lebatî pirç wekû wurç, paytextî şûmî eşkewt bû

Sîwak û zîrg û xencer ...²kemendî tewqî le'net bû
 Be dem em nalewe destî dirêj kird, xistiye ser şan-im
 Wutî: Tewfîq, hatîte bo barî mîhnet ey-zanim
 Belê hal-im peşêwawe, firrînde balî sûtandûm
 Nema xeyrî kelawe, şew binalêne le wê wek bûm.
 Wutim: Daye, ke dayk-im mird, negiryam çunke to mawî
 Eger ewladekan-îş-it bikujrên to debê ç a bî
 Qesem bew 'ezmî Kurdey şanî Rîçardî be şîr rûşan
 Kilawî Kurd ebê qûç bê ke hat û şanî xoy cûlan
 Şewêk piyawêk le befr-a ma, nemird agirêkî dûrî dî
 Le lay min naumêdî kifr e, em agirey dil-im bo kê? *

*Jiyanewe, Silêmanî (Süleymaniye), no: 34 (Ab 1925)

Yê ku neql dîke: M. R. Hawar, Şêx Mehmûdî Qareman û Dewletekey Xwarûy Kurdistan, bergî duhem, Londra, r. 843-844

(1)Navê nivîsê min lê kir.

Ev şî'r di rojanameya Jiyanewe de derketiye. Jiyanewe, ji alî karbidestîya Îngilîzan hatiye derxistin û di binê navê rojnameyê de weha hatiye nivîsin: "*Em xezeteye xezeteyekî hukûmetî ye, hefteyê carêk der deçê.*"

Li gor ku M. Resûl Hawar dinivîse, ev şî'r di Jiyanewe de bêimza derketiye lê paşê hatiye fêmkirin ku şî'ra Pîremêrd e. Şa'îr di vê şî'ra xwe de rexne li Şêx Mehmûdî Berzencî girtiye, lê piştî ku bihîstîye ku Şêx Mehmûd pê êşiyaye, şî'reke din nivîsîye û tê de pesnê şêx daye, jê re şandîye (M. R. Hawar, Şêx Mehmûdî Qareman û Dewletekey Xwarûy Kurdistan, bergî duhem, Londra, r. 594, 843-846).

(2)Li vir kelîmeyek nehat xwendin.

31-MA QERARÊN ECAÏB TÎM DÊ TETBÎQÊ ROJHELATÊ BÎBÎN?

Saîd Elçî

Wekî berê îro ji hemwelatîyên nemusluman, bê ku zirar bigihê zimanê me yê resmî tirkî, li gor musaeda qanûnan zimanê diya xwe dipeyivin-dinivîsin û vê rewşê zirarek nedaye konseptê (mefhûma) yekîtiya neteweyî. Digel ku eşkere ye ku yekîtiya bi ziman nayê xerakirin jî, di dema berê de li Rojhelatê (Mebest jê Kurdistan e. - Malmîsanîj) zordariya "hemwelatî bi tirkî bipeyive" tu car kêr nebûye. Ji ber vê yekê tadeyîyên cûrbecûr li hemwelatîyên Rojhelatîyên bêguneh bûne, di eynî wextî de ceza pereyan dane wan.

Keyn ji viya, dîsa di dema berê de navên ku dê-bavan li zarokên xwe yê nûbûyî kirine, ji alî îdareyên nifûsê nehatine qebûl kirin; van daîreyan bê ku rîza dê-bavan bê girtin navên wekî "Oğuz", "Bozkurt", "Atila" li zarokan kirine û [ev nav] li kutugên nifûsê hatine nivîsîn. Lêbelê ev nav tenê di kutugên nifûsê de mane, di jîyan[a pratîk] de bikar nehatine. Dê-bavan dîsa li gor dilê xwe nav li zarokên xwe kirine.

Li dawîya dawî birêvebiran xetayên xwe fêm kiribûn û dev ji vê tetbîqata seqet berdabûn.

Hîn xatirayên van kirinan ji bîr neçûbûn, nûke jî navê gund û qesebeyan tn guhertin, tevliheviyên nû tên pey dakirin.

Ev hessasiyeta li dijî rastiyê ji bo çî ye?

Di vê sedsala ku netewe musabeqeyên fezayê dikin de, bialîkîdehîştina izdirabên herêmekê -ku tê de bi hezaran birçî, belingaz û nexweş hene- û derbazkirina wexta xwe bi guherandina navên ku hemwelatî hîn bûne, merivî diêşîne. Ev tetbîqata şaş a ku çend sal berê dest pê kiribû û îro dom dike, tenê dibe sebê tevliheviyê û di hişê hemwelatîyan de tevliheviyan çêdike. Ji ber ku, îro hemwelatîyên ku karê wan dikeve deriyê dewletê, nizanin [ew bi xwe] ji kuderê ne.

Pêşdeçûna Rojhelatê, bi çavên biyanî li Rojhelatê û li gund û qesebeyên Rojhelatîyan nenihêrtinê dibe, bi bawerkirina bi Rojhelatîyan dibe. Em birêvebirên xwe dawetî ilmê pozîtîf û riya eqlê dikin*.

Yê ku ji tirkî wergerandiye: **Malmîsanîj**

*Dicle-Fırat, İstanbul, no: 5 (1. 2. 1963), r. 2

32-HEYDO Û FERHO¹

Reşo [Edîp Karahan]

Li gundê Tîlecîkê Heydo hebû. Li gundê Heboşîyê jî Ferho hebû. Ewan gundan bi qaza Qızıltepe ve bûn. Ewan zilaman pir bi keyf û eşq bûn. Li mintiqa Qezê çuqas dawet û dîlan dibû, xwedyê dawetê ba wan mirovan dikir. Tê bîra min ko di wextekê de dawetek çêbûbû li gundê Telnîşîr. Ew gund gundê Kermo Çelebî bû. Kermo Çelebî ji mala Hecî Kermo (ji Munganan)² bû. Îbrahîm Xelîl dizewicî. Îbrahîm Xelîl apê min e. Navê dergistiya wî Helîmê bû. Helîmê ji alîyê çiya bû. Ji benda Mustafak[î]yan bû. Û tê bîra min ko Heydo û Ferho çawa zîvir dibûn li serê dawetê heta binê dawetê. Ferho li bilûrê dixist û Heydo distra. Û carna Ferho dest ji bilûrê dikir û bi Heydo ra dest bi kilaman dikir û zîtok davîtin. Heydo ev kilama digot. Navê kilamê min ji bîr a kiriye. Lêbelê çend peyvê kilamê di bîra min de ye. Ez dibêjim qey ew kilam ev bû:

Bi yekê razî nabe
Bi duda qaîl nabe
Bi sisya nayê sero
Bi çara poz pê nake
Bi pênc a guh nadeyê

Haho qaîl nabe, gundyano razî nabi!

Pîşt[î] Heydo, Ferho dest pê dikir. Peyvê[n] kilamek Ferho, gora di bîra min de maye ev bûn: Navê vê kilamê di bîra min tê. Navê wê kilame Rûto bû.

RÛTO

Ha wer weri, wer Xanimê
Xanim bûka mala bavê min e.
Ji banê xênî ba dikirim.
Kafirbavê nakêlime.
Xenzîrbavê nakêlime.
Nigê Xanim bi şimik e
çû Mîdyatê gilî bike
wê qaymaqaman razî bike
wê hakim an qanî bike
wê yuzbaşyan bertîl bike
wê mala Rûto xera bike.
Ha wer weri, wer Xanimê

bûka mala bavê minê.

Dû re kilaman³ dîsa Ferho dest bi bilorê⁴ dikir û Heydo dismala xwe dida destê xwe, ji serê dîlanê diçû binê dîlanê. Qîz û xortan dest bi hevren dîlan dikirin. Lêbelê qîza Ahmet Axa hebû. Ew qîz pir xweşik bû. Navê wê Şemsê bû. Û lawê Elî Axa Bişar hebû. Şemsê û Bişar eşqî [aşiqê] hev bûbûn. Bişar ji Ferho re digot ko bira Şemsê bê destê min. Ferho dikir nedikir Şemsê nedihat destê Bişar. Ji ber ko bavê wê Ahmet Axa ji wê ra gotubû ko heke ez te bi Bişar re bivînim ezê te bikujim. Tê bîra min ko em giş berbû swar û peya diçûnin Şêbê. Şêb gundê Dêrikê bû. Çaxa ko em çûn derbenda Şêbê, me nêrî ko swar⁵ û peyayên jêr yên ji alî zavê û swar û peyayên jor ji aliyê bûkê wexta ko ber bi hev hatin dest bi reqa-reqa tivinga kirin. Lêbelê çarhawîr çiya û zinar⁶ bû. Hesp û miñnan nedixebitîn. Ew çaxan axan ji hesp û miñnên xwe peya dibûn û ber bi hev dihatin. Ew gav pîrekek ji alî zavê û yek jî ji alî bûkê, her yek di destê wan de dismalek, bi ken û kêf dilîstin. Tê bîra min, Xwedê zane⁷ ye ko jinika ji alî zavê (zava apê min bû) navê wê Edûlê bû. Edûlê wexta nêzikî li mala bûkê kir, dest bi dûrukan kiribû. Dûrukek wê bi tenê tê bîra min. Bi texmîn ew dûruka wanî bû:

REBÎAYÊ

De rabi, de rabi Rebîayê

Rebîa qîza şêxê Şêbiyan e⁸.

Bûka maqulê Dêrikyan e.

De rabi, de rabi Rebîayê

Rebîa qîza şêxê Şêbiyan e.

Bûka maqulê Dêrikyan⁹ e.

Riya Dêrikê bi mişmiş e

Çarşeva¹⁰ Rebîa min xişe-xiş e (xuşe-xuş e)

Riya Dêrikê bi zeytûn e

Çarşeva¹¹ Rebîa min guluftûn [gulavdûn] e

De rabi, de rabi Rebîayê

Bûka maqulê Dêrikyan e.

Qîza şêxê Şêbiyan e.

Heta me bûk anî Telnîşîr belkî sed û tu bivê hezar tifing¹² hat teqyan. Wexta me bûk anî ber malan, zava Îbrahîm Xelîl li ser xênî bû. Destê wî tijî şekirê hamid hulû [hamil hulo] bû. Giştik avît ser serê bûka me Helîme. Û lawikekî biçûk jî şêrbikekî avê li ser riya bûkê rijand wexta bûk ket hunduro.

Dû re swaran dest bi cirîdê kirin. Swaran li ber hev dixistin û gelek carî swaran¹³ bi hevran¹⁴ erebkî dipeyvîn. Wexta cirît jî xelas bû, zilaman giştik çûn aliyê odê û¹⁵ wê çaxê dest danîn bi starnên¹⁶. Di nav wan sitiranan¹⁷ de

evaya di bîra min tê. Û ez texmîn dikim ko Ferho digot û Heydo jî lê dinuhurand. Navê wê kilamê ev bû: Qadê Sadûn.

QADÊ SADÛN

Werê wey dinyayê, wey dinyayê

Bila wê sibehê şerek çê neba.

Li Şewatya [Şewaşya?] şewitî li ber bânderan milê ziyaretê

Wê sibekê, li ser serê Qadê Sadûn bûye teqi-teqê tivingên¹⁸ devziravan.

Sê swar¹⁹ tê ji jor da,

swarê pêşyê teres layê Emer e,

swarê²⁰ ortê Bedirxanê Bedirxên e,

swarê dawyê Ahmedê Evdo ye.

Bi dev dijmin e, bi dil di Qadê Sadûn nabihure.

dibê îro sê roj û sê şev e şêwr û mişewrê Qadê Sadûn

Li Diyarbekira (Carbekira) xopan

Li dora hawizê mala Fêzi mala Neqîp

Hatine gerandinê

Wey dinyayê, wey dinyayê

Fersê ban dikire, lêlê Şaxê porkurê

Vê sibehê rabe, sê denga li apê xwe Hecî Hemît bi gazî ke, bi hewar ke

Apê te Hecî Hemît pilingê Çêmê Reşa ye

Belkî heyfa²¹ Qadê Sadûn bi destê xwe hilîne

Yan jî sê denga li Êlas Axa²² bi gazî ke, bi hewar ke

Bila Êlas Axa bavê Menduh, çend swarê zikşewat bi xwe r' hilîne bila bê heyfa Qadê Sadûn bi destê xwe hilîne.

De wey dinyayê, de wey felekê, wey dêranê

Ma çima te li min wa kir, te konê min xera kir?

Wey dinyayê, wey felekê, wey xayînê, te li min wa kir*.

*Dicle-Fırat, İstanbul, no: 8 (14. 5. 1963), r. 5

(1)Mîn ev nivîs li gor elfaba Hawarê nivîsî. Di eslê nivîsê de hin herf bi awakî din hatibûn nivîsin. Wek nimûne, di çiyê Û, U, W, Ê, X de U, Ü, V, Ê/E, Ğ hatibû nivîsin. Di eslê nivîsê de hin cumle ji alî gramerê de jî şaş hatine nivîsin.

(2)Di eslê nivîsê de bi tirkî wisa hatibû nivîsin: Munganlardan.

(3)Herçiqas di eslê nivîsê de "Dû re kilaman" hatiye nivîsin jî divê ji kelîmeyên "re" û "kilaman" tenê yek hebe.

(4)Li jorê, ev kelîme wisa hatibû nivîsin: bilûrê.

(5)Di eslê nivîsê de ev kelîme wisa hatiye nivîsin: sawar.

(6)Di eslê nivîsê de ev kelîme wisa hatiye nivîsin: zîn.

- (7)Di eslê nivîsê de ev kelîme wisa hatiye nivîsîn: zaneye.
- (8)Di eslê nivîsê de -di vê sitranê de- çend car bi şaşî "ye" hatibû nivîsîn, lê min wek "e" nivîsandin. Wek nimûne, di ciyê "Rebia qiza şêxê şêbiyan ye" de min wisa nivîsand: "Rebîa qîza şêxê Şêbiyan e."
- (9)Di eslê nivîsê de ev kelîme wisa hatiye nivîsîn: derkyan.
- (10)Di eslê nivîsê de ev kelîme wisa hatiye nivîsîn: çarçafa.
- (11)Di eslê nivîsê de ev kelîme wisa hatiye nivîsîn: çarşafa.
- (12)Li jorê, ev kelîme wisa hatibû nivîsîn: tiving.
- (13)Di eslê nivîsê de ev kelîme wisa hatiye nivîsîn: sawaran.
- (14)Li jorê, ev kelîme wisa hatibû nivîsîn: hevren.
- (15)Di eslê nivîsê de ev kelîme wisa hatiye nivîsîn: o.
- (16)Di eslê nivîsê de "wê çaxê dest danîn bi starnên" hatiye nivîsîn, lê şaş e. Bi qasî ku tê fêmkirin, nivîskar dixwaze bêje "wê çaxê dest bi stranan kirin".
- (17)Di eslê nivîsê de ev kelîme wisa hatiye nivîsîn: sitirand.
- (18)Di eslê nivîsê de ev kelîme wisa hatiye nivîsîn: tivingan.
- (19)Di eslê nivîsê de ev kelîme wisa hatiye nivîsîn: sawar.
- (20)Di eslê nivîsê de ev kelîme wisa hatiye nivîsîn: sawarê.
- (21)Di eslê nivîsê de ev kelîme wisa hatiye nivîsîn: eyfa.
- (22)Êlas Axa, apê bavê Edîp Karahan e.

Kovareke nû ya bi Kirmanckî (Kirdkî/Dimilkî/Zazakî)

VATE

Sala pêş me 100 saliya rojnameya Kurdistanê ye ku di 1898'an de li Qahîreyê derket. Ji wê rojê heta îro nêzî 1300 kovar û rojnameyên Kurdan derketine. Ji wan % 40'ê wan bi Kurdî ne.

Piraniya van kovar û rojnameyên Kurdî bi Soranî û Kurmancî derketine, di yên Kurmancî Kurdîstana Bakur de jî carna nîva-niv carna jî çend rûpel cih dane Kurdiya Dimilî (Kirdkî/Kirmanckî/Zazakî). Lê di tarîxa rojnameyên Kurdan de ev cara yekem e ku kovarek xwerû bi Kirdkî (Dimilî) derdikeve.

Ev demeke ku di warê lehçeya Kirdkî (Dimilî) de platformek hatiye avakirin ku ji gelek deverên cihê cihê yên Kurdistanê, dimilixêf beşdarî vê platformê dibin. Heta nuha li ser Kirdkî (Kirmanckî/Dimilî) sê civîn ji amade kirine û netîceyên her civînên xwe wek broşûrekê jî belav kirine. Di civîna xwe ya duwem de jî biryara derxistina kovareke xwerû bi Kirdkî (Dimilî) girtine. Û vê havînê bi navê VATE (*peyv, soz, gotin*) li Stokholmê hejmara pêşî ya vê kovare derxistin. Her çendî dereng jî mabin, lê dişa jî piroz be û hevîdar im her berdeyam be.

Li vir ji bo xwendevanan emê naveroka kovarê bi kurtî bidim naskirin. Nivîsên di nav parantêzê de (yên Kurmancî) me bi xwe lê zêde kirine.

Vate, Kovara Kulturî

Hûmar: 1 (*hejmar 1, 112 rûpel*), Hamnan, 1997 (*Havîn 1997*)

Serredaktor: Malmîsanij, Redaksiyon: Haydar Diljen, J. Îhsan Espar, Cemil Gundogan, Malmîsanij, Mehmet Uzun

Adres: Î. Espar, Odd Fellowvägen 29, S-12732 Skärholmen/
Sweden

Tede (*têde, naverok*)

Wendoxan rê (*Ji xwendevanan re*)

Roze ve Roze Pê Ma Xapit - Munzûr Çem (*Roj bi roj em xapiyan*)

Sêwrega 25-30 Serran ra ver û Tanî Vîrameyinî - Nihat Elî (*Sêwrega 25-30 sal berê û hin bîranîn*)

Dante û Tradîsyonî Îdealîstan - Memo Darrêz

Rojên bi Rûmet û Ziqnawitî - Çeko

Veng, Pyec û Zimmeyîş ra Nomê û Fîil - Harun Turgut (*Ji deng û pêjn û zimezimê nav û fîil*)

Game be Game - Kazim Temûrlenk (*Gav bi gav*)

Wexto ki Merdim Kitabê Dr. Şivanî Waneno - Osman Aytar (*Wexta ku meriv kitêba Dr. Şivan dixwîne*)

Çend Dêrî - Seyidxan Kurij (*Çend dûrik/stran*)

Şewe - Robîn Rewşen (*Şev*)

Çond Vate Derheq Kurdon Almonya di - Hûmanê Çiyan (*Çend gotin derheqê Kurdên Almanya de*)

Zeynebî, Gulnarî - Sven Delblanc (*wergera ji Swêdi: J. Îhsan Espar*)

Nuştox, Ziwan û Şexsiyeto Neteweyî - Haydar Diljen (*Nivîskar, ziman û şexsiyeta neteweyî*)
Tayê Problemê Standardîzekerdena Ziwanê Kurdî - Cemil Gundogan (*Hinek problemên standardîzekerina zimanê Kurdî*)


Yew Şiir û Yew Antolojî - Mehmet Uzun (*Şiirek û antolojîyek*)

Kirmanckî (Kirdkî) Di Suffiksî - Malmîsanij (*Di Kurmanckî/Dimilî de sîffiks*)

Derheqê Ferhengê Celadet Alî Bedirxanî di - Malmîsanij

Ferhenga Kurdî (Kurmancî)-Frensî - Celadet Alî Bedirxan


Kitabê Kirmanckî (Zazakî)



Mahmûd Lewendî

Ji Weşanxaneyê Apecê 3 kitêbên nû yê zarokan!

Astrid Lindgren
KEÇA ŞERRÛD LOTTA



Ji zarokên xwe re bi kurdî bixwînin û bidin xwandin!

Navnîşana xwestinê li Swêdê:
Apec-Tryck & Förlag
Box 3318
S-163 03 Spånga/Sweden
Tel: +46 8 761 81 18
Faks: +46 8 761 24 90

Li Almanyayê:
Dilan KITAP-MUZIK
Brigitten str. 3
20359 - Hamburg/Deutschland
Tel: +49 40 432 906 70
Faks: +49 40 432 906 71